

T.C.
ZANÎNGEHA WAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

TEZA LÎSANS A BILIND



**LI GORÎ AXEL OLRÎC, LORD RAGLAN Û STÎTH THOMPSON DESTANA
MEMÊ ALAN**

Kadir SÖNMEZ

ŞÊWIRMEND
Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

WAN-2019

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

YÜKSEK LİSANS TEZİ

**AXEL OLRİC, LORD RAGLAN VE STİTH THOMPSON'A GÖRE
MEMÊ ALAN DESTANI**

Kadir SÖNMEZ

DANIŞMAN

Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

VAN-2019



T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ danışmanlığında, Kadir SÖNMEZ tarafından hazırlanan “Li Goré Axel Olric Lord Raglan û Stith Thompson Destana Memê Alan” adlı bu çalışma, 10/06/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

İmza:

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ

İmza:

ÜYE : Dr. Öğr.Üyesi Mazhar TUNÇ

İmza:

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.

10/06/2019
Prof. Dr. Nispet DEMİREL
Enstitü Müdürü

KURTE

(Lêkolîn)

Kadir Sönmez

Mijara vê xebatê ya sereke Destana Memê Alan e. Destana Memê Alan dê li gorî îndexa Stith Thompson, tespîta qanûnên epîk li gorî qanûnên epîk yên Axel Olric, tespîta lehengên kevneşopî li gorî qalibên lehengên kevneşopî yên Lord Raglan bê lêkolîn.

Destana Memê Alan tevahiya erdnigariya Kurdan de tê zanîn û vegotin. Bi destê dengbêjan ve heta îro hatiye piştirin û parastin. Destana Memê Alan her çend di hin heremên Kurdan de rastî hîn guhertinan hatibe jî vegotina eslî hatiye parastin.

Destana Memê Alan di naw çanda Kurd de ji aliyê hêmanên folklorîk ve gelek dewlemend e û ji aliyê gel ve jî xwediye pejirandineke hevpar e. Lewma jî ev xebate li ser Destana Memê Alan e û pênc beşan hatiye avakirin. Beşa yekem de em ê ji bo ku têgeha destanê baş bê naskirin li ser teybetmandiyên destanan bisekinin. Beşa duyem jî ji bo ku Destana Memê Alan baş bê fêmkirin me qala destanên Kurdî yên din jî kir. Ji ber ku di destanên neteweyan de gelek motîfên hevpar hene û ev motîfên hevpar di gelek destanan de xwe dide nîşan. Di beşa sêyem de em li ser tasnîfa û sinifandina motîfên Destana Memê Alan dê bi sekinin Di tasnîfkirina motîfan de îndexa Thompson “The Index of the Folk Literature” dê esas bê girtin. Di beşa çaremîn de destana Memê Alan wê li gor “Qanûnên Epîk” yên Axel Olricê Danmarkî dê were xwendin û qanûnên wî ew ê di destanê de were nîşandan. Di beşa pêncemîn de jî Destana Memê Alan, wê li gor “Qalibê Lehengê Kevneşopî” yên Lord Raglan dê were xwandin

Bêjeyên Sereke: Destan, Memê Alan, Stith Thompson, Motîf, Qanûnên Epîk, Axel Olric, Lehengên Kevneşopî, Lord Raglan,

ÖZET

(İnceleme)

Kadir Sönmez

Bu çalışmanın temel konusu Memê Alan Destanıdır. Bu yüzden bu çalışmamızın konusu Kürtler için önemli bir yeri olan Memê Alan Destanının Stith Thompson'un motif indexine göre tasnifi, Axel Olrik'in epik yasalarına ve Lord Raglan'ın kahraman kalıbı açısından incelenmesidir.

Memê Alan Destanı hemen hemen Kürtlerin yaşadığı bütün coğrafyalarda bilinen, söylene gelen bir destandır. Bu destan Kürt ozanlar tarafından günümüze kadar taşınmış ve korunmuştur. Destan her ne kadar bazı bölgelerde değişikliğe uğramış olsa da günümüze kadar birçok varyantını korumayı başarmıştır.

Memê Alan Destanının Kürt toplumunda önemli bir yeri vardır. Folklorik açıdanda zengin bir yere sahiptir ve toplum tarafında ortak bir kabullenişe mazhar olmuştur. Bu yüzden bu çalışmada Memê Alan Destanı üzerinde durulmuş ve destan beş bölümde incelenmiştir. Birinci bölümde destan kavramının iyi anlaşılması için destan türü hakkında kısa bir tanım yapılmış, ikinci bölümde Kürt destanları arasında ortak birçok motif ve tema olması açısından diğer Kürt destanları hakkında da bilgiler verilmiştir. Üçüncü bölümde Memê Alan destanı Stith Thompson'un "Halk Edebiyatının Motif İndeksi" ne göre destanda tespit edilen motiflerin tasnifi yapılmıştır. Dördüncü bölümde Memê Alan Destanı Axel Olric'in "Epik Yasaları" na göre değerlendirilmiş, beşinci ve son bölümde ise destan Lord Raglan'ın "Kahraman Kalıpları" açısından incelenmiştir.

Anahtar Kelimeler: Destan, Memê Alan, Stith Thompson, Motif, Epik Kanunlar, Axel Olric, Kahraman Kalıpları, Lord Ragla

ABSTRACT

(Analysing)

Kadir Sönmez

The main material of this study is the Memê Alan Epic. Therefore, the subject of this study, which has an important place for Kurds, is the classification of the epic according to the motif index of Stith Thompson, its examination according to Axel Olrik's epic laws and Lord Raglan's heroic pattern.

The Memê Alan Epic is a legend that is known in all geographies where the Kurds live. This epic has been preserved and conveyed till our days by the Kurdish bards. Despite the fact that the epic has been changed in some regions, it has managed to protect many of its variants until today. The Memê Alan Epic has an important place in the Kurdish society, has a rich place in terms of folklore, and has a common acceptance by the society. Therefore, in this study the Memê Alan epic is emphasized and studied in five chapters. In the first chapter: a brief description of the epic genre is given for a better understanding of the epic concept. In the second chapter: due to the fact that there are many common motifs and wholeness in Kurdish epics, the information about other epics is also given. In the third chapter the classification of motifs determined in the epic according to Stith Thompson's Motif Index of Folk Literature is done. In the fourth chapter: the evaluation of the epic according to Axel Olric's epic laws is made, in the fifth and last chapter the epic was examined in terms of the heroic patterns of Lord Raglan.

Key words: Epic, Memê Alan, Stith Thompson, Motif, Epic Laws, Axel Olric, Heroic Patterns, Lord Raglan.

NAVEROK

| | |
|--|------|
| KURTE | i |
| ÖZET | iii |
| ABSTRACT..... | iv |
| NAVEROK..... | v |
| KURTEBÊJE | x |
| PÊŞGOTIN | xi |
| RÊ Û RÊBAZ..... | xiii |
| 1.BEŞA YEKEM | 1 |
| PÊNASE Û NAVEROKA DESTANÊ..... | 1 |
| 1.1.Pênase û Naverok..... | 1 |
| 1.1.1. Wek Têgeh Destan | 1 |
| 1.1.2. Wek Têgehek Edebî, Destan | 2 |
| 1.1.3. Derketin û Belavbûna Destanan | 4 |
| 1.1.3.1. Derketina Destanê | 4 |
| 1.1.3.2. Belavbûna Destanê | 4 |
| 1.1.3.3. Nivîsandina Destanê | 5 |
| 1.2.Cureyên Destanê | 5 |
| 1.2.1.Destanên Xwezaî..... | 5 |
| 1.2.2.Destanên Çêkirî..... | 6 |
| 1.3.Destanên Cîhanê | 6 |
| 1.3.1.Destanên Yewnanî | 6 |
| 1.3.1.1.Îlyada:..... | 6 |
| 1.3.1.2.Odyssia | 6 |
| 1.3.2.Destanên Latînî | 6 |
| 1.3.2.1.Aenas..... | 6 |
| 1.3.3. Destanên Fransî | 6 |
| 1.3.3.1. Kilama Roland..... | 6 |
| 1.3.3.2. Aucassin û Nicolette | 7 |
| 1.3.4.Destanên Spanî | 7 |
| 1.3.4.1.El Cîd: | 7 |
| 1.3.5. Destanên Portekzî..... | 7 |

| | |
|--|----|
| 1.3.5.1.Os Lusidas..... | 7 |
| 1.3.6. Destanên Italianî | 7 |
| 1.3.6.1. Komediyaya Îlahî..... | 7 |
| 1.3.6.2. Orlandoyan | 7 |
| 1.3.6.3. Qudsa Xelasbûyî..... | 7 |
| 1.3.7.Destanên Giraven Brîtanî..... | 7 |
| 1.3.7.1.Beowulf..... | 7 |
| 1.3.7.2.Dîwana Arthur | 8 |
| 1.3.7.3.Robin Hood | 8 |
| 1.3.7.4.Kralîçeya Pîrelkan | 8 |
| 1.3.7.5.Bihişta Windabûyî..... | 8 |
| 1.3.8.Destanên Almanî..... | 8 |
| 1.3.8.1.Destana Nîbelungiyan | 8 |
| 1.3.8.2.Efsaneyaya Kaseya Pîroz..... | 8 |
| 1.3.9.Destanên Holandî..... | 8 |
| 1.3.9.1.Yehyaye Qasidê Tobeyê..... | 8 |
| 1.3.10.1. Kalevala (Diyarê Cengaweran) | 9 |
| 1.3.11.Destanên Rûsî | 9 |
| 1.3.12.Destanên Ereban | 9 |
| 1.3.13.Destanên Farisan | 9 |
| 1.3.13.1.Şahname an jî Destana Şahan | 9 |
| 1.3.14.Destanên Hîndî..... | 9 |
| 1.3.14.1.Ramayana | 9 |
| 1.3.14.2.Mahabharata | 10 |
| 1.3.15.Destanên Çîn û Japonî..... | 10 |
| 1.3.17.Destanên Sumerî..... | 11 |
| 1.3.17.1.Destana Gilgamiş | 11 |
| 1. BEŞA DUYEM..... | 12 |
| DESTANÊN KURDÎ..... | 12 |
| 2.1.Kurteya Çend Destanên Kurdî | 12 |
| 2.1.1. Destana Derwêşê Ewdî | 12 |
| 2.1.2.Destana Stî û Fexrî | 14 |
| 2.1.3. Destana Zembîlfiroş | 17 |

| | |
|---|----|
| 2.1.4. Destana Binefşa Narîn..... | 19 |
| 2.1.5. Destana Siyabend û Xecê | 21 |
| 2.1.6. Destana Kela Dimdimê..... | 25 |
| 2.1.7. Kurteya Destana Memê Alan | 26 |
| 2.2. Taybetmendiyên Destanên Kurdî..... | 36 |
| 2.3. Xebat û Çavkaniyên Li Ser Destana Memê Alan | 38 |
| 2.3. 1. Xebatên ku ji Aliyê Biyanîyan ve Hatine Kirin..... | 38 |
| 2.3. 2. Xebatên ku ji Aliyê Kurdan ve Hatine Kirin..... | 40 |
| 3. BEŞA SÊYEM | 43 |
| LI GORÎ ÎNDEKSA THOMPSON TASNÎFKIRINA MOTÎFÊN DI DESTANA MEMÊ ALAN DE | 43 |
| 3.1. Îndeksa Motîfên Edebiyata Gelêrî ya ku Stith Thompson | 43 |
| 3.2. Motîfên ku Destana Memê Alan de Derbaz Dibin..... | 44 |
| 3.2.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Kesayetên Derasayî | 44 |
| 3.2.2. Di Destana Memê Alan de Motîfa Ajalên Derasayî-Alîkar | 45 |
| 3.2.3. Di Destana Memê Alan de Motîfên Mîtolojîk | 47 |
| 3.2.4. Di Destana Memê Alan de Motîfofa Hevaltîyê û Xoce Xizir | 47 |
| 3.2.5. Di Destana Memê Alan de Motîfa Hileyê, Xapandinê | 48 |
| 3.2.6. Di Destana Memê Alan de Motîfa Jahrê | 49 |
| 3.2.7. Di Destana Memê Alan de Motîfa Gustîlkê..... | 49 |
| 3.2.8. Di Destana Memê Alan de Motîfa Dûndetîyê | 50 |
| 3.2.9. Di Destana Memê Alan de Motîfa Evînê | 50 |
| 3.2.10. Di Destana Memê Alan de Motîfa Qedexe û Ceza yê | 51 |
| 3.2.11. Di Destana Memê Alan de Motîfa Ezmûnê | 51 |
| 3.2.12. Di Destana Memê Alan de Motîfa Qasîdî / Peyamgûhezî..... | 52 |
| 3.2.13. Di Destana Memê Alan de Motîfa Astenger | 52 |
| 3.2.14. Di Destana Memê Alan de Motîfa Xewnê | 53 |
| 3.2.15. Di Destana Memê Alan de Motîfa Tayînkîrîna Dahatûyê | 53 |
| 3.2.16. Di Destana Memê Alan de Motîfa Civakê | 53 |
| 4. BEŞA ÇAREM..... | 55 |
| LI GORÎ QANÛNÊN EPÎK YÊN AXEL OLRÎC DESTANA MEMÊ ALAN | 55 |
| 4.1. Qanûnên Epîkî Yên Axel Olric | 55 |
| 4.2. Li Gorî Qanûna Epîkî Yên Axel Olric Destana Memê Alan | 56 |
| 4.2.1. Qanûna Destpekê û Dawîlêanînê..... | 56 |

| | |
|---|-----------|
| 4.2.1.1. Di Vegotinê de Beşên Sekan | 58 |
| 4.2.1.2. Di Vegotinê de Beşên Herikbar (Coşdar) | 61 |
| 4.2.2. Qanûna Dubarekirinê..... | 70 |
| 4.2.3. Qanûna Sisêyan | 72 |
| 4.2.4. Qanûna di Yek Sehneyê de Dido | 72 |
| 4.2.5. Qanûna Dijberiyê | 73 |
| 4.2.6. Qanûna Cêwiyên..... | 75 |
| 4.2.7. Qanûna Girîngiya Rewşa Pêşîn û Dawîn..... | 75 |
| 4.2.8. Qanûna di Vegotinê de Biyekxetîbûnê..... | 76 |
| 4.2.9. Qanûna Qalipgirtinê..... | 77 |
| 4.2.10. Qanûna Sehneyên Wêneya Mezin..... | 77 |
| 4.2.11. Qanûna Mantiqa Vegotinê | 78 |
| 4.2.12. Qanûna Yek Enrîqayê..... | 82 |
| 4.2.13. Rêzika Yekîtiya Epîkî..... | 82 |
| 4.2.14. Qanûna Yekîtiya Epîkî ya Îdeal..... | 83 |
| 4.2.15. Qanûna Civandina Balê li ser Lehengê Sereke | 84 |
| 5. BEŞA PÊNCHEM | 85 |
| LI GORÎ QNÛNÊN LORD RAGLAN DI DESTANA MEMÊ ALAN DE QALIBÊN | |
| LEHENGÊ KEVNEŞOPÎ..... | 85 |
| 5.1. Qanûnên Epîk yên Lord Raglan..... | 85 |
| 5.2. Di Destana Memê Alan de Qalibên Lehengê Kevneşopî..... | 87 |
| 5.2.1. Diya Wî Bakire ye, Yek ji Malbateke Başnîjad e | 87 |
| 5.2.2. Bavê Lehengî, Qral e | 87 |
| 5.2.3. Bi Piranî Bavê Leheng Xizmekî Nêzîk a Diya Wî ye | 87 |
| 5.2.4. Mercên ku Leheng Tê Dinyayê Derasayîne | 87 |
| 5.2.5. Leheng di Heman Demê de Lawê Xwedayekî Navdar Tê Pejirandin | 88 |
| 5.2.6. Bi Piranî ji Aliyê Bavê Wî ve Hewldana Kuştina Wî Tê Kirin | 88 |
| 5.2.7. Leheng Dişînin Cîheke Veşartî..... | 89 |
| 5.2.8. Li Welatekî Dûr ji Aliyê Malbateke Parêzger ve Tê Xwedîkirin | 89 |
| 5.2.9. Di Derheqê Zarokatiya Leheng de Tu Tişt Nayê Vegotin | 89 |
| 5.2.10. Leheng Xortaniya Xwe de Diçe Cihê Keyatiya Xwe ya Dahatûyê Dibe Qral..... | 90 |
| 5.2.11. Leheng Piştî ku di Şerê li Hemberê Qral, Hût, Ejderhayan jî Sewalekî Wehşi Serdikeve..... | 90 |

| | |
|--|-----|
| 5.2.12. Ew bi Şahbanoyekê re Dizewice, ku Piranî Prensese Keça Selefî (pêşewarê) Wî Ye | 90 |
| 5.2.13. Leheng Dibe Qral..... | 90 |
| 5.2.14. Ji Bo Demekê Ew Bê Pisgirêk Hukim Dike | 90 |
| 5.2.15. Zagonan Destnîşan Dike..... | 91 |
| 5.2.16. Leheng, Dilxweşiya Xwedeyan an jî ya Tebaya Xwe Wenda Dike | 91 |
| 5.2.17. Ji Text û Bajarê Xwe tê Dûrxistin..... | 91 |
| 5.2.18. Leheng Rastî Mirineke Derasayî Tê | 91 |
| 5.2.19. Bi Piranî li Ser Girekî Dimire | 91 |
| 5.2.20. Zarokên Wî -Ger Hebin- Naçin Cîhê Wî..... | 92 |
| 5.2.21. Bedena Wî Nayê Gor Kirin (Veşartin)..... | 92 |
| 5.2.22. Yêk yan jî Zêdetir Gorên Wî Hene..... | 92 |
| ENCAM..... | 93 |
| ÇAVKANÎ..... | 97 |
| FERHENGOK | 103 |

KURTEBÊJE

- ç.** : Çap
c. : Cild
h.b. : Heman berhem
h.w.d. : Her wekî din
j. : Jimare
r. : Rûpel
weş : Weşanxane
h.r. : Heman rûpel
bnr. : Binêrin
amd. : Amadekar

PÊŞGOTIN

Destan gencîneya dewlemendiya netewekêne ku ji hemû keleşor, kul, xem, şahî û coşî bi kurtasî ji hemû hêst û ramanên wî neteweyî pêk tên. Destan weke ûnsûreke folklorê di nava tevahiya cihanê de tê vegotin. Ew, şopên hewldana pêvajoya netewebûna neteweyekê di nava xwe de dihewînin û bi serboriyên van hewldanan navbera rabirdû û dahatûyê de zîndî û teze dihêlin. Hemû netew xwedî destanan in. Lewma dewlemendiya destanan dewlemendiya çanda netewê nîşan dide. Di destanan de mirov rastî hemû taybetmendiyên civakê tê. Destan, ew metn e ku nêrîna dinyayê ya neteweyan, şewaza wan a şîrovekirina bûyerên li gerdûnê, dîroka jiyana wan û bandora wan ya li ser bûyerên civakî, ji bo domandina heyîna xwe, tekoşîna wan ya li hundir û derve, çalakiyên der bareyê jiyana civakî, bi kurtasî hemû nirxên neteweyekê dike.

Di sedsala XIX. de gava ku di nav gelên Ewropî de neteweyî dest pê dikê, ew dest bi berhevkirina kerteseyên folklorê jî dikin. Rabirdûya wêjeya netewekê hemandemê de wek rabirdûya netewekê hatiye pejirandin. Xebatên li ser destanan jî di heman demê de di sed sala XIX. de ji aliyê Dr. Ellias Lönnrot bi berhevkirina destana “Kalavelayê” dest pê dike. Ev xebat ji bo gelên din dibe xaçerayek. Lewra neteweya Fîniyan bi saya wê destanê rabûye li ser xwe û ji nû ve hatiye cîhanê.

Xebat û lêkolînên akademik ên li ser destanên Kurdî bigelempêri destê biyaniyan ve bêtir li Sovyeta Berê, Almanya û Fransayê ji aliyên zanyarên biyanî ve hatine kirin. Oskar Mann, Hugo Makas, Prof. Albert Socin, Prof. Albert Von Le Coq, Roger Lescot hin ji van kesan in. Ji aliyên Kurdan ve jî, bigelempêrî li Rusyayê, xebatên hêja hatine kirin. Heciyê Cindî, Ordixan Celîl û Celîlê Celîl, Mele Mehmûdê Bazîdî, Emînê Evdal, hin ji van kesan in.

Çawa ku destan bi şeweyekî nû derket pêşiya civaka Kurd û xebatên derbarê destanên Kurd bi gelemperî bi destê biyaniyan hatiye kirin me jî xwast ku bi awayekî zanistî li ser dastanên Kurd bisekinin û bixebitin. Ji ber vê yekê jî ji nav ewqas destanên dewlemend de me ji xwe re destana herî qedim; Destana Memê Alan hîlbijart Destana Memê Alan di nav Kurdan de em dikarin bibêjin ku destana herî

navdar e. Dîsa em dikarin bibêjin ku destanên wek Sîyabend û Xecê, Binevş û Narîn û Zembîlfiroş, Ker û Qulîlk, Dimdim jî di nav gelê Kurd de cihekî girîng digire lê Destana Memê Alan li gorî van destanan zûtir derbasî nivîsê bûye. Sedema vê jî wek me li jor jî got destana herî navdar e û di nav gel de belav bûye. Heta niha xebata herî girîng a derbarê vê destanê lêkolînan, nivîskar û kurdologê navdar Roger Lescot amade kiriye. Piştî re jî lêkolînanên wek A. Sorîn (1890), A. Von Le Coq (1930), Oscar Mann(1906-1909) û Hugo Makas (1926) gelek gûhartoyên din ên Memê Alan derxistîne holê. (Lescot, 2010: 8).

Destana Memê Alan hemû taybetmendiyan destanên Kurdî û destanên cîhanê di nav xwe de dihevine lê mixabin derbarê vê destana qedîm de heta niha xebatek berfireh nehatiye kirin ji ber vê çendê me xwast ku em li ser vê destana gewre bisekinin û bixebitin. Xebata me ji pênc beşan pêk tê. Di beşa yekemîn de têgeha destanê wekî têgeheke ferhengî û edebî hat ravekirin. Beşa duyem jî ji bo ku Destana Memê Alan baş bê fêhm kirin me qala destanên Kurdî yên din jî kir. Ji ber ku di destanên neteweyan de gelek motîfên hevpar hene û ev motîfên hevpar di gelek destanan de xwe dide nîşan. Di beşa sêyem de em li ser tasnîfa û sinifandina motîfên Destana Memê Alan sekinîn. Di tasnîfkirina motîfan de îndexa Thompson “The Index of the Folk Literature” me esas girt. Di beşa çaremîn de Destana Memê Alan me li gor qanûnên epîk yên Axel Olrîcê Danmarkî xwend û qanûnên wî di destanê de nîşanda. Di beşa pêncemîn de jî Destana Memê Alan, me li gor qalibê lehengê kevneşopî yên Lord Raglan xwand.

Piştî van gotinan ez dixwazim ku ji bo sebr, sebat û eleqeya wî sipasiyên xwe pêşkeşî mamosteyê hêja û bi qedr û qiymet Birêz Doç. Dr. Ömer Çiftçi re pêşkêş bikim.

RE Û RÊBAZ

Di amadekariya ve tezê de ji bo ku em têgeha destanê baş serwext bibin di destpêkê de me behsa têgeha destanê, cureyên destanê kir. Di vê beşê de me bi tezên li ser wan mijarane hatine nivîsandin sûd wergirt û me wek têgeh pênaseya destanê kir.

Di beşa duyem de ji bo ku Destana Memê Alan baş bê fêm kirin me qala destanên Kurdî yên din jî kir. Ji ber ku di destanên neteweyan de gelek motîfên hevpar hene û ev motîfên hevpar di gelek destanan de xwe dide nîşan. Dîsa di vê beşê de em li ser taybetmendiyên destana Memê Alan, xebat û çavkaniyên li ser destana Memê Alan, li gor çerçoveya zanistên folklorîk sekinîn.

Di beşa sêyem de em li ser tasnîf û sinifandina motîfên Destana Memê Alan sekinîn. Me teoriya “Rêbaza Dîrokî û Erdnigariyê ya Fînî” ji xwe re kir bingeh û rêbaza motîfan bikar anî. Di tasnîfkirina motîfan de îndexa Thompson “The Index of the Folk Literature” me esas girt. Li ser Destana Memê Alan bi qasî ku em dizanin xebateke rêk û pêk hêj nehatiye kirin lê Roger Lescot li ser Destana Memê Alan xebatek kiriye vê xebata xwe de Lescot gelek cihan li ser Destana Memê Alan lekolîn kiriye û gelek varyantên Destana Memê Alan berhevkirîne di vê beşê de me bi piranî berhevok û xebata Lescot ji xwe re kir bingeh.

Di beşa çaremîn de Destana Memê Alan me li gor qanûnên epîk yên Axel Olricê Danmark xwend û qanûnên wî me di destanê de nîşan da. Nivîsara bi navê “Qanûnên Epîk yên Vegotinên Gel” ya Olric cara pêşîn di sala 1909an de di kovara “Zeit Schrift fur Deutsches Altertum” de hatiye çapkirin. Olric gava behsa van qanûnan dike armanca wî ew e ku di vegotinên gel de hin qanûnên bingehîn derxîne holê û wan bide naskirin. Ew di vî varî de wiha dibêje: “Tiştê ji me re pêwîst e rêbazeke lêgerîna zanyarî û biyolojiya sageyê ye.” (Olric,1994).

Di beşa pêncemîn de Destana Memê Alan, me li gor qanûnên epîk yên Lord Raglan xwand û ew qanûnên di vê destanê de cih girtîne nîşanda. Nivîsara bi navê “Qalibê Lehengê Kevneşopî” ya Lord Raglan li gorî wergera Metîn Ekici (Ekici,1998) me tespît kirin. Lord Raglan qalibên xwe 22 xalan de kom kiriye. Raglan lehengê neteweya rojava û Anadola navîn de pûanên xwe li ser 22 xalan dide. Me jî di vê beşê de li gor van 22 xalan Destana Memê Alan nirxand.

Ev xebat bi giştî di çerçoveya çend xalan de analîzkirina Destana Memê Alan e. Em bi giştî li ser analîzkirina teksta Roger Lescot sekinîn. Ji ber ku berhevkirina varyantên destanê bi serê xwe xebatek divê. Beriya her tiştî divê bê gotin ku bi awayeke rêk û pêk berhevkariya varyantên Destana Memê Alan tinê bi destê Lescot ve hatiye kirin lewma li vir piranî em ê xebata Roger Lescot ji xwe re referans bigirin.



1.BEŞA YEKEM

PÊNASE Û NAVEROKA DESTANÊ

1.1.Pênase û Naverok

Di vê beşê de bi çarçoveyeke zanistî wekî têgehekê em ê li ser pênase, naverok û taybetmendiyên destanan agahiyan bidin.

1.1.1. Wek Têgeh, Destan

Ji ber ku mijar were zelalkirin hewceye ku em li ser pênase û naveroka destanan bisekinin. Ji ber vê yekê jî em ê derbarê destanan de çend agahiyan bidin.

Destan cureyekî bingeşî yê edebiyata gelêrî ye. Destan vegotinên anonim ên herî kevn in ku têde hêmanên wekî mîtolojî, efsane folklor û dîrokê hene mijarên destanan bi piranî li ser qehremanî, evînî, şer, pevçûn, serboriyên nêçîrvaniyê, jiyana eşîrî û hwd. nin. Kiryarên awarte yê lehengan bicoş şeweke dêlindêz tînin ziman û bi piranî ji gelek beşan pêk tên. Di zimanên Ewropî de jibo destan bi piranî peyva “epos” te bikaranîn.

Têgeha destanê li gel epos, epic, poem, epope ê tê bikaranîn. Li ser destanê heta niha gelek pênase hatine kirin. Destan tê wateya: efsane, hîkayet, wekî serencamên kevin û derasayî yê xwedawend, û lehengan; bûyerên di demên kevin de qewimîne yê ku di hişê civakê de cih girtine wekî erdhej, xelahi, şer, koç, êriş, lehî û hwd. ji xwe re dike bingeş û mijar. Epos wek peyv ji zimanê Yewnanî hatiye. Di zimanên Îranî de bi gelemperî peyva “Dastan” tê bikaranîn. Di Kurdî de ev têgeh wekî “Destan, Destane” tê bikaranîn.

Ferhengê Wêşanên Enstîtuya Kurdî têgeha destanê wiha pênase dike: “Destan an dasîtan ji bo helbestên ku bûyerên di der bareyê xwedawend û gernasana beriya dîrokê ji xwe re kiriye mijar û babetê gotin. Helbesta dirêj a qehremaniyê ye ku pîvana wê 11 kite ye û ji aliyê teşê û naverokê ve ji destana gerdîşî cuda ye.” (Zana Farqînî, 2006: 135).

Li gor Baba (2007: 38), destan bêjeyeke Farisî ye û tê wateya serpêhatiyên derasayî . Em dikarin bibêjin destan ev behrem in ku bûyerên wek xelahlî, şewat, şer, erdhej ku di hişên civakê de cihekî mezin digrin. Binhişê civakê de bandoreke mezin çêdikin ji ber ku ev bûyereke dikarin ku civakekê bi guherin, dahatûyê de xwe wek destanekê nîşandiden û dibin berhemeke gelêrî. Ev berhem bûyer, cih û mirovan pêk tên. Cîh, mirov û demên van berheman de bi tevahî ne ras in û li gor cih û demên ku hatine nivîsandin hin guhertin li nav van berheman çêbûne. Lewma destanek xwediyê gelek varyantane. Qasî ku me berhev kiriye em rastî 13 varyantên Dastana Memê Alan hatin. Em dikarin bi bêjin ku gelek varyantên vê destanê hene ku hêj ne hatine peydakirin.

Özkul Çobanoğlu pirtûka xwe ya bi “Halk Edebiyatına Giriş” de dibêje ku: “Destan buyerekî dîrokî li gor serdema ku hatiye jiyîn û ji gelek aliyan ve digre dest. Ev bûyerên dîrokî li gor hişmendiya gel bi awayekî estetîkî tên hûnandin. Di destanan de şerên li hemberê dujminan û qehremaniyên ku di van şeran de hatine nîşandan, pîrsgirêkên civakî, pîrsgirêkên navxweyî û hwd. tê vegotin. Lê belê ev nayê wê wateyê ku destan nivîsandina dîrokê ye. Lewra çanda vegotina destanê sedî sed bi dîrokê ve girêdayî nîne. Bi kurtasî destan qala ruhê serdemekê dike.” (Çobanoğlu, 2009:142).

1.1.2. Wek Têgehek Edebî, Destan

Destan, berhemên edebî ne ku li ser vegotîneke kehremanî, lehengî yan jî evîni hatine afirandin. Di destanan de sê hêmanên sereke hene evene jiyana, dîrok û leheng in û hevdu temam dikin. Bi van sê hêmanên serekeve têgeha destanê di nav cureya edebiyata gelêrî de wek cureyê sereke tê pejirandin. Di destanan de bûyerên bi kelepura neteweyî ve têkildar, li dora jiyana lehengekî û ligel wî/wê bi motîfên xwedî hêzên mistîk ve hatine nexşandin û pêşve ketine. Destan ev berhem in ku di demên borî yê neteweyekî de bûyerên di civakê de şopên kûr hiştine yê mîna: koç, xelahlî, lehî, şewat û erdhej bi şeweya menzûm vedibêje.

Ev berhem li ser hêmanên mîna bûyer, cih, dem û kesan ava bûne. Bûyer û kesên di destanan de, xwedî wesfên derasayî ne. Cih û demên destanan bi awayekî

teqez ne diyar in, li gor cih û dema hatine nivîsandin, dikarin bên guhertin. Ew xwedî rêbazeke diyar in. “Karbendiyên (fonksiyonên) destanan ên civakî jî hene. Karbendiyên destanan gelek in: pîrozkirina serfiraziyekê, perwerdekirina civanan, xurtkirina hesta yekîtiya civakê an jî agahîdan û parastina derbareyê temamê dîrok, jiyannasî, civaknasî, ajalnasî, zanyariyên derbarê nêçîr... em dikarin hejmêrin.” (Ong, 2012: 189).

Pertev (2015) di Notên Dersa Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de ji bo destanan wiha dibêje: “Destan cureyekî bingehî ya edebiyata gelêrî ye. Destan, vegotinên anonîm ên herî kevn in ku tê de hêmanên wekî mîtoloji, efsane, folklor û dîrokê hene. Mijarên destanan bi piranî li ser qehremanî, evînî, şer, pevçûn, serboriyên nêçîrvaniyê, jiyana eşîrî û hwd. nin. Kiryarên awarte yên lehengan bi coş, şeweyeke dêlindêz tînin ziman û bi piranî ji gelek beşan pêk tên.”

Şükrü Elçin di derbareyê destanan de wiha dibêje: “Destan (epos) di jiyana netewe, qewm an qebîleyekê de piştî efsaneyan yek ji berên edebiyata gelêrî ya herî kevin e ku bi awayê menzûm derketiye holê. Ev berên gelêrî yên bi kevneşopa devkî girêdayiyê berhemên dirêj û dîdaktîk in ku di nava dem û cih de li dora jiyana menqîbevî û rastîn ya kesayeta mîna komelê di destê xwe de digire saz dibe.” (Elçin, 1978: 74).

Destan cureyeke edebî ye ku bûyerên lehengî û civakî yên derasayî û mezin bi awayekî menzûm û dirêj vedibêje. Destan menzûmeyên dirêj in ku lehengekî yan bûyerên lehengî an jî bûyereke dîrokî ya girîng dipesînê û berz dike. Di nav de rast û nerastî, efsane û dîrok têkilî hev bûne.

“Destan, mîna dendikekê ye; ew jî şax û daxa, kulîlk û pela vedide û xwedî imkanên tezekirina berê xwe ye. Di destanan de jî wekî taybetmendiya dendikê herhebûn û halê bûyîna kaniya enerjîyê heye. Ji ber vê destan berhemên sereke ne ku mebestên raboriya neteweyan yên zindî bi dahatûyêve girêdide .” (Sepetçioğlu, 1995: 49).

1.1.3. Derketin û Belavbûna Destanan

“Destan, mijarên olî, efsaneyî û dijminatiyê ne ku bi awayekî devkî di nav gel de, di nav nifşan de belav dibin û wekî berhemên wêjeya devkî di nava gelan de dijîn. Di nava hinek gelan de wekî mînak Yewnanên berê, Îranî, Hîndî û Fîniyan de hinek bûyer qewimîne ku kirinên lehngên wan bûyeran, di nava gel de bi zimanê xeyalî hatine vegotin û wekî destan belav bûne” (Mengî, 2009: 16).

Mirov dikare bibêje ku di nava gelan de di encama hinek bûyerên ecêb û nedîtî de bi zimanê gelî ku hinek tiştan ji xweberî zêde dikin û bi awayekî mubalaxeyî vedibêjin, ew bûyer bi vegotinên mirovan di nava civatê de belav dibin û piştî demên dirêj êdî wekî hikayeyên destanî di wêjeya devki ya wî gelî de rûdinin. Destan derketin, belavbûn û nivîsandina xwe ve li ser sê qonaxan re derbas dibe.

1.1.3.1. Derketina Destanê

“Di vê qonaxê de bûyereke dîrokî û civakî di qewime, li ser jiyana gel de bandoreke mezin çê dibe. Bi xeyalên nifşên nû ve jî ev bûyere geş dibe, mezin dibe lehngên efsaneyî derdikevin holê” (Örskaya, 2006: 9).

Em dikarin bibêjin ku ji bo derketina destanê tiştan ku herî girîng bûyereke mezin e ango lazime bûyereke qewime û ev bûyere bandoreke mezin li ser wê netewê, ciwakê çêke. Kaniya, dindika destanê bûyereke pir bi tesîre.

1.1.3.2. Belavbûna Destanê

Di vê qonaxê de bûyera ku di qewime û lehngên bûyerê, bi rêya kevnaşopiya devkî belav dibin. Bi vî awayî jî herêmeke ber bi herêmekê ve, ji nifşekê ber bi nifşeke din ve diçin û belev dibin. Ger bûyer mezin be ango tesîra wê mezin be ev bûyere salan tê vegotin. Devan derbazî devan dibe, nifşan derbazî nifşan dibe. Her derbazbûn guhertinekê jî li gel xwe tine. Mubalaxa zêde dibe, leheg formeke

efsaneyî hildigirin li ser xwe ango derbazbûna gotinên bûyerê formên pêşîya xwe diguhere. Ev belavbûne foklora Kurdan de bi destê dengbêjan ve tê kirin. Dengbêj bajar bajar, gund gund digerin, destanên Kurdan belav dikin û diparêzin

1.1.3.3. Nivîsandina Destanê

“Di vê qonaxê de bûyer û lehengên, ji aliyê helbestvanek bi hêz ve awayekî tamam û helbestkî derbasî nivîsê dibe. Gelek caran nayê zanîn ku ji aliyê kê ve hatine nivîsandin.” (Örskaya, 2006: 11).

Ji hevokên li jor jî xuyaye ku serencama destanê berê her tiştî bi bûyerek siruştî dest pê dibe piştî ku bûyer rû dide ji nêz ber bi dûrî ve di nava gel de tê vegotin. Bi van gotinan di nav destanê de mubalaxe zêde dibe û vegotin forma destanê digire.

Her wiha lehengên û bûyerên destanê jî namdar dibin û nayên jibîrkin. Piştî ku di nava nifşan de belevbû û li hemî welat hate zanîn, îcar bi destê hin nivîskaran û helbestvanên diyar an jî nediyar destan, derbasî nivîsê dibe.

1.2.Cureyên Destanê

1.2.1.Destanên Xwezî

Destanên xwezayî destanên anonîm in. Destanên xwezayî bi awayekî xwezayî di nav gel de bi devkî belav dibin. Paşê bi destê dengbêj û hozanan ve tên berhev kirin. Wek mînak: Gilgameş (Sumerî), Kalavela (Fînî), Şinto (Japonî), İgor (Rusî), Mahabarata (Hindî) û hwd. Destanên Kurdî exlebe destanên xwezayî ne. Wek mînak: Memê Alan, Dewreşê Evdî, Sîyabend û Xecê, Kela Dimdim û hwd.

1.2.2. Destanên Çêkirî

Destanên çêkirî de nivîskarê destanê dîyar e û destan di demek nêz de hatiye nivîsandin. Nivîskarê destanê mijara xwe bi bûyereke nû hildigire lê cardîn jî mijar mijareke balkêş e. Wek mînak: Destana Kuva-i Milliye Nazım Hikmet (Tirk), Destana Komedyaya Îlahî ya Dante (Îtalyan), û hwd.

1.3. Destanên Cîhanê

1.3.1. Destanên Yewnanî

1.3.1.1. Îlyada:

Destana Îlyadayê, ji aliyê Homeros ve hatiye nivîsîn û ji bîst û çar beşan pêk tê. Mijara Destana Îlyadayê, Şerê Troyayê ye; her çend şer deh sal berdewam kiribe jî, destan bi tenê li ser 50 rojên şer disekine.

1.3.1.2. Odyssea

Ev destan jî dewama Îlyadayê ye. Li ser serpêhatiyên cengawer Odysseus disekine. Destan, piştî girtina Troyayê, vegera Odysseus a ber bi warê wî ve û bûyerên ku tîrî serê wî vedibêje.

1.3.2. Destanên Latînî

1.3.2.1. Aenas

Ev destan binyada xwe ji edebiyata Yewnanî digire. Ji aliyê Vergîlîs ve hatiye nivîsîn. Heft sal piştî şewata Troyayê, bûyerên ku li qeraxên Efrîqayê tîrî serê keştiyên Aeneas vedibêje.

1.3.3. Destanên Fransî

1.3.3.1. Kilama Roland

Destana herî kevin û mezin a Fransî, “Kilama Roland” e. Di sedsala XII de hatiye nivîsîn. Nivîskarê wê Tuoldus e. Kehremanê Fransîyan Roland bi şûrê Hektor ve hemberê leşkerên Ereban şer dike.

1.3.3.2. Aucassin û Nicolette

Ji serdema navîn maye. Bûyera şerê di navbera Konte Valence û Konte Biaucaire de tê vegotin.

1.3.4. Destanên Spanî

1.3.4.1. El Cîd:

Der bareyê cengawerê mezin e Spanî Rodrigo Diaz de ye. Rodrigo di salên 1030-1040an de hatiye dinyayê û bi cengaweriya xwe, rojavayiyên ku Spenyayê dagir kirine, ji welatê xwe qewirandine.

1.3.5. Destanên Portekzî

1.3.5.1. Os Lusidas

Destana neteweyî ya Portugaliyan e. Ji aliyê Luis de Camoens ve hatiye nivîsîn.

1.3.6. Destanên Italyanî

1.3.6.1. Komedyaya Îlahî

Ev destan di sala 1300an de ji aliyê Dante (1265-1321) ve hatiye nivîsîn. Berhem ji çîrokên curbicur ku li navenda Îtalyayê hatine berhevkirin pêk tê.

1.3.6.2. Orlandoyan

Di sedsala XV. de, bi îcada çapxaneyê û bi Ronasansê re Orlando pêşengiya helbesta nû dike. Nivîskarên ji nişîşa wî behsa serpehatiyên evîna wî kirine û nivîsandine.

1.3.6.3. Qudsa Xelashûyî

Ev destan ji aliyê Torquato Tasso ve di sedsala XVI. de hatiye nivîsîn.

1.3.7. Destanên Giraven Brîtanî

1.3.7.1. Beowulf

Di sedsala VIII. de li Swêdê hatiye nivîsîn û ji wir derbasî Engilîstanê bûye. Nivîskar ne diyar e. Destxeta herî kevin ku li Brîtîsh Mûseûmê ye, di sedsala X'an de hatiye nivîsîn. Der bareyê jiyana Saksonan de agahiyên giranbiha dide.

1.3.7.2.Dîwana Arthur

Ji aliyê hozanên Anglo-Norman ve hatiye nivîsîn. Ji hevdeh destanan pêk tê. Ji van ên girîng: “Kaseya Pîroz, Kral Arthur û Maseya Gilover” in

1.3.7.3.Robin Hood

Di salên 1400an de ji aliyê Howard Pyle ve hatiye nivîsîn. Di nav destanên pexşanî de ya ku herî zêde tê hezkirin, çîroka Robîn Hood e.

1.3.7.4.Kralîçeya Pîrelkan

Di 1589an de ji aliyê Spenser ve hatiye nivîsîn. Berhem bi armanca dozdeh pirtûkan hatiye nivîsîn. Nivîskar xwestiye ku li ser dozdeh dilpakiyên exlaqî raweste; lê belê bi tenê şeş jê xelas bûne.

1.3.7.5.Bihiştê Windabûyî

Ji aliyê Milton (1608-1674) ve di sala 1661an de hatiye nivîsîn. Berhema wî ji dozdeh beşan pêk tê. Mijara destanê, qewirandina şeytan ji bihiştê û avabûna dinyayê ye.

1.3.8.Destanên Almanî

1.3.8.1.Destana Nîbelungiyan

Her çî qas di sedsala XIII. de hatibe nivîsîn jî, li ser bûyerên sedsala VI û VII. radiweste. Nivîskarê pêşî yê destanê nayê zanîn.

1.3.8.2.Efsaneya Kaseya Pîroz

Di serdema navîn de hatiye nivîsîn. Pirtûka cengaweriyê ye û di sedsala XV. de ji aliyê Rhön ve hatiye nivîsîn.

1.3.9.Destanên Holandî

1.3.9.1.Yehyaye Qasidê Tobeyê

Yehyayê Qasidê Tobeyê, di edebiyata Holandî de epîka herî mezin e. Berhem ji şeş pirtûkan pêk tê û li ser jiyana Yehyayê Vaftîzker disekine. Destan ji aliyê Vondel ve di 1662yan de hatiye nivîsîn.

1.3.10. Destanên Fîn'an

1.3.10.1. Kalevala (Diyarê Cengaweran)

Ev destan ji aliyê Zacharias Topelius û Elias Lönnrot ve di 1822yan de hatiye berhevkirin û çapkirin. Wekî gelek destanan, çavkaniya wê mîtolojî û folklor e.

1.3.11. Destanên Rûsî

Her çend edebiyata Rûsî ji aliyê helbesta gelerî û kilamên epîk ve dewlemend be jî, ji bilî “Kilcima Bandoya Îgor” ku der dora sedsala XII. de ye, tu kilamên epîk heta demên dawî derbasî ser kaxizê nebûne. Ev destan li ser jiyana Prens Îgor e.

1.3.12. Destanên Ereban

Ji bilî “Rojên Erebcîn” ku şer û pevçûnên çolan vedibêjin, her wiha “Destana Anterê” jî ji aliyê El Asmaî (739-831) ve hatiye nivîsandin û li ser bûyerên beriya hatina Hz. Muhammed radiweste. Wekî Îlyadaya Ereban hatiye binavkirin.

1.3.13. Destanên Farisan

1.3.13.1. Şahname an jî Destana Şahan

Ev destan ji aliyê Ebû Qasim Mensûr ve hatiye nivîsîn ku bi navê Fîrdewsî te naskirin. Li ser daxwaza Şah Mehmûd, bûyernameyên welat ji aliyê Fîrdewsî ve hatine nivîsîn.

1.3.14. Destanên Hîndî

1.3.14.1. Ramayana

Ev destan, beriya zayînê di sedsala V. de bi Sanskrîtî hatiye nivîsîn. Piranî wekî “Odysseiaya” rojhilat tê binavkirin. Destan li ser bûyerên navbera sedsalên

2000 û 900e beriya zayînê disekine. Tê gotin ku ji aliyê keşîş Valmikî ve ku li kersaxa Ganjê jiyaye, hatiye nivîsandin.

1.3.14.2.Mahabharata

Hîndû vê berhemê wekî pirtûka xwe ya herî pîroz qebûl dikin. Li gorî baweriya wan ji aliyê Vyasa ve hatiye nivîsîn. Helbesta herî dirêj ev e û beriya “Ramoycînciye” dest pe kiriye, lê belê sed sal piştî wê xelas bûye. Bi sanskrîfî hatiye nivîsîn.

1.3.15.Destanên Çîn û Japonî

Her çend li Çîn û Japonyayê bi awayê Ewropayê destan tunebin jî rojhilatî, helbestên pastoral wekî epîk bi nav dikin. Li her du welatan jî çîrokeke romantîk e ku wekî epîk tê qebûl kirin, bi nezma Çînî, ji aliyê Profesor Inouye ve hatiye nivîsîn û ji aliyê Naobumi Ochiai ve wergera wê ya Japonî hatiye kirin. Navê berhemê: “Helbesta Keçika Oldar Shircikiku” ye.

1.3.16. Destanên Amerîkayî

Li Amerîkayê piştî sedsala XVII. helbesta epîk hatiye nivîsîn. Helbestavanê pêşî yê vê serdemê Anne Bradstreet e ku berhemên bi navê: “Stêrka Sibehê ya Helbesta Emerîkî û Sê Şahînsahiyên Pêşî” bi xwe nivîsandine. Ji aliye hin otorîteyan ve berhema wî ya “Sê Şahînsahiyên Pêşî” wekî epîka pêşî (1650) ya Amerîkayê hatiye qebûl kirin

1.3.17.Destanên Sumerî

1.3.17.1.Destana Gilgamiş

Piraniyên metnên vê destanê di salên du hezarî yên beriya zayîne de hatine nivîsîn. Ev destan ji 12 kevalan pêk tê. Li gorî zanyar û lekolînerên Babîla Antîk, destan ji aliyê Sîn Leqe Uninni ve hatiye nivîsîn.

Lehengê destanê Gilgamiş e û li başûre Mezopotamyayê li bajarê Êrûkê hikumdar bûye. Li gorî rêza qralên Sumerî, di Xanedaniya pêşî ya Êrûkê de 126 sal hikumraniya wî tê dîtin. Mirina mirov û haydariya ji vê yekê; şert û mercên gerdûnî yên din ku ji mirovbûnê tînin, di Destana Gilgamiş de bi awayekî hostayî hatiye hûnandin.

1. BEŞA DUYEM

DESTANÊN KURDÎ

2.1. Kurteya Çend Destanên Kurdî

2.1.1. Destana Derwêşê Ewdî

Paşayê Milan hewl dide ku di herêmê de yekîtiyekê saz bike. Lewma jî dixwast ku eşîrên herêmê bixe bin desthilatdariya xwe. Di dema Zor Temir Paşa de gelek eşîrên herêmê dikevin nav konfederasyona Milan. Ji van eşîran yek jî eşîra Şerqîyan e ku bavê Dewrêş Ewdî, Milhim jî serokê ve eşîrê ye.

Şerqî di herêmê de bi lehengîya xwe tên naskirin. Şerqî di roja cengê de karê şervaniye didin ser milên xwe û li hember eşîrên talanker şer dikin. Ewdî Milhim, gelek caran li bal paşayê Milan şer dike û xizmeteke mezin ji eşîra Milan re dike. Zor Temir Paşa jî dixwaze ku vî merxasê hêja, li bal xwe bihêle û pê re hevalbendiyê çêbike. Zor Temir Paşa û Ewdî Milhim bi salan li kêleka hevdu şer dikin û herêmê dixin bin desthilatdariya xwe. Ewdî Milhim rojekê xwîşka Zor Temir Paşa, Rahmê dibîne û dil berdide wê. Ewdî Milhim ji evîna Rahmê bêhiş dikeve lê mixabin Rahmê, xwîşka paşayê Milan e û Ewdî Milhim jî lawikekî Êzîdî ye. Lewma jî evîna Ewdî Milhim naçe serî. Paşayê Milan xwîşka xwe Rahmê dide kesekî din û bi vî awayî evîna Ewdî Milhim bi dawî dibe.

Sal û dem derbas dibin û dibuhurin, Ewdî Milhim bi keçeke Ezîdî ya bi navê Eyšê Welet re dizewice. Ji vê zewacê zarokên Ewdî Milhim yên bi navê Dewrêş û Sehdûn çêdibin. Dewrêş jî mînanî bavê xwe dibe lehengê eşîra xwe. Siwarê Hedbanê û evîndarê Edûlê ye. Dewrêş wekî bavê xwe bi mîrxasî mezin dibe û talanên eşîra Şemiran dide sekinandin û di nav eşîra Milan de dibe xwedî roleke mezin. Her diçe nav û dengê Dewrêş di nava eşîrên herêmê de belav dibe. Eşîrên herêmê her roj qala mîr û mîrxasiya Dewrêş dikin. Li vê herêmê kes tune ye ku navê Dewrêşê Ewdî bi şervanî nebihîstibe. Dewrêş, lawikekî qeşeng e. Lewma jî zewicandina bi Dewrêş re xewn û xeyala her keçekê ye. Lê belê dilê Dewrêş ketiye keçiye wusa ku tu rê ji ve evîne re tune ye. Dilê Dewrêş ketiye keça paşayê Milan, Edûla bedew.

Edûle, keça paşayê Milan e. Bedewiya wê di nav eşîrên Milan de belav bûye. Her çiqas Dewrêş jî lawikekî bedew û mêrxas be jî bi eslê xwe lawikekî Êzîdî ye. Ji ber vê jî tu rê nîn e ji ve zewacê re. Paşayê Milan gelek ji Dewrêş hez dike û dixwaze Dewrêş bibe zavayê wî. Lê Dewrêş lawikekî Êzîdî ye, ew bêje erê jî, wê eşîr ji vê zewacê re bibêje çi? Ew ê çawa li ber eşîra Milan serê xwe rake û bêje zavayê min yekî Êzîdî ye.

Paşayê Milan keça xwe Edûlê nade Dewrêş. Paşe tevdîrekî digêrine ku ji bo Şerqiyên bikuje lê Çiloyê Izolî haya wan pêdixîne û Şerqî koç dikin, ji kuştinê xilas dibin. Piştî ku eşîra Dewrêş ji bal paşayê Milan koç dike, paşayê Milan bêhêz û qewet dimîne. Lewma jî eşîrên dijminên Milan çavsorî li wan dikirin. Eşîra Şemir, Tirkan û Gesan hêza xwe kiribûn û amadekariya şer dikirin. Ev tifaqa şer ewqasî xurt bû ku tîrsa wan ketibû nava dilê eşîra Milan, çongên mêrê eşîra Milan ji tîrsa şikandibûn. Yekî merxas tunebû ku serî li ber vê tifaqê rake û bibe serdarê vî şerî.

Paşayê Milan neçar mabû. Hemû dijminên wî li hemberî wî, tifaqa xwe xurt kiribûn û tu kesekî ku dest bide wî jî tunebû. Di vê hengamê de Dewrêşê Evdî tê bîra paşayê Milan. Gelo ji Dewrêş mêrxastir kesekî din hebû ku bikaribe ji bin barê ve roja giran derkeve? Tenê Dewrêş dikaribû serdariya vî şerî bike. Lê wê Zor Temir Paşa bi kîjan rû û rengî Dewrêş û eşîra Şerqiyên bikiribana perçeyekî vî şerî. Ji ber ku paşa demek nêz de Dewrêş û eşîra wî ji ebira Milan qewitandibû, dê çawa alikariya wan bixwestiba. Ji nişka ve hîlebazî û dolabek tê bîra paşayê Milan û dibêje ya baş ew e ku ez keça xwe Edûlê bavêjim mazatê da ku ez alikariya Dewrêş û egîdên Şerqiyên bigrim. Paşayê Milan bang li tevahiya eşîra Milan dike û dibêje ku li hember tifaqa neyaran kî di şer de serdariya me bike ez ê keça xwe ya bedew Edûla delal, bidim wî. Piştî van gotinên paşayê Milan xeber digihîje Dewrêş, kelacanek dikeve nava dilê wî. Dewrêş, êdî nikare di cihê xwe de bitebite Bi agirê evîna Edûlê dişewite. Pewîst e xwe bigihîne Edûlê. Her çiqas bavê Dewrêş, Evdî Milhim naxwaze kurê wî biçe û xwe di ber paşayê Milan de bide kuştin. Ji ber ku Evdî Milhim jî berê evîndarê xwişka paşayê Milan bûbû û ew jî evîndarekî dilbirîn bû, lê dîsa jî nikare pêşiyê kurê xwe bigre.

Dewrêş berê xwe dide ebira Milan û diçe diwanxaneyê paşayê Milan dibîne ku qehwe li ser sîniyê ye diçe û tê. Kî fincana qehwê rake wê bibe destgirtiyê Edûlê

û serdarê arteşa Milan. Edûle naxwaze Dewrêş fincana qehwê hilde û biçe şer. Ji ber ku ev şer şerê man û nemanê ye. Kî fincana qehwê rake dê heman demê de fermana mirina xwe jî rake. Lê Dewrêş evîndareke zor e. Mirina wî ya di ber evîndariya Edûlê ji bo wî mirinek birûmet e. Dewrêş fincana qehwê hildide, bi ser xwe da dike û bi serdariya arteşa Milan qebûl dike, bi evîndarî û evînkujîya Edûl a xwe qebûl dibe.

Ji bo şer duwazdeh mêrxasan hildibijêre ku her yek ji mêrxasekî bêhempa ye. Dewrêş û hevalên wî ji bo ku hêzên dujmin bişkînin, diçin peşîya hêzên dujmin. Li qerexa girê Etşanê şerekî dijwar di navbera hêzên dujmin û Dewrêş û hevalên xwe de diqewime. Hemû hevalên Dewrêş di vî şerî de bi mêrxasî şer dikin û yek bi yek tîn kuştin. Dewrêş di qada şer de bi tena serê xwe dimîne, lê tu kes nikare Dewrêş zêft bike. Dewrêş bi siwarê Hedban wek teyrekî baz dikeve nav hêzên dujmin wana bela wela dike. Hêzên dujmin fêm dikin ku nikarin bi mêranî Dewrêş zêft bikin. Kose Weys radibe û dibêje: “Em bi mêrxasi nikarin, Dewrêş em serî li hîleyekî bidin.” û bi berdewamî wiha dibêje: “Heke em Dewrêş bikşînin bajarê mişkan wê nigê hespê Dewrêş di bajarê mişkan de bişkê em ê jî bi hêsanî wî bikujin.” Hêzên koalîsyonê vê hîleyê dicibînin û her wiha Dewrêş dikşînin bajarê mişkan nigê hespê Dewrêş Hedban di bajarê mişkan de dişke û Dewrêş tê kuştin. Lê her çiqas Dewrêş hatibe kuştin jî hêza arteşa dujmin jî bi xwe dişkîne. Ev werekî û dileriya Dewrêş, bandoreke mezin li ser eşîra Milan dike. Milan, hêza xwe berhev didin û erîşan davêjin ser hêzên dujmin. Hêzên dujminî belav dikin û erdê Milan azad dikin. (Filiz, Mehmet Şirin,2013).

2.1.2.Destana Stî û Fexrî

Sileman Beg û Mistefa Beg birayê hevdu ne, herdu jî dewlemend in. Rojekê biryar didin ku bi hevdu re biçin hecê. Amedekiriya xwe bi dawî tînin, kincên hecîtiye li xwe dikin, diçin heca xwe temem dikin û vedigerin malê. Birayê mezin Mistefa Beg ji birayê xwe re dibêje: “Birawo gava em gihiştine malê, jinên me herduyan bi zarok bûn eger Xweda da yek qîz û yek kur em ê bihev din, pêgihurk bikin.” Bi vî awayî soz didin hev, lê li ser hatina wan mehek

bi ser nakeve Mistefa Beg dimire. Piştî mirina Mistefa Beg xwede qîzeke dide jina Sileman Beg û navê wê Stî datînin.

Meheke din jî dibuhure, jina Mistefa Beg jî dikeve nav êşa zayînê û pîrek lê dicivin. Xwedê kurekî dide jina Mistefa Beg lê ev kurik xwe bi xwe dest bi gotina kilaman dike û wiha distêre: “Ez aşiqê Stiya Silêman bû me.” Ew pîrekên ku lê civiyabûn ji hal û ehwalê vî kurikî ditirsin û kurik di cih de dihêlin û direvin. Ev bûyer di nava hemû gundiyan de belav dibe û gundî meraq dikin da ku vî lawikê ku distêre bibînin. Lê her kî diçe li ber serê lawik, lawik ji wan kilaman dibêje. Ew jî ji vî lawikê ku di şiba cinan de ye ditirsin. Di dawiyê de ji gundiyan keçîkek biryarê dide diçe ser vî lawikê feqîr, ku wî bipêçîne. Lawik dipêçîne û datîne ba diya wî.

Jina Sileman Beg ji vî lawikê ku bi şiba cina ye, ditirse û dibêje: “Ev lawikê sewî û bêxwedî nû ji dîya xwe bûye, kilaman davêje li ser keça min, eger ew sibe mezin bibe dê qîza min ji xwe re bibe. Bavê wî mir û ew maye sêwî ma ez ê çawa qîza xwe bidimê? Ku ez wî ji niha de winda bikim çêtir e bila mezin nebe.” Jina Sileman Beg bang qerwaşa xwe dike û dibêje: “Here wî lawikî bigre û têxe bin nigê hespî da ku hesp wî di nava nige xwe de biperçiqîne.” Lê dema qerwaşe wisa dike kurikê stranbêj dîsa xeber dide û hesp xwe ji ber dide alî, qerwaşe di dawiyê de vî lawikî davejê derveyî gund û xwe jê xilas dike.

Gavanek li derveyî gund rastî vî lawikê xweşik tê û wî dibe mala xwe ku lê binhere. Dema Sileman Beg vedigere gund dibihîse ku kurekî birayê wî çebûye xeberê dişîne jinbira xwe ku halê wan dipirse, lê mêze dike ku halê jinbira Sileman Beg ne tu hal e. Sileman Beg gazî hemû gundiyan dike û li kurikî dipirse lê haya gundiyan ji kurik tune ye. Gundî ji bo ku kurik bibînin ji Sileman Beg mihlet dixwazin, çend roj di navberê de derbas dibe, gundî kurikî li ba gavan dibînin û wî tînin. Sileman Beg navê vî kurikî datîne Ferxik.

Piştî sê salan diya Ferxik jî dimire. Ferxik edî li ba apê xwe dimîne, bi sê qîzên Sileman Beg re mezin dibe; yek Naz, yek Nazdar, yek jî Stî ye. Meh û sal derbas dibin, Ferxik û Stî mezin dibin êdî dema wan a zewacê hatiye. Hemû gundî dizanin ku Stî destgirtiya Ferxik e.

Du şivanên Sileman Beg hene yek Çîn e ye din jî Çîngan e. Rojekê mirovek diçe gund ji şivanan re dibêje: “Ev deh sal in hûn ji Sileman Beg re

dişuxilin, herin ba Sileman Beg bila Sileman Beg keça xwe bide we.” Li ser vê yekê Çîngan ji birayê xwe ye mezin Çîn re dibêje: “Here ji min re Stîyê bixwaze.” Her çiqas Çîn bêdil be jî diçe qîza beg dixwaze. Sileman Beg difikire ku ji keçên xwe yekê jî nede Çîngan wê Çîngan dest ji pez berde û here. Sileman Beg ji Çîn re dibêje: “Keça min Stî dergistiyê Ferxik e, lê Çîngan ji Naz û Nazdarê kîjan bixwaze ez ê bidim wî.” Çîn tê li ba birayê xwe û jê re gotina Sileman Beg dibêje lê Çîngan dibêje ez ji bilî Stîyê kesê din qebûl nakim. Li ser ve yekê Çîn dîsa diçe li ba Sileman Beg û gotina Çîngan ji Sileman Beg re dibêje. Sileman ve carê baş fêm dike ku bi rastî jî dê Çîngan dest ji pez berde û biçê û lîstokek tê bîra Sileman Beg. Sileman Beg ji Çîn re dibêje eger Çîngan kare xwe baş bike wê Stîyê bide Çîngan. Söze Sileman Beg ku daye Çîngan di nav gund de belav dibe heya digihije Ferxik jî.

Rojekê Ferxik û Stî ji bo bêriyê diçin ba pez lê dema Çîngan, Ferxik dibîne dîn û har dibe hevl dide ku Ferxik bikuje. Ferxik xortekî çardeh salî ye, ji bo ku xwe ji vî merê beraz xelas bike, ber bi gund ve direve û derdikeve ser merdîwanekê, Çîngan jî dilezîne ku derkeve ser pelikê, lê Çîngan ji pelikê dikeve û dimre. Ferxik nizane ku dê biçê ku. Piştî mirina şivan dê ji kê bigota çî, ji ber wê jî ji gund derdikeve û direve. Xalê Ferxik xelîfeyê Bexdayê ye. Ferxik dixwaze xwe bigihîne ba xalê xwe hal û ehewalê xwe ji xalê xwe re bibêje. Dema nêzî mala xalê xwe dibe, dibîne ku xalê wî di nava kemînekê de ye. Ferxik dîsa kilamekî distire ku xalê xwe hişyar bike. Xalê wî bi vî kilama Ferxik hişyar dibe û xwe ji kemîne xelas dike, bi destê Ferxik digre û tê malê. Lê halê Ferxik ne tu hal e, Ferxik her tim di xewn û xeyalên xwe de Stîyê dibîne, bê Stî jiyana ji Ferxik re heram e, Lê Ferxik derdê xwe ji tu kesan re nabêje. Rojekê pîrek tê li ba xalê Ferxik û jê re dibêje bila lawê te û Ferxik biçin nav bexçe, bila li wir her kes qala yara xwe bike, dê Ferxik jî qala yara xwe bike bi vî awayî hûnê fêm bikin ku yara Ferxik kê ye. Xalê Ferxik bi vî awayî fêm dike ku yara Ferxik Stî ye û êriş davêje li ser Sileman Beg û qîza wî Stî ji Ferxik re tîne.

Dema roj a zewacê tê Ferxik ji Stî re dipirse ku gelo Çîngan wê ramûsabu yan nê? Stî ji ve pirsê pir aciz dibe û xatir ji Ferxî dixwaze diçe. Ferxik dimîne bê Stî, sal û zeman derbas dibin. Ferxik li pey şopa Stî dikeve, lê tu çare nîn e, Ferxik Stî nabîne. Ferxik çolan dikeve, dibe kalekî bêmecal. Di dawiya jiyana xwe de tê gundê

Stîyê, ji Ferxik re dibêjin, Stî miriye. Ferxik xwe zu digihîne li ser gora Stî û bang li Stî dike. Stî ji gorê radibe herdu bi hev şa dibin û bi hev re dimrin. Gundî wan bi hevdu dixin nava gorê. (Filiz, Mehmet Şirin,2013).

2.1.3. Destana Zembîlfiroş

Zembîlfiroş lawikê Mîrane, xwedî koşk û dîwan e. Zembîlfiroş rojek ji rojên Xwedê xewnekê dibîne û bi tirsê Xwedê dikeve. Zembîlfiroş rojekê di geştê de mirovekî mirî dibîne û tirsê Xwedê dikeve dilê wî, dibe derwêşekî Xwedê. Êdî nikare di nav malê dinyayê de bijî, û piştî wê, biryar dide ku dest ji malê dinyayê berdide û dibe derwêşekî Xwedê. Zembîlfiroş edî bi firotina zembîlan debara xwe û zarokên xwe dike. Her roj kolan bi kolan digere û zembîlan difroşe. Zembîlfiroş xortekî bedew, mîna Yûsif Pexember e.

Zembîlfiroş bi tevî zarokên xwe digihije bajarê Ermanê û li kolanên Ermanê dest bi firotina zembîlan dike. Dema Zembîlfiroş zembîlan difroşe Gul Xatûn wî û bedewiya wî dibîne û dilê wê dikeve wî. Xatûn bi mebesta kirîna zembîlan bangî wî dike û dikşîne hundir da ku bi pê re kêf û şahiyê bike, lê belê Zembîlfiroş lawikekî tobedar e. Li hemberê vê xwesteka xatûnê xwe dide paş. Lê Zembîlfiroş dike û nake nikare xwe ji destê Xatûnê xelas bike, Lê tu niyeta Xatûnê jî nîn e ku dest ji Zembîlfiroş bedre. Xatûn xwe digihene mala Zembîlfiroş. Xanima wî qanî dike ku têkeve nav cîyê Zembîlfiroş. Wê şevê Xatûn cil û bergên xanima Zembîlfiroş yê şevê li xwe dike û dikeve nava nivînê Zembîlfiroş. Dema Zembîlfiroş dikeve nav nivînan mêze dike ku xilxal di lingên xanima nav nivînê de ne. Zembîlfiroş fêhm dike ku ev ne xanima wî ye û ji nişka ve ji nav nivînan radibe û direve. Xatûnê jî li pey Zembîlfiroş dide û digihîjin Kela Ermanê, dema Zembîlfiroş fêhm dike ku tu xelasî ji ber destê Xatûnê nîn e, xwe ji ser kelê berdide jêr û dawî li jiyana xwe tîne, xatûn jî xwe li pey Zembîlfiroş ji kelê berdide û çîrok bi vî awayî bi dawî dibe.

Ji bilî vê encamê di gelek varyatan de serpêhatiyên Zembîlfiroş hene bo nimûne Zembîlfiroş û Xatun herdu jî dişewitin, Zembîlfiroş mîr Zembîlfiroş dikuje û hwd. Wekî ku me berê jî gotibû di destanên Kurdî de mijar bi piranî li ser evîn û lehengîyê tên hûnandin. Lê lehengî bi piranî bi qeweta bedenê te nîşandan. Wek mînak dema Sîyabend, Dewrêş û Xano tn pesinandin bi şerkarî û mêraniya bedenî tên pesinandin. Mirov wan her dem di nav şer û ceng û mêranîyê de dibîne. Lê em di çîroka Zembîlfiroş de vê mêranî û qehremanîyê nabînin, Zembîlfiroş lawikekî feqîr û jar e, bi firotina Zembîlan debara xwe dike, tu îddayen wî yen şer û mêranîyê tune ne. Lê ev nayê wê wateyê ku di destana Zembîlfiroş de tu lehengî tune ye. Na, lehengîya mezin di destana Zembîlfiroş de ye, ew jî lehengîya şerê bi nefis û şeytan re ye.

Zembîlfiroş lehengê namûs û masûmîyetê ye, mîna Hz. Yûsif mirinê qebûl dike, lê benamûsîyê qebûl nake, ma ev ne lehengîya herî mezin e? Gelek varyantên destana Zembîlfiroş di nava civakê de cih digrin û tên gotin, ji vana hinek bi zargotina kurdî ne, hinek jî ji hêla kesên wek Feqiyê Teyran û Melayê Bateyî ve bî şeweyeke menzûm hatine nivîsandin. Ji bo em ve çîroke baş fêm bikin pewist e em bingeha dîroka vê destanê jî bizanin. Varyantên vê destanê yên ku ji zargotina kurdî ne û yên ku ji hêla Feqiyê Teyran ve hatine nivîsandin bi seranserî ji hevdu cuda ne. Wek mînak, di zargotina kurdî de piştî ku Mîr van kirinên nebaş en Zembîlfiroş û Gul Xatûne dibihîse, herduyan jî davejê zîndanê û wan tazî dike tîne ber xwe û kêrekê davejê stûyê Zembîlfiroş da ku wî bikuje lê Gul Xatûn kêre ji destê wî digre û mîr dakuje. Di dawiyê de Zembîlfiroş û Gul Xatûn ji di nav hebûna Mîr de bi hevdu şa dibin. Lê Çîroka Zembîlfiroş ya Feqiyê Teyran berevajiyê vê ye. Zembîlfiroş tu caran xwe teslîmî Gul Xatûnê nake û ji bo xwe teslîm neke jî xwe ji Kela Ermanê daveje. Lê Xaliqê Rebbê jorîn bi mirina Zembîlfiroş qaîl nabe û Cebraîl dişîne Zembîlfiroş xilas dike. Li gor dîtina me ev varyantên destanê ji bingeha Îslamî ya civakê û Feqiyê Teyran tê. Eger em vê destanê baş bixwînin, em ê bibînin ku hem ji aliyê bûyerê ve hem jî ji aliyê lehengên destanê ve pir dişibe qiseya Hz. Yûsif. Wek mînak: Hz. Yûsif, pêxemb e, pêxember di nava civakê de wek Mîr tên ditîn, ji xwe Zembîlfiroş jî ne lawê mîrekî bû? Hz. Yûsif bi xweşikî û qeşengîya xwe dihat pesinandin, Zembîlfiroş jî bi xweşikbûna xwe tê pesinandin. Dîsa Hz. Yûsif ji bavê xwe Yaqûb vediqete dikeve nav bîre û di dawiyê de jî dikeve zîndanê.

Zembîlfiroş jî di heman rewşê de ye, ew jî ji hêla Gul Xatûne ve bi avetina zîndanê tê tehdît kirin. Hz. Yûsif ji bo namûsa xwe teslîmê Zuleyxayê neke zîdana tarî li xwe qebûl dike. Zembîlfiroş jî, ji bo ku namûsa xwe teslîme Xatûnê neke xwe ji kelê davêje xwarê. (Filiz, Mehmet Şirin,2013).

2.1.4. Destana Binefşa Narîn

Dewrêş Axa Mîre Qerejdaxê ye. Rojekê ji rojên Xwedê Dewrêş Axa diçe li ser kaniyê û li ser ve kaniyê keçîkekê wek periyên dibîne. Dilê Dewrêş Axa dikeve vê keçîka delal. Halê wê dipirse ku ka gelo ev keçîk kê ye û ji ku tê? Dewrêş Axa bangî Qerwaşê dike û jê dipirse ka gelo ev qîza delal kê ye. Qerwaş dibêje: “Ew keçî Faris Axa ye, konê Faris Axa bi xwînê bûye xwe ji Çîyayê Tewrazê gihandiye Çîyayê Qerejdaxê.” Dewrêş Axa dikeve li nav xewn û xeyalan da ku wê ji xwe re bixwaze û xelatan ji bo Binefşê dide amede kirin û wiha bang li xulamê xwe dike: “Xulamo, lawo! Bazde were vê derê. Tu îro hêştiran gişî berde ji fezê ye. Keriye mihan berde ji gomê ye. Berxan berde ji kozê ye. Terş û teraş tevî hevûdu bike, bajo, bixana devê deriyê malê ye. Ku xelk di ber te her û bê ye. Bêjin ev terş û teraş bê xwedî çî dike li vê derê ye. Ji xelkê re bibêje, ev terş û teraş hemû ji bo erêkirina Binefşê ye.”

Dewrêş Axa wê şevê bang Faris Begê dike û daxwaza xwe ji Faris Axa re tîne ziman lê Faris Beg dibêje ku ew bi tena serê xwe nikare vê biryarê bide, pêwîst e ku ji kurên xwe û keçî xwe Binefşê re bipirse. Dema Faris Beg diçe vê daxwaza Dewrêş Axa ji kurên xwe re dibêje, kurên Faris Beg li dijî vê daxwazê derdikevin û dibêjin: “Dewrêş Axa nod salî ye, xwişka me Binefş hîn zarokeke çardeh salî ye” Wê gavê Faris Axa dibêje: “Nexwe, hûn wîsa difikirin em ê cil û lîbasên peritî yên feqîran li xwişka we Binefşê bikin û bila biçî li ser kaniyê xwe kor bike, seqet bike, dîn û har bike da ku Dewrêş Axa jê sar bibe û dest ji Binefşê berde, na jî pêwîst be em ê biçin serê Çîyayê Tewrazê li bal dijminê xwe bimînin.” Lê Binefş jî vê yekê qebûl nake û malbata Faris Beg neçar dimîne û konê xwe bar dîkin diçin Çîyayê Tewraze.

Dibe sibe Dewrêş Axa dibîne ku ne Faris Beg heye ne jî konê wî li cihe xwe ye. Dewrêş Axa fêr dîke ku Faris Beg xwe ji ber wî û daxwaza wî daye alî. Dewrêş Axa gazî pencî siwarên xwe dîke û dide ser şopa Faris Beg. Dema Dewrêş Axa xwe digihîne ba konê Faris Beg birayê Binefşê li hemberî xwe dibîne, di navbeyna Dewrêş Axa û birayên Binefşê de şer diqewime û çil siwarên Dewrêş Axa tên kuştin. Dewrêş Axa neçar dimîne û li rêyekê digere ku bireve. Lê Dewrêş Axa vê yekê ji bîr nake û edî xwîn di navbeyna wî û Faris Beg de herikîye.

Dewrêş Axa bi lez û bez diçe gazî du sed siwarên din jî dîke û davêje ser konê Faris Beg lê vê carê du birayên Binefşê tên kuştin, yê mayî jî kuwet lê namîne ku serî bi sed siwarî derîne. Cembelî kurê Mîre Hekariyan di ve navberê de dengê hewar û gazîna Binefşê dibihîse û xwe digihîne hewara wan û sed siwarên Dewrêş Axa dîkuje, Binefş û birayê wê ji nava destê Dewrêş Axa derdixe.

Piştî vê bûyerê dilê Cembelî dikeve keçika bedew Binefşê û soz û peyman didin hev ku edî destgirtiyê hev in, Faris Beg jî vê yekê dipejirîne û êdî Binefş dibe destgirtiya Cembelî. Cembelî ji bo ku karê daweta xwe diçe Hekariyê, lê qet hesaba Dewrêş Axa nake, tu niyeta axa nîne ku dest ji Binefşê berde, vê carê pênc sed siwarên digihîne hev û davêje ser konê Faris Beg, Faris Beg û kurê wî dîkuje Binefşê jî ji xwe re tîne û tê li ba gelê xwe. Dewrêş Axa dizane ku Binefş destgirtiya Cembelî ye ji ber vê yekê jî tevî gelê xwe koçî cih û warekî din dîke Dema Cembelî vedigere ba konê Faris Beg, dibîne ku Faris beg û kure wî hatine kuştin û Binefş jî ne diyare. Cembelî dikeve ser şopa evîndara xwe Binefşê û rastî keriyekî pez tê. Ji Şivan dipirse eve pezê kî ye? Şivan dibêje ev pez ê Dewrêş Axa ye mîrê Êlê ye. Cembelî fêr dîke ku ev pezê Dewrêş Axa ye, bi Şivan re bazarekê dîke û xwe dixê şiklê Şivan, Cembelîyê kure Mîrê Hekariyan dibe şivanê Dewrêş Axa. Di vê navberê de kurekî Binefşê çêdibe, ji ber ku Binefş zewaca Dewrêş Axa qebûl nekiriye hîn dilê wê li ser Cembelî ye. Gava kure Binefşê çêdibe navê wî jî Cembelî datîne.

Dema Cembelî şivanetiyê dike, berîvanek tê beriyê. Ev berîvan Qerwaşê Binefşê ye, Qerwaş Cembelî nas dike û xwe digihîne ba Binefşê hal û ehwalê Cembelî jê re dibêje. Binefş pêşiyê bawer nake ku ew Cembelî be, lê belê dîsa jî xwe digihîne ba şivan û dema xencera wî dibîne derdixe ku ev Cembelîyê kurê Mîrê Hekariyan e, Cembelî û Binefş bi hevdu şa dibin. Cembelî û Binefş biryar didin ku êdî ji vir birevin û bi hevdu şa û dilşa bibin ji ber vê yekê jî ji bo reva xwe planekê saz dikin. Wê şevê bi planekê Dewrêş Axa dişînin ber pez, Binefşê kurê xwe Cembelî dike xew û ew, Cembelî dest didin hev û diçin. Dema Dewrêş Axa vedigere malê fêhm dike ku Binefş çûye. Dewrêş Axa radibe dide ser şopa Cembelî û Binefşê ku wan zevt bike, lê çare nîn e û dev ji wan berdide, Cembelî û Binefşê Narîn bi hevdu şa dibin. (Filiz, Mehmet Şirin,2013).

2.1.5. Destana Siyabend û Xecê

Sîyabend, xortekî Silivî ye. Hêj di temenê xwe ye piçûk de bê dayîk û bav dimîne. Sîyabendê Silivî piştî bê day û be bav dimîne apê wî lê xwedî derdikeve êdî Sîyabend li ba apê xwe dimîne.

Apê Sîyabend mezinê gund e. Sîyabend jî dixwaze mîna apê xwe li gund mezinahiyê bike. Siyabend xortekî çeleng e, bi darê zorê zarokên gundiyan ditirsîne û ji zarokê gundiyan re dibêje: “Ape min Mihemed, mezinê bavê we ye, ez jî mezinê we me. Ji îro û pê ve her gava ku em herin çolê, divê kesek ji dest vala neyê, hûn ê hêk û mirîşkan binîn. Em ê li çolê bipêjînin, bixwin û kêfa xwe bikin, dinya çawa diçe bila wîsa here.”

Sîyabend xortekî gurî û xwedî hêz bû. Destên wî giran in, her roj zarokên gundiya dide ber pên û şîmaqan, ji ber wê jî zarokên gundiya jê gelek ditirsin û ew çî dixwaze hemû xwestekên wî tînin cih, wek gotina wî dikin. Zarokên gundiyan diçin malên xwe û jê re hek û mirîşk û nan û xwarinên din tinîn. Ev rewşa wî ya xirab û zordariya wî gundiyan aciz dike û gundî diçin li ba apê wî û jê re dibêjin: “Êdî ji destê te û biraziyê te tu rihetiya me nema. Eger hûn wiha bikin em ê te ji

mezinahiya gund derbêxin û gotinên te nakin. Tu mezinê me yî, îcar çi heqê biraziyê te heye, ku wiha li serê zarokên me dike, ne hêk û ne jî mirîşk bi me hiştin. Tu wî ji vî gundî dertînî, derîne, an em ê vê gavê te ji mezinahiyê derbêxin.” Apê Sîyabend êdî ji ber vê rewşê Sîyabend ji gund mişeqte dike. Sîyabend li çolan bi tenê dimîne. Li çol û çepelan bi ajalan re hevaltiyê dike û bi awayekî hovane jiyana xwe didomîne. Mirov jê dûr dikevin, kes naxwaze nêzîkî wî bibe û bi vî mirovê hov re hevaltiyê bike.

Rojekê dema Sîyabend li çolê bi tenê ye, birûsk li dara çinare (li gor varyantekê darê gûzê ye) dixwe û darê dişeqîne. Sîyabend ve asina birûske radihêje û dibêje: “Ez ê herim, asinê bibim li ba hesinkar, ji xwe re xençerekê bidim çêkirin, heke tiştêk ji ber ma, bila bibe mertal ji min, xençer jî bila bibe şûrê min.” Sîyabend êdî xwedî şûr û mertalekî ye.

Sîyabend ji birçîna jar û qels bûbû, dixwest li van çol û çolistanan ji xwe re piçekî xwarin bidest bixe û zikê xwe têr bike. Di heman demê de jingavana gund nanê gavaniyê ji nava gund berhev kiriye û elbika xwe jî tejt mast kiriye di ber Sîyabend re derbas dibe. Her çiqas Sîyabend bi xweşî ji jingavanê nanekî dixaze jî rehm nakeve dilê jingavanê û jê re dibêje: “Tu vêgavê bimirî li ser sergoyê rêxê ye, Te tehm nekir nanê gavaniyê. mehira di elbê.” Li ser vê yekê Sîyabend fêhm dike ku ne bi darê zorê be ev jinagavane nan nade wî. Sîyabend destê xwe davejê pêsira jingavanê, çîmek davejê xewqa wê, dixwe û Sîyabend radihejê tûrê nan û elba mehîrê û dibêje ya Rebbî şikir ji te re. Piştî re vicdana wî qebûl nake û jingavanê hêmbêz dike û dibe mala wê.

Gavan tê malê, bala xwe dide ku jina wî di nav nivînan de ye û xwe dirêjkirî ye. Gavan dibêje: “Keçê tu hêj jî neçûyî, te nanê gavanî nebiriye!” Jina gavan tiştên hatine serê wê yek bi yek jê re dibêje. Gavanê gund ji vê bûyerê gelekî aciz dibe. Roja paştir her kes çêlekên xwe didoşin û berê wan derve didin, ji berk u gavan nehatiye li ber garanê hemû dewar berê xwe didin ba xaniyê apê Sîyabend û parêzê apê Sîyabend xira dikin. Piştî vê yekê Sîyabend jî dikeve nav garanê û hema kijan çêlek dikeve ber destê wî, kêrê li zikê we dixwe û erdê dide. Çêlekek jî ji ber destê wî nafilite. Tenê golîkekê berdide di bêje ku da ku xêr û gunehên min bikevin hev. Piştî ve bûyerê gundî tev ji Gurî (Sîyabend) aciz dibin û cardin diçin ser apê Sîyabend, kuştina Sîyabend jê dixwazin, apê Sîyabend jî ji biraziyê xwe zehf aciz

bûye û kuştina Sîyabend li gundiyan helal dike. Gundî wê şevê tev li hev dicivin û sed û pêncî xortên Silîvî kom dikin da ku Sîyabend bikujin. Sed û pêncî xortên Silîvî dikevin pey şopa Sîyabend da ku wî bibînin. Di navbera xortên Silîvî û Sîyabend de şerekî dijwar derdikeve lê Sîyabend sed û pêncî xortên Silîvî li erdê rast dike. Şîn û gîrîn dikeve li nav Silîvîyan.

Li gundekî din xortek hebûye, dergîstî bûye. Ew tiştê ku hatiye serê xortên Silîvîyan dibihîse û li mehina xwe siwar dibe berê xwe dide Silîva. Li ber derê mala xwezûrê xwe disekine û cihê Sîyabend jê dipirse, her çiqas dergîstiya wî naxwaze ku biçe şerê Sîyabend jî, ew berê xwe dide aliyê Sîyabend da ku wî bikuje. Lê hîn di derba yekem de Sîyabend wî ji dil digre. Xort hewariya xwe ji Sîyabend dixwaze û jê re dibêje: “Gurî ez li bextê te û Xwedê! Xwezûrê min gotiye, tu Gurî bi saxî bînî li vê derê, ez ê dergîstiya te, li te mehr bikim bêheq . Dê rahêje hefsarê mehîne ez berê xwe bidim mala xwe.” Piştî ku xort bi vî awayî bang li Sîyabend dike, gunehê Sîyabend jê tê bi hefsarê mehîne digre û berê xwe dide gund û li gund Sîyabend di nav kemîna gundiyan de dimîne û apê wî mîrkutekî li nava milên wî dide da ku wî bikuje, le jinapa Sîyabend nahêle ku apê wî Sîyabend bikuje û wiha dibêje: “Bi Xudanê şev û rojê! ku tu îca destê xwe bidî Gurî, ez jinanî nakim li mala te, xelk ê bibêje, birazîyekî meriv ê mêrxas hebe, ku meriv karibe here nava xelkê.” Piştî van gotinan apê Sîyabend dest ji Sîyabend berdide û Sîyabend berê xwe dide xurbetê digihêje serê Çiyayê Sîpanê. Li wir rastî Hesên Axa tê, kêfa Hesên Axa gelekî ji vî xortê çeleng tê û bang lê dike ku li ba Hesên Axa bişxule, lê ji destê Sîyabend tu kar nayê. Sîyabend peymanekê bi Hesên Axa re rêdike û wiha dibêje: “Tu dê odeya min cuda bikî. Tu dê metînekî ji min re vegirî. Doşeka min bila ji pûrtikên qaz û qûlingan be. Balgî û nazbalgî li ber pala min bin û qehwegerê te gava qehweyê bigerîne bila qehweya ewil ji min re bîne bes sozek min a din heye, dinyayê, tu ji min re bibêjî quzulqurt Ez ê bibêjim, li ser dilê te girt” Piştî ve gotinê, Hesên Axa şert û mercên Sîyabend qebûl dike bi hev re peyman dikin.

Ji demeke şûn de dilê Sîyabend dikeve keça Hesên Axa Gulperiyê û dilê xwe jê re vedike lê Gulperi kêf û henekên xwe bi Sîyabend dike. Li ser vê yekê Sîyabend çîmekê li xewqa Gulperiyê dixwe, dema Hesên Axa vê yekê dibîne şûrekê li Sîyabend dide. Sîyabend pir aciz dibe û peymana xwe û Hesên Axa di bîra wî de tîne. Hesên Axa piştî vê bûyerê dixwaze xwe ji Sîyabend xelas bike lê ev ne ewqas

hêsan e. Rojekê Sîyabend diçe pêşiya kervana dewletê û dest dide li ser mal û milkên dewletê. Serbazirganê kervana dewletê hewariya xwe ji Sîyabend dixwaze û dibêje ku eger wî nekuje ew ê mesrefên daweta wî bike, Sîyabend li ser vê yekê wî dibexişîne û dişîne mala wî. Sîyabend mal û milkên talanê tîne ber devê deriyê qesra Hesên Axa, Hesên Axa bi aqilmendê xwe şewiriye û gotiye ku heya ez keça xwe nedim vî dînî ez jê xilas nabim. Lê Sîyabend vê yekê qebûl nake û ew bi şev xewnekê dibîne ku ew û Qeregetran bi hev re hevaltiyê dikin. Sîyabend ji mala Hesên Axa derdikeve û diçe. Li rê rastî Qeregetran tê. Bi hev du re şer dikin paşê hîn dibin ku herduyan jî heman xewn dîtiye û dev ji şerê hev berdidin, bi hev re dibin rêheval.

Sîyabend û Qeregetran li rastî konekî tîne û keçika malê Xecê wan dike mevanê xwe. Dilê Sîyabend dikeve vê keçika xweşik û bedew û wê ji birayên wê dixwaze. Birayên Xecê vê yekê qebûl dikin û Xecê didin Sîyabend. Sîyabend ji bo amedekariya dawetê bike berê xwe dide Elcewazê, ba serbazirganê ku bexşandibû. Di vê navbere de kurê Mîrê Şikakiyan dibihîze ku birayên Xecê dest girtî kirine û davêje li ser konê mala bavê Xecê û tevde birayê Xecê dukuje û Xecê ji xwe re dibe.

Dema Sîyabend vedigere û vê rewşê dibîne, berê xwe dide ba Mîrê Şikakiyan û Xecê Xilas dike. Mîrê Şikakiyan bi leşkerên xwe ye giran pey wan dide û di bin qontarê Çiyayê Sîpanê de Sîyabend hemû leşkerên Eşîra Şikakiyan dukuje û bi destê Xecê digre û diçe. Rojê Xecê ji xew şiyar dibe, dibîne ku duwazdeh pezkovî hene û di nava wan de yek bi qiloçên xwe li deh nêriyan dixê û ji serbizinê vedigerîne. Xecê vî nêriyê pezkovî dişibîne Sîyabend û ji Sîyabend re dibêje. Lê Sîyabend bi vê gotinê naye ser û dibêje ez mêrxasekî ewqasî bêhempa me lê tu min dişibînî nêriyekî pezkovî û êrîştî ser pezkovî dike. Sîyabend pezkovî digre û serê wî li ser zinarekî jê dike. Lê hêj ji di pezkovî de ruh heye û pezkovî şaxê xwe di ranê Sîyabend re radike û Sîyabend ji serê wî zinara bilind dikeve ser dara benîştokê. Dema Xecê mêze dike ku Sîyabend ji ser zinarê bilind ketiye ser darê, bi lez û bez diçe, benîkên hefit gundan tevî zilamên wan tîne. Lê mixabin nikare Sîyabend ji binê wê zinarê derxîne. Dema Xecê dibîne ku ji bo xelaskirina Sîyabend tu derfet û çare nîn e, ew jî xwe ji serê wî zinara bilind bera jêre dide. Herdu, ne li vê dinyayê be jî, di dinyayeke din digihjin hevdu. (Filiz, Mehmet Şirin,2013).

2.1.6. Destana Kela Dimdimê

Xano kesekî feqîr û jar e, ji bo ku ji xwe re kar û barekî bixwaze, xwe digihîne ba Şah Ebbas. Şah Ebbas, Xano dişine ber hespên xwe ku hespên wî xwedî bike. Rojekê çend talanker davêjin li ser Xano û hespên Şah Ebbas, lê Xano ne ditirse û ne jî direve. Xwe û hespan xelas dike, lê mixabin di vî şerî de milekî Xano jî jêdibe û dimîne bi milekî. Xano xwe digihîne ba Şah Ebbas û qala vê bûyerê dike. Li ser vê yekê gelekî kefa Şah Ebbas ji Xano re tê û fermanê dide zêrkerên xwe ku ji Xano re milekî zêrîn çêbikin.

Zêrker ji Xano re milekî zêrîn çêdikin û êdî Xano dibe Xanoyê Çengzêrîn. Rojek tê, Xanoyê Çengzêrîn êdî hew dixwaze li ba Şah Ebbas bimîne. Ji ber ku Xano gelek gencîne jî di binê erdê de dîtiye, dixwaze serbixwe be û diçe ba Şah Ebbas û jê re dibêje: “Erd bide min qasî çermê gayê da ku ji bo xwe çê bikim avayê.” Şah Ebbas vê daxwaza Xanoyê Çengzêrîn qebûl dike û qasî çermê ga erd dide Xanoyê Çengzêrîn û ew jî hurmeta xwe nîşanî Şah Ebbas dide.

Xano çermê ga radike dibe di nav avê de heft rojan dihêle bi vî çermî deşt û newalan ji xwe re zeft dike. Dawiyê pênc sed pale li xwe dicivîne û ji xwe re kelehekê bêhempa çêdike ku her kes heyran û xizmetkar bû ku vê kelhê bibîne. Her diçe nav û dengê Kela Dimdimê li heremê belav dibe. Kurd êdî xwe giredayî Şah Ebbas nabînin, Şah Ebbas ji vê yekê pir aciz dibe û davêje li ser Kela Dimdimê. Di Kela Dimdimê de Kurd heft salan li ber xwe didin, namûs û şerefa Kurdan radestî Şah Ebbas nakin. Lê wekî her demê, xaîn derdikevin sehneyê, xayîne vî sehneyê jî Mehmûdê Melekanî ye.

Mehmûdê Merikanî ji pencerê kaxizekê davêje ji Şah Ebbas û jê re dibêje eger wî bihebîne dê rêya ava ku diçe Kela Dimdimê jê re bibêje. Şah Ebbas vê yekê qebûl dike. Şah Ebbas, avê li ser Kurdên Kela Dimdimê dimiçiqîne û Kurdan bê av dihêle. Xanoyê Çengzêrîn civata xwe dicivîne û dike bi wan bişewire ku dê li ber vê rewşê çî bikin. Di civatê de xortekî çeleng radibe û dibêje: “Mîrin xweştir e ji koletiya Şah Ebbas.” Civat bi giştî vî biryarê dipejirînin û xwe radestî Şah Ebbas nakin û diya Xano bang li Xano dike. Di bêje xwe radestî Şah Ebbas nekin. Ev hewara diya Xano tê pejirandin û Kurd

biryara berxwedanê didin, lê Kurdên Kela Dimdimê dixwazin bi xwe re Şah Ebbas jî bibin mirinê da ku ev zulma ku kiriye jê re nemîne. Ji ber vê yekê biryarê didin ku pêşiyê zilam derkevin derveyê kelê û bi Şah Ebbas re şer bikin û wisa jî dikin. Paşê hemû tên kuştin. Dema hemû tên kuştin Şah Ebbas dixwaze ku ji bo talanê têkeve kelehê, lê diya Xane Çengzêrîn xwe digihîne cebîlxanê û agir bi çek û sîlehan dixê, ne Şah Ebbas ne jî leşkerên wî diminin.

2.1.7. Kurteya Destana Memê Alan

Em dê xebata xwe de berhema ku ji aliyê Roger Lescot ve hatiye berhevkirin dê esas bigirin. Li gori vê berhemê Destana Memê Alan bi kurteyî wiha ye:

Bajarê Mixribê ji aliyê sê birayan ve tê revebirin. Eli, Emer û Elmaz Beg. Temenê her sê birayan di ser şêstî re ye. Her sê bira ji gelek dewlemend in, lê belê bê zarokin, yani zarokên wan çênabin. Rojekê cejna qurbanê her sê bira cilên derwêşa li xwe dikin û berê xwe didin çolê. Di rê de ji bo halê xwe digrîn. Bi emrê Xwedê; Xoce Xidir dertê peşiya wan. Ji wan re dibêje, xêr û xêratan bikin, feqîr u fuqaran têr bikin, malê xwe di rêya Xwedê de bidin û herin qîza Mirê Qureyşiyî ji birayê xwe yê mezin re bixwazin piştî neh mehan, wê kurekî ji Elî Begê re çêbibe. Nav lê nekin heta ez werim.

Her sê bira gotinên Xoce Xidir gotine dikin. Piştî neh mehan kurek ji Elî Begê re çêdibe. Rojekê di meclîsa Elî Begê de dixwazin nav bidin kurê Elî Begê, lê ew li benda Xoce Xidir dimînin. Ew dibêje, kalekî wî heye em li benda wî ne. Xoce Xidir tê, navê kurîk Memê Alan datîne.

Temenê Mem di gehe panzdehan. Rojekê herkes direve aliye behrê, torevan di behrê de bi tora xwe de tişteke digirin. Tişteke pir giran û ecêb e. Mem jî ji bo dîtina wî tiştê ku hatiye girtin diçe ber behrê. Bi alîkariya hezar û pênc sed xortên Kurdan, torê ji behrê dikşînin û dibînin ku hespek di nav torê de ye. Mem vî hespî bi alîkariya Emer Begî siwar dibe navê hespê datîne: Bozê Rewan . Ji bo hespê zîn û taximeke gelek giranbûha tê çêkirin.

Sê qîzên Padîşahê Periyî hene navên wan Tavbano, Heyvbano Stêrbano

ye. Stêrbano ya heri biçûk e. Ew her sê jî di bin postê kewan de xwe vedişêrin. Rojek her du xweşkên Stêrbano yê kincên kewan derdixin û dikevin avê, Stêrbano postên xwişkên xwe vedişêre û li xweşîkiya xwişkên xwe dinêre û dibêje: “Ji we xweşîktir kes tune ye.” Xwişkên wê dibêjin: “Na ji me xweşîktir du kes hene yek kurê Mîre Mixribiyan e, ku ew mirê padîşahê Kurdan e, ya din jî keça Mîr Zengîn, Zîna Zedan e.” Stêrbano dibêje: “Heta hûn her du kesan nîşanî min nedin ez postê we nadim.” Her du xwişk vî şertî qebûl dikin. Bi sihrê û alîkariya periyan, Zînê tevî textê ku tê de raketî radikin dibin qonaxa Memê Alan û paytexta Mixribiyan.

Mem ji xewê şiyar dibe û dibîne ku textek li cem textê wî hatiye danîn. Tiştê ji vê rewşê dernaxe. Dikeve nav nivînên xwe lê xewa wî naye. Dinerê ku di texta kêleka wî de keçeke gelek xweşik heye. Dîsa dikeve li nav nivînên xwe Zîn bi sihra her sê xwişkên perî ji xewa xwe şiyar dibe. Li dora xwe dinêre, textê Memê Alan dibîne, şaş dibe. Li nav nivînan dinêre û dibîne ku xortekî gelek qeşeng di nav nivînan de raketiyê. Piştî bi Mem re dikeve niqaşê, fêma dike ku tiştê ecêb hatiye serê her duyan. Heta sibe bi hev re diaxivin û piştê dile wan lihev germ dibe. Gustîlkên xwe bi hev diguherînin. Li ser gustîlka Memê Alan navê wî û ya Zîna Zedan de jî navê wê hatiye nivisandin. Dawî dîsa dikevin xewê.

Qîzên Padîşahê Periyan dîsa bi sehrê û alîkariya perî û cinan textê Zînê dibin qonaxa wê, bajarê Cizîra Botan. Serê sibe Zînê gava şiyar dibe, dibîne ku li menzela xwe ye û Mem tune ye. Gustîlka Mem tê bîra wê li gustîlkê dinêre li ser qaşê gustîlkê “Memê Alan Padîşahê Kurdan” hatiye nivîsandin. Ji vê derdixê ku tiştê duh bûye, ne xewn e. Diqîre û xwe davêje li nav nivînên xwe. Piştê çil û yek cariyên wê tîn, halê wê dipirsin, ew tiştê nabêje; kiraseki reş li xwe dike û dikeve nav nivînên xwe. Cariye xeber didin Mîr Ezîn û dibêjin Zîn nexweş ketiyê. Memê Alan gava serê sibe şiyar dibe ew jî dibîne ku Zîn ne li cem wî ye. Li gustîlka xwe dinêre û fêma dike ku tiştê duh şevê bûy rast e. Ji menzela xwe dernakeve. Destebirakê wî serokê hezar û pênc sed xortên Kurdan Beglî dinerê saet bûye dido û deng ji menzela Mem dernaye. Dikeve meraqê Pişt re dibîhize ku nalîneke nexweşekî ji menzela Mem tê. Mem ji Beglî re dibêje: “Hespê min amade bike û heqîba min jî tije zêr û cewheran bike. Ez ê herim Cizîra Botan.” Beglî diçe, ji dayîk û bavê Mem re hal û mesela Mem dibêje. Bav û apên Mem tîn, ji Mem dixwazin ku dev ji welatê xwe bernede û ji bo xewneke şewan neçe cihekî. Lê

ji bo derdê ku Mem dikşîne tu çare nabînin. Ji ber vê yekê, çûyîna Memê Alan qebûl dikin.

Memê Alan li Bozê Rewan, kuriyê behrê siwar dibe û derdikeve rê. Di rêya Cizîra Botan de bi emrê Xwedê, Mem rastî Xoce Xidir tê. Gava nezî bajarê Cizîra Botan dibin Xoce Xidir şîretan li Mem dike. Dibêje: “Ez di zanim derdê te çi ye, lê li ser rêya te qîza Bekoyê şeytan sekiniye. Ew dixwaze te bixapîne. Wê xwe xistiye şiklê Zîna Zedan. Tu pê bawer nekî, ew qîza Beko Awan e.” Piştî van gotinan Xoce Xidir winda dibe. Memê Alan li ser rêya xwe rastî qîza Beko Awan Zînê tê. Zîna qîza Bekoyê şeytan dixwaze Memê Alan bixapîne. Lê dawî fêhm dike ku Memê Alan dizane ew kê ye, nikare wî bixapîne, rêya şaş ji Memê Alan re dibêje. Memê Alan bi alikariya şivanekî dikeve rêya rast.

Qîza Beko Awan gava dibîne ku Mem ketiye rêya rast, xwe şil û tazî dike û dertê rêya Mem. Dixwaze bi wî awayî sosretêk bîne serê Mem. Mem dibîne ku çare tuneye xwesteka qîza Beko qebûl dike. Soz dide ku, gava Zîna Zedan bigre here welatê xwe Mixribiyan, dê wê jî bi xwe re bibe. Qîza Beko, piştî ku Mem soz dide, jê re behsa bajarê Cizîra Botan dike. Dibêje: “Bajarê Cizîra Botan sê bend in. Yêk ya kurê Mîr Tacin e. Ev bend ji tucçaran pêk tê. Yek ya kurên Mîr Celal, Hesên, Çeko û Qeretacîn e, serokê diz û eşqiyan in. Benda sisêyan jî ya kurê Mîr Zengîn e, mîrê Cizîra Botan e. Zîn destgirtiya Çeko ye.” Qîza Beko dawiyê ji Mem re dibêje: “Dê li ser rê ya te zilamekî derbikeve, zilameki rispî ye. Ew bavê min Bekoyê şeytan e, ji wî bawer neke ji hespê xwe peya nebe. Gava tu gihştî bajêrî, bawerî bi kesî re neke, here mala Hesên, Çeko û Qeretacîn Tenê ew dikarin derdê te derman bikin.” Piştî xeberdana xwe, Qîza Beko diçe. Mem bi aliyê bajêr de diçe, di rê de ji destê Bekoyê şeytan xelas dibe û bi gelek zehmetiyan xwe digehîne mala Hesên, Çeko û Qeretacîn.

Zînê dixwaze xwe ji halê newxeşiyê derxe. Gazî cariyêke xwe dike, dibêje: “Here Kaniya Qestelê, ji min re avê bîne.” Gava cariya Zînê Rihan diçe ser rêya kaniyê, hatina Mem dibihîze tê ji Zînê re vê yekê dibêje. Zînê ji bo ku rastiya gotinên cariya xwe derxe holê amadekariya çuyîna Kaniya Qestelê dike. Mem ji çûn û hatina mirovên ku ji bo dîtina wî tîr aciz dibe. Her wîsa Hesên û birayên wî jî, dixwazin bi Mem re bi axivin û derdê wî fêhm bikin.

Piştî sê rojan Hesên cihekî ji bu mevanê xwe li koşka jina xwe Sitiye, dide amadekirin. Sitî xwişka Zînê ye. Hesên, li menzela ku li koşka Sitiyê hatiye amadekirin de, bi Mem re di axive û dixwaze derdê Mem fêhm bike. Lê Mem, ji şerma nikare derdê xwe bibêje. Hesên sond dixwe û sozan dide ku Mem derdê xwe bibêje, çare çibe dê bike. Mem dîsa nikare derdê dilê xwe bibêje. Dawiyê Mem derdê xwe ji Hesên re wûsa dibêje: “Mirovê bîaqil, dikare fêhm bike derdê min çî ye, dermanê derdê min taseke ava ji Kaniya Qestelê ye.” Hesên piştî van gotinên Mem, tê digihije ku derdê Mem ne pere ne malê diyayê yan jî meseleke din e, derdê wî derdê evîne ye.

Hesên piştî ku ji cem Mem derdikeve, diçe cem her du birayên xwe û derdê mevanê xwe ji wan re dibêje. Bi her du birayên xwe re soz dide ku ji bo derdê mevanê wan çî çare hebe ew ê bikin. Ji bo çareserkirina derdê mevanê xwe, li ser Hesên û şûrê wî, sê bira soz didin û sond dixwin.

Hesên dizane ku Mem ji şerman nikare bibêje hezkiriya wî kê ye, ji birayên xwe re dibêje, keç û bûkên Cizîra Botan tevî li ser Kaniya Qestelê bicivînin. Çeko, bila bê haya Mem jê hebe, bila li pişt Mem bisekine ji hal û tevgera Mem derxîne ku hezkiriya Mem kîjan qîz an jî bûka Cizîra Botan e. Piştî ku tegihîştin ku hezkiriya Mem kê ye ew kê be jî ew ê bi darê zorê an bi xweşkayî ji Mem re bînin Keç û bûkên Cizîra Botan tev bi cilê xwe yê herî xweşik bi aliyê Kaniya Qestelê ve diçin. Herî dawiyê Sitiya jina Hesên jî bi aliyê Kaniya Qestelê ve diçe. Tenê Zînê dimîne.

Zînê gava di ber koşka Hesên û birayên wî re derbas dibe, çavê wê bi Memê Alan dikeve. Di cihê xwe de disekine. Nikare gav bavêje. Mem jî gava Zînê dibîne hişên wî diçin. Çeko gava wan û rewşa wan dibîne, nikare bisekine, sozên ku dabû Hesên ji bîr dike û ji bo Mem fêhm bike ku çonga xwe dide pişt Mem. Mem û Zînê gava fêhm dikin ku Çeko her tişt dît, li ber xwe dikevin. Zîn ji ber ku dergistiya Çeko ye, ditirse Çeko tiştêk bîne serê wan. Hesên li benda xebera Çeko ye ku bibêje hezkiriya Memê kîjan keçik e. Hesên dikeve fikaran, dibêje qey hezkiriya Mem, Sitiya jina wî ye, ji ber wê Çeko deng dernaxe û tiştêkî nabêje wî. Piştî Çeko tê li ba Hesên û dibêje: “Hezkiriya Mem, Zîna dergistiya min e.”

Hesen li ber halê Çeko dikeve. Lê dîsa jî dibêje: ez ê li ser soza xwe bimînim, min carekî soz daye, nabe ku ez ji soza xwe vegerim. Çeko ji birayê xwe re rica dike ku tiştêkî jê nexwaze û dikeve fikrên kur. Piştî Çeko şûr li birayê xwe Hesen dikêşîne. Lê Hesen ji diqehire û dibêje me soz daye, nabe em dest ji sozên xwe berdin. Çeko piştî gotinên birayê xwe ye mezin şerm dike, ji tiştên ku kiriye poşman dibe û ji Hesen lêborîna xwe dixwaze. Hesen pêşî li ber xwe dide, dawiyê dinerê ku Çeko bi rastî jî ji gotin û tevgera xwe gelek poşman e, wî effû dike.

Hesen dixwaze Mem bişîne li ser Kaniya Qestelê, lê Mem ji ber şermê û fitne û fesadiyên ku wê werin gotin, naxwaze here wê derê. Hesen, behsa qanûna Cizîra Botan dike û dibêje, “Ger kesek an dewarek bikeve nav erdê xelkê me, ev kesê xwedî erd dikare wî mirovî an wî dewarî xwe re bîne.” Hesen piştî van gotinên xwe, tapûya Kaniya Qestele dide Mem û dibêje: “Bibêje ku ev erd yê min e. Piştî te ev got kesek nikare tiştêkî bibêje.” Mem, tapûya Kaniya Qestele digire; li Bozê Rewan siwar dibe û bi aliyê kaniyê ve diçe. Ji Zînê dixwaze ku çarika xwe rake. Lê Zînê xwesteka wî bi cih nayne. û dibêje: “Ez vê yekê bikim dê li vir şer û pevçûn derkeve û dê me her duyan ji bikujin. Tu here cem Hesen û birayên wî, we derdê me derman bikin.” Lê Mem ji ya xwe de nayê xware. Mem dibêje; taseke ava Kaniya Qestelê bi destê xwe bide min. Lê Zînê dîsa vê xwesteka Mem jî qebl nake. Mem dîsa ji Zînê taseke av dixwaze. Zînê jê re dibêje: “Tu zanî, ez ewqas dibêjim tu fêman nakî dê peya be ji hespê xwe, were xwarê. Em li ser Kaniya Qestelê birunin, ev ji taseke av dayîna min hêj çêtir e.” Lê vê carê jî Mem xwesteka Zînê qebl nake, dibêje: “Ev tiştê ku tu dibêjî ne layiqê mîr û padîşahan e.” Dîsa dixwaze Zînê çarika xwe rake û taseke avê bidetê. Lê Zînê dibêje: “Bi zorê jî be ez vê yekê nakim.” Mem dinêre nabe, dibêje: “Min bi peran, erdê Kaniya Qestelê kiriye û tapûya wê bi min re ye. Li gor qanûna Cizîra Botan tiştên li ser erda Kaniya Qestelê yê min in.” Ji qîzên li ser kaniyê re dibêje, netirsîn, ez ê tenê ceza bidim Zînê, ji ber ku hûn tev bi wê re hatine ceza yê we ye. Zînê dibîne tiştêkî bike tune ye, wekî Mem nû hatibe, silava wî qebl dike û hêzara li ser çavên xwe radike, piştî re taseke avê dide Mem. Mem ji hespê xwe peya dibe û tevî Zînê li ser Kaniya Qestelê rûdine.

Hesen ji birayên xwe re dibêje; ka herin binêrin tiştêkî neyê serê mevanê me. Çeko Qeretacî berê xwe didin rêya Kaniya Qestelê, dinêrin gelek kes bi aliyê Kaniya Qestelê ve tên wan didin sekinandine û wan paş ve vedigerînin. Çeko

tê li ba Mem û Zîn û ji Mem re dibêje, Hesên dibêje Mem dixwaze bila Zînê bîne were an dixwaze li gor edet û qanûna tevbigere bila Zîne bihêle were, ez ê li gorî usûl u edetên padîşahan wî bizewicînim. Mem li hespê xwe siwar dibe û berê xwe dide qonaxa Hesên, Çeko û Qeretacîn. Mirovên ku Çeko di rêya kaniya Qestelê de ew veğerandibûn, tiştên dî bîhîstine, bi kirina yekê bi hezaran belav dikin. Ji nav wan yekê dizek tê û her tiştî ji Bekoyê şeytan re dibêje. Bekoyê şeytan, ji her sê birayan jî hez nake. Dixwaze wan û mevanê wan bi awayekî wînda bike Bekoyê şeytan tê li ba Mîr Ezîn û jê re dibêje, her sê bira dixwazin mevanê xwe bikin Mîrê Cizîra Botan û te jî mîritiyê defû bikin. Piştî ku Mîr van xeberên Beko dibihîze, çareyekê ji Beko dixwaze. Beko dibêje: ev hêsan e. Tu ziyafetekê bide û gazî li herkesî bike. Hesên, birayên wî û mevanên wan jî dê werin ziyafetê. Di wê demê de ez e werim, bibêjim ku Ecem seri rakirine û tîna li ser bajarê me. Tu jî dê ferman bidî û bibêjî bila herkes şûrê xwe bigire û were em ê bajarê xwe biparezin. Tu min deyne li ser erzaq û nan, ez e axûya Silemanî bixim li nava nanê Mem û ew ê bimire. Em ê jî bi vî awayî ji Mem xelas bibin Gotinên Beko dikevin serê Mîr û wek Beko dibeje tevdigere.

Hesên, birayên wî û Mem tîna mala Mîr. Beko Mem nîşanî Mîr dide. Paşê ji bo dek û dolabên xwe, ji wir diçe û her wekî ferman aniye, bi lez vedigere. Her çiqas Hesên ji Mîr dixwaze ku Mem neye şer jî Beko dîsa bi gotinên xwe wîsa dike ku Mem ji tevli wan bibe. Di rê de Mem ji bo ku vegere û here cem Zînê xwe bi şûrê xwe birîndar dike û bi destûra Mîr vedigere Cizîra Botan. Gava digihîje bajêr, diçe koşka Zînê. Zînê li birîna wî dinêre dipêçe. Her du evîndar li cem hev rudinin û dest bi xeberdanê dikin

Beko gava dibîne Mem ne di nav siwaran de ye, diçe ji Mîre Botan wî dipirse. Mîr ji tiştên kewimtîne ji Beko re dibêje. Beko diçe, cardî bi viran fermaneke dinivîse û tê, dide Mîr ku qaşo şer qediyaye û heta sê mehan rihetî heye. Gava Hesên dinêre ew ê veğerin, difikire ku ka wê çawa zû veğerin û Mem ji rewşa dijwar xilas bikin. Ji birayên xwe re dibêje; hûn her yek bibêjin hespê beza ye û şûr li hev bikşînin, ez ê bibêjim pewîstiya şer tune ye, kerem bikin hespê xwe biceribînin ka ê kî hîn beza ye. Hespe ki zû bigihîje Cizîra Botan, yê din ew ê bezabûna hespê wî qebûl bike. Her wekî Hesên gotî her du bira tevdigerin. Lê Beko ji hale wan fêhm dike ku dixwazin çi bikin, ji ber vê ew

dibêje; bira her kes têkeve ve peşbaziye. Mîr jî li gor gotinên Beko ferman dide. Tew bi hev re dest bi peşbaziya hespan dikan. Berî hemûyan, Mîr Ezîn û Beko digihîjin li ber Birca Belek, diçin ber deriyê malê yê hêla jinan. Mîr û Beko diçin ber menzela Zînê, dikevin hindur Mem gava dengê lingan dibihîze, Zînê dixê bin kurk û hewraniya xwe. Mîr û Beko tên û Mem li menzela Zînê rûniştî dibînin. Mîr hêrs dibe. Mem dibêje; ez xerîb im, min nizanîbu ev der hêla jinan e. Sitiya xwişka Zînê, ku jina Hesên e; gava Bozê Rewan li hewşê dibîne fêr dike ku, Mem hatiye û derbasî Birca Belek cem Zînê bûye. Sitiye diçe aliye Birca Belek û dibîne ku Mîr û Beko derdikevin jorê. Ew jî bi wan re hildikeve jorê. Gava çavê Mem bi Sitiyê dikeve, guliyê Zînê nîşani Sitiyê dide. Sitiyê piştî guliyên Zînê dibîne vedigere û rastî Hesên tê. Ji Hesên re dibêje; mala me şewitî Memê Alan ketiye tengasiye, divê em wî xelas bikin. Hal û rewşa Mem û Zînê ji Hesên re dibêje. Hesên piştî bi çavên xwe rewşa Mem û Zînê dibîne, diçe mal, dewar û heywana dide ber şûran û ji jina xwe re dibêje here ji birayê xwe re bibêje Hesên dîn bûye Sitiyê tê û tiştê Hesên jê re gotiye ji Mîr re dibêje lê Beko nahêle Mîr here. Hesên dinêre ku Mîr naye; agir berdide qesr û qonaxa xwe. Sitiyê ji Mîr re dibêje, Hesên agir berdide mala xwe dîn bûye, lê Beko dîsa nahêle Mîr here. Hesên dinere Mîr nayê, milê kurê xwe ye bicuk digire û wî davejê li nav agir. Sitiyê vê carê bi rastî qîrîn dike û dixwaze Mîr kurê wê ji agir xelaske. Mîr dixwaze here binêre ka çi bûye ji Hesên ku wiha dike, careke din Beko nahêle. Mîr şiqamek li Beko dixê û vedigere ku here, dive navberê de Mem, Zînê berdide. Zînê di şibakê de xwe berdide menzela cariyeyan, lê Beko ve yekê dibîne û qêrîn dike. Bi qerîna Beko, Mîr vedigere û dibîne ku jinek xwe di şibakê de berdide menzela cariyayan. Lê fêr nake ka ev jin kiye. Mîr û Mem li hev şûr dikşînin, Beko dinerê rewş xerab e dikeve nava herduyan. Sitiyê gava ve rewşê dibîne, diçe ji Hesên re dibêje: zû bigihije Mîr û Mem, ew ê herdu hew bikujin. Hesên, dinêre çare tune, ji Mîr re dibêje, ez ketim bexte te û Xweda, ji bo dilê te nemîne, min mala xwe şewitand min kurê xwe avêt agir. Ez ji te re rastiyê bibêjim. Mêvanê min di xewna şevan de Zîn li welatê xwe dîtiye û dilê wî ketiye destgirtiya Çeto dotmama me Zînê. Em ji bo mêvanê xwe ji heqê xwe buhirîne, wekî din dimîne liser milên Mîrê Cizîra Botan gava Mîr mesele fêr dike, şûrê xwe dixê Mem jî wek wî dike. Mîr dibêje, zû bikin em ê

mala Hesên ji agir xelas bikin. Mem xwe davêje li nav agir û kurê Hesên, Celal xelas dike, agir mala Hesên bi tevahî dişewîtine. Her sê birayan û Mem li ber xaniyên şewitî dimînin. Mem dixwaze zirara Hesên bide, xanî û qonaxa wî ji nû ve avake. Lê Hesên ji ve yekê aciz û ji Mem re dibêje: careke din vê meselê veneke. Çiqas Mem li ber digere jî Hesên alîkariya Mem naxwaze.

Wê demê xeber tê ku, Ecem ketiye sinorê Kurdistan. Mir Ezîn ji Hesên, Çeko û. Qeretacîn re xeber dişîne û dibêje, bila nesekinin tevli siwaran bibin. Hesên û du birayên wî radibin û diçin şer Mem li şûna wan dimîne. Mîr ji ber tiştên qewîmîne dikeve fikran. Beko vê rewşê dibîne û dîsa dest bi fesadiyan dike. Ji Mîr re dibêje; Mem bila were, pê re setrencê bileyzin, tenê tu ji vî bibe, ez ê her tiştî derbixim holê. Ez ê tişte nemayî bi Mem bikim. Tiştên Beko dibêje dikeve serê Mîr jî Mîr ferman dide, gazî hemû kurmam û pismamên xwe dike gazî Memê Alan jî dikin. Piştî Memê Alan tê hewşa Mîr û slav dide cemaetê Mîr û Memê Alan bi şertê ku kî şikest ew ê xwe bispêre henek û yarîkê belengazê Mîr û Mem dest bi setrencê dikin. Mem leyîstvanakî zor e sê caran Mîr, têkdiçe. Beko dinêre fena wî naçe serê. Li dora xwe dinêre. Dibîne ku Zîn di şîbakê de runiştîye, berê we li Mîr e, tenê piştî Mem dibîne. Beko gava vê yekê dibîne, ji kefan dikene. Ji Mîr re dibêje carîna siûda mirov bi cîh tê, dixwazî kerem bike tu û Mem ciyê xwe biguherînin Mem û Mîr cih diguherînin. Çavê Mem bi Zînê dikeve û destê wî li ser textê setrencê dileyze, hiş û aqlê wî namîne; şeş destan setrencê wînda dike piştî leystîka setrencê cemaet belav dibe. Beko tê li ba Mem û li ser şertê Mîr û Mem, dixwaze Mem dest û lingên xwe berde. Mem dibêje ka kerem bike ez bibînim çi yariyên te hene. Pêşî Beko bi werîsekê dest û lingên Mem girêdide lê Mem bi hêsanî werîsî ji hev qet qet dike. Beko diçe zincîrek tîne, pê re Mem girê dide, Mem ji zincîrê jî xelas dibe. Beko dibêje, ez benî, ez ê çawa te zêft bikim kanê tu rê nîşanî min bide Mem dibêje qey, her tiştê Beko dike henek û yarî ne, ji ber vê jî, ji dilê safî dibêje, kuro here stewlê çend mû ji dêl û bîjiya Bozê Rewan bîne, çend mûyên serê min jî bîne û min bi wan girêde, wê demê ez ê saetek behîş bimînim. Beko wek Mem gotibe dike û Mem behîş dimîne. Beko wî radike û dike zîndaneke kûr û tarî.

Mem şeva peşî di zîndanê de ranakeve, Bêbextiya Mîr û Beko difikire, Tiştên dema berê li serê wî qewimîbûn difikire. Sitiyê li benda Mem disekne, dinêre

Mem naye malê, xulamên xwe ji bo dîtina Mem dişîne, lê xulam dest vala vedigerin malê. Zîn ji, windabûna Mem dibihîze. dikeve paş deriya û reş li xwe girêdide. Mem di zindanê de sê roj bê av bê nan dimîne. Duayan dike ji Xwedê re.

Qîza Beko hinarek peyda dike axûya mar dike li nava hinarê. Diçe cem Zînê û jê re bavê wê û Mîr çî bi Mem kirîne dibêje. Hinara ku tijî axû dide Zînê û cihe Mem tê de ye ji Zînê re dibêje.

Mem di xewna xwe de bavê xwe, apên xwe, Beglî û kalê Xwe Erner Beg dibîne. Erner Beg di xewna Mem de jê re behsa dinyayê û mirine dike. Emer Beg behsa fena Qîza Beko dike dibêje, haya Zînê jê tune ye lê ew ê were hinara bi axû bide te. Ji xwe tu ê piştî du saetan bimirî, ger tu bi hinara Zînê bide te, bimirî, tu yê bi destê zalima bimirî û bi mertaba şehîdan û ewliyan herî dinya din. Ew e piştî te bi heft rojan Zîn jî bimire. Tu û Zînê hûn ê bi govenda horiyên li cenetê bigihijin mirazê delê xwe.

Mem ji xewê şiyar dibe û dinerê dîsa li zindanê ye Zînê êvarê diçe ber deve zindana Mem tê de ye. Hinara ku Qîza Beko dayê ji Mem re davêje Mem hinare digire û behsa xewa xwe dike Zîn jî jê re lava dike ku hinarê nexwe lê Mem wê guhdar nake, dibêje: Qedera me wîsa ye û ji hinarê sê çar liban dixwe. Mem piştî xwarina hinarê dimire. Zînê qerîn dike û guliyên xwe jê dike. Xebera mirina Mem ji xwşika xwe Sityê re dişîne Sityê biştî vê xebirê sê rojan şîne datîne Sityê dara şîne û hespê Mem digire diçe li ba pismamê xwe Mîr Şem ji Mîr Şem re dixwaze ku here meytê Mem ji zindanê derxe û pişt re here cem Hesên û birayên wî, ji wan re behsa tiştên bûyîne bike. Mîr Şem, girtina meytê Mem qebûl nake çûyîna cem Hesên û birayên wî dipejirîne. Kaxiza Sityê amade kirîye digre û dice çiyayê Ecem cem Hesên û barayê wî kaxiza Sityê daye wî dide Hesên. Hesên û birayên wî naseknin vedigerin Cizîra Botan. Zînê gava dibîne Hesên û birayên wî tên ji wan lava dike ku, dest nedin Mîr Ezîn, ji ber ku ew ne suçdar e, kesê suçdar Bekoyê Şeytan e. Hesên û her du birayên wî meyte Mem digrin û di erda Cizîra Botan de vedişêrin. Piştî Mem bi heft rojan, Zîn jî dimire. Meyite Zînê li teniştê gora Mem vedişêrin. Piştî ş e v e k î Zînê sê çar car tê li xewna Mîr Ezîn. Jê re dibêje, te me nas nekîr, ez dinêrim tu pir li ber xwe dikevî, ji bo kutu rastiya me bibînî, were li ser gora me. Mîr roja din diçe li ser gora Mem û Zînê. Dinêre ku destê Mem û Zînê di nav hev de ye.

Xeber dişîne ji her derî re ku kî Bekoyê Awan bikuje, ew ê gelek zêr û pere bidê. Beko piştî vê xeberê dibihîze direve, derdikeve çolê.

Rojeke baxçevanekî Beko dibîne, bi micirfa xwe li serê Beko dixê, Beko direve, gava di ber gora Mem û Zînê de derbas dibe, çipkek ji xwîna wî, dikeve navbera gora wan. Ev çil dawî dibe stire û destê Mem û Zînê ji hev dike. Baxçevan digihije Beko û wî dikuje. Piştî mirina Beko, Mîr gazî Hesen û her du birayên wî dike. Ji wan re dibêje, cilê Mem û şûrê wî li ser Bozê Rewan bikin û bişînin welatê wî Mixrîbiyan. Bila pismamê me Mîr Şem hespê wî bibe. Me derdê Mem derman nekir; nebû em xebera wî bidin malbata wî. Mîr Şem, berê xwe dide, diçe bajarê Mixrîbiyan. Gava tê bajêr, wî dibin li ba şêxê Qureşîyan . Mîr Şem kaxiza Hesen şandiye dide Emer Begê. Xelk mirina Mem dibihîze li dora mala Emer Begê dicive. Piştî Beglî û hezar û penc sed xortên kurdan, bav û dayîka Mem, her du apên wî tên. Şîneka giran datînin. Şîn sê roj dajo Piştî sê rojan Mîr Şem li Bozê Rewan siwar dibe û rêberiya Beglî û siwarên wî dike. Beglî û siwarên wî berê xwe didin Cizîra Botan. Li hêla Kaniya Qestelê singê çadîran dikutin. Mîr Şem tirba Mem û Zînê nîşanî wan dide. Beglî û leşkerên wî diçin ser tirba Memê Alan li ser tîrbê helqe girêdidin şîna xwe digirin piştî vedigerin çadîrên xwe Beglî emir dide leşkerên xwe ku dora bajêr bigirin û ji bo heyfa, tola Mem bistînin amade bin. Hesen, Çeko û Qeretacîn tên li nav Mixrîbiyan . Beglî dibînin jê re behsa Memê Alan dikin. Piştî re Mîr Ezîn tê li nav çadîrên leşkerên Mixrîbiyan, Beglî dertê pêşîya wî û wî dibe çadîrê. Beglî ji leşkerên xwe re dibêje, herin xerabikin qesr û qonaxên wan. Sê roj sê şev di nav bajarê Cizîrê de axir u dewran dibe. Leşkerên Beglî, ji bo tola Memê Alan Padîşahê Kurdan kî derdikeve pêşîya wan, dikujin. Di wan rojan de Mîr Ezîn, Mîr Şem û sê Celaliyan di çadîran de, li cem Beglî girtî dimînin. Li ser erdê bajarê Cizîra Botan xaniye bilind namîne. Bi emrê Beglî ji nav bajarê Cizîrê lşeker tev dikêşin. Piştî Beglî, izna Mîr Ezîn, Mîr Şem û her sê Celaliyan dide Bajarê xan û xerabe teslîmê wan dike. Beglî diçe li ser tirba Memê Alan û dibêje: bila dilê te eyan be Memo min tola te stand ji bêbextan. Piştî Beglî li Bozê Rewan siwar dibe û bi aliye welate Mixrîbiyan ve diçe.

2.2. Taybetmendiyên Destanên Kurdî

Her xak wekî ku êş û evîna xwe diafirîne, bi nivîsandina destanên xwe jî gelê xwe dide nasandin. Eger dilkovanî, hesret, xela, koç, mirin tune bin, ew serpêhatî nabe destan. Gelê Kurd jî wek hemû gelan xwedî mîrasekî gelêrî ye lewra xwedî êş, mirin, dîrokekê û mîrasa gelêrî ne. “Di destanan de mirov dikare hemû nexşên netewan bibîne, ji ber ku destan gencîneya bîr û baweriya gel, hest û ramanên gel, çand û hûnera gel di xwe de dihevîne.”(Abidin Parilti,2006, r.28) Di nav ve mîrasa gelerî de çîrok, çîrvanok, metelok, efsane û destan hene. Destan di nav van cureyên edebî de cihekî gîrîng digre. Di dîrokê de çandên qedîm ewil vegotinên mîtolojîk paşê jî vegotinên destanî afirandîne. Destan nîşaneyên qedîmbûna netewekê ye. Wek mînak, destana Gilgamesj ji bo vegotina edebî ya Sumeran metna herî kevnare ye. Ev jî nîşaneyên qedîmbûna neteweya Sumeran e.

Destanên Kurdî ji gelek aliyan ve taybetiya rewşa civaka Kurdî radixin pêş çavan. Her weha di destanên Kurdî de agahiyên der bareyê diroka Kurdan de jî gelek in. Destanên Kurdî bi piranî helbestkî bin jî hin jî wan bi awayê pexşankî jî tên gotin. Hin jî wan jî bi herdu awayî ne. Destanên Kurdî ji aliyê dengbêjan tên vegotin. Lewma gelek caran heman destan li gor herêman diguherin û gelek wariantên wan çê dibin. Dengbêjên Kurd di heman demê de berhevkar, parêzwan û veguhêzên destanên Kurdî ne. Destanên navdar û belavbûyî yên di nav neteweya Kurd de em dikarin weha birêz bikin; Memê Alan, Siyabend û Xecê, Kela dimdim/Xane Lepzêrîn, Derwêşê Evdî, Zembîlfiroş, Ker û Kulik, Binefşa Narin, Ristemê Zal, Evdalê Zeynikê, Filîtê Quto, Stî û Ferxê û wd.

Li gorî naverokên xwe destanên Kurdî ji du beşên sereke pêk tên: Destanên Qehremanî: Mînak; Derwêşê Evdî, Filîtê Quto û wd. Destanên evînî û dildarî: Mînak; Memê Alan, Siyabênd û Xecê, Zembîlfroş wd.

Destanên Kurdî bi devkî dihatin icrakirin ji destê nivîskaran ve direng hatine berhev kirin lê ev nebû sedem ku ev destan wînda bibin. Destanên Kurdan tu caran dînamîzma xwe wînda nekirîne. Ji ber ku çanda dengbêjiyê destanên Kurdan parastiyê. Destanên Kurdî dema peşîn bi destê dengbêjan ji heremekê

dest pê dikirin, her ku dem li ser dibuhurî li hemû heremên welat belav dibûn û ji aîdiyeta heremekê derdiket; dibû gencîneya hemû civaka Kurd.

Ji bo destanen Kurdî xaleke girîng a din jî ew e ku dengbêjan di dîwanxaneyên mîr û began de destanên xwe vedigotin ji ber ku ev dengbêj, dengbêjên mîr û began bûn helbet caran bandora mîr u began jî li ser destanan û dengbêjan çedibûn. Lewma em dikarin bibêjin ku destan bi destê dengbêjan dihat îcrakirin û patronajek jî li ser dengbêjan hebû

“Di destanen kurdî de lehengên derasayî jî zêde zêde cîh digirin. Em bûyerên derasayî, kesayetên derasayî û rojên derasayî an jî balkêş dikarin di bin serenava “derasayî” de binirxînin wek mînak; Destana Xecê û Siyabend ji serî heya binî bi mijar û lehengên derasayî ve hatine hûnandin. Hemandemê de Destana Memê Alan di Destana Memê Alan de ajalekî derasayî heye. Ew ji hespê Mem: Bozê Rewan e. Bozê Rewan di hin taybetmendiyên xwe de eşkere dike ku heywanekî, ajalekî derasayî ye. Wexta ku torvan diçin behrê tiştêkî giran dikeve torên wan û kes nikarê vê torê û heywanê giran bikişîne. Heya ku xeber diçe Mem. Memê Alan jî hezar û pêncsed xortên xwe dişîne û hespê Bozê Rewan ji behrê derdixin.” (Lescot, 2010).

Mem bi xwe jî di destanê de şexsekî, kesekî derasayî ye. Tiştên awarte, bûyerên awarte tîr serê wî. Wexta ku em li destanê dînerin em mînakên vê motîfê dibînin. “Wexta ku agir bi xaniyê her sê birayan (Hesen Çeko, Qeretacîn) dikeve kes nikare xwe nêzî malê bike. Kurê Hesen, Celal jî di nav agir de ye. Kesî ku wî xilas bikê tûne ye. Le belê Mem li agir na nêre xwe dixê nav agir de û diçe kurê Hesen, Celal li nav agir de derdixê û xilas dike.”(Lescot, 2010)

Wexta ku Beko çu anî û Mem bi van dêl û mûya girêda hema wê kêlikê Mem li wir de hişk bû. Di ber vê yekê ji ev bûyer bûyereke derasayî ye. Ji bilî van agahiyan jî hin kesên ku ji bilî Mem derasayî bin jî hene ev jî in:

- a) Dewrêşê Evdî
- b) Rustemê Zal
- c) Mîr Mihê (Mîrza Mihemed)

2.3. Xebat û Çavkaniyên Li Ser Destana Memê Alan

Armanca vê beşê tespîtkirina xebat û lêkolînên ku li ser destana Memê Alan e. Me vê beşê de tez û gotarên li ser destanan hatine nivîsandin ji xwe re wek çavkaniyekê girt. Em ê Xebat û çavkaniyan wek xebatên bi destê biyaniyan û xebatên bi destê Kurdan ji hev veqetînin. Xebatên li ser destanan di sed sala XIX. de bi berhevkirina destana “Kalavelayê” dest pê kirine. Zanyarê Fînî, Ellias Lönnrot, dest bi berhevkirina destana Fînîyan kir û ev destan a bi navê “Kalavela” di 1836an paşê jî 1849 an de jî halê destanê ya dawiyê weşand. Piştî vê xebatê, bingeha Ekola Fînî ya Dîrokî û Erdnigarî hate danîn û ev ekole ji bo merakdarên foklorê bû xaçereyek. Xebatên li ser destana Kalavelayê bala gelên din jî kişand, zanyarên welatên din jî dest bi lêkolîn û berhevkirina destanan kirin. Hemandemê de gelek merakdar û zanyaran jî berhevkirin û lêkolîna destanên ku ne ji welatên wan kirin.

Kurdan gelek xizmeta foklora Kurdî û piranî jî xizmeta destanên Kurdan kiriye lê xebat û lêkolînên li ser Destana Memê Alan piranî ji aliyê biyaniyan ve hatine kirin.

2.3. 1. Xebatên ku ji Aliyê Biyaniyan ve Hatine Kirin

1945an de li Fransayê kursiya kurdolojiyê ava dibe. Roger Lescot dibe serokê vê kursiyê. Gelek xebatên wî yên hêja û giranbuha di derbareyê ziman û folklorê Kurdî de hene. Roger Lescot di xebata xwe ya bi navê: “Textes Kourdes” (Tekstên Kurdî) a li Parîs-Beyrutê di 1940-1942an de çap bûye de cih dide destanên Kurdî. Di beşekê vê xebatê de behsa destanên Kurdî kiriye. Memê Alan a ku Roger Lescot berhev kiriye, ji aliyê weşanxaneyê Orfeusê ve di sala 1996an de li Stenbolê çap bûye. Me jî xebata Roger Lescot ji xwe re wek bingeh û çavkanî girt.

Pertev Nali Boratav li Tirkiyeyê Memê Alan wekî destanên Kurdî bi nav dîke û di xebatên xwe de behsa vê destanê dîke

Prof. Albert von Le Coq jî rojhilatnasekî Alman e. Di sala 1903yan de bi navê: “Kurdische Texte” (Tekstên Kurdî) xebateke li ser folklorê Kurdî li Berlînê çap kiriye. Di vê xebatê de cih daye Destanên Memê Alan.

Prof. Albert Socin li ser ziman û folklorê Kurdî xebat û lêkolînên girîng kirine. Prof. Albert Socin û Eugen Prym bi hev re li ser folklorê Kurdî xebateke amade kirine û 1887, 1890an de li Petersburgê bi navê: “Kurdische Sammlungen. Erzählungen und Lieder in den Dialekten des Tûr Abdin und von Bohtan”(Alakom, 1991:36) çap kirine. Di vê xebatê de çend destanên Kurdî hene Memê Alan, jî yek ji van destanane.

Hugo Makas gelek xebatên hêja li ser ziman û folklorê Kurdan kiriye. Di sala 1926an de Destana Memê Alan ji nû ve çap dike. Ev xebat di sala 1936an de ji aliyê Ermenîyan ve, digel sê varyantên cuda hatiye wergerandin bo zimanê Ermenî û Ingîlîzî û li Ermenîstanê hatiye çap kirin.

Oskar Mann serê sed sala XX. de li Almanya'yê di warê Kurdolojiyê de lêkolînên girîng krîne. Mann li ser Mem û Zîn ê jî xebitiye.

Minorsky di pirtûka xwe ya bi navê ”Kurd û Kurdistan” de bi sernavê Folklor û Edebiyat de bi berfirehî cih dide bibliografya folklorê Kurdî. Di rûpela 172an de bigelempêrî behsa destanên Kurdî dike û bibliografiyake taybet a dervî xebatên Mann, Socin û Cindî dide. Destanên Kurdî yên mîna Memê Alan, Zembilfiroş, Siyabend û Xecê û Manica û Bijan wekî destanên pastoral ên mîna Dimdim, Ristemê Zal jî wekî destanên dîrokî binav dike. Di rûpelên 182-187an de jî cih dide xebatên ji aliyê Kurdan ve hatine kirin. (Minorsky,2004).

Wadie Jwaideh di pirtûka xwe ya bi navê “Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi Kökenleri Ve Gelişimi” (Jwaideh, 2004) de bi sernavê Edebiyat de agahiyên kurt di der bareyê taybetmendiyên folklorê Kurdan dide. Di vê beşê de behsa destanên Kurdan ên wekî Memê Alan, Dimdim dike.

Basil Nikitine di pirtûka xwe ya bi navê “Kurtler” hin beş ji folklorê Kurdî re veqetandine. Ev beş bi sernavên: “Baweriyên Batil û Folklorê Kurdan” in. Di van beşan de bi awayekî berfireh behsa kevneşopî, adet, bawerî, motîf û berhemên gelerî,

koleksiyonên derbarê folklorê Kurdî, pêvajoyê û bandora xebatên Sovyetê dike. Di beşekê de jî folklorê Kurdan û neteweyên din dide ber hev. Di van beşan de li ser destanên Kurdî yê wekî Mem û Zîn, Ker û Kulîlk radiweste. Di derbarê xebat û çavkaniyên wan de agahiyên girîng dide. Bigelempêrî li ser pêvajoyê xebatên Sovyeta Berê disekine. Nikitin gelek çarvan behsa dewlemendiya folklorê Kurdan dike, dibêje ku bi awayekî rapirî dewlemendiya folklorê Kurdî bala zanyarên biyanî kişandiye ser folklorê Kurdan. (Nikitine,2010).

Mehrdad R. Izady di pirtûka xwe ya bi navê: “Bir El Kitabî Kürtler ” de bi awayekî berfireh çavkaniyên folklorê Kurdî dike. Di nav wan de destanên Kurdî jî çavkaniyên xwe digire. Izady destana Memê Alan wekî dramaya epîk bi navê dike û destanên Dimdim û Memê Alan û Gilgamêş jî aliyê naverokê ve dide ber hev. (Izady,2004).

2.3. 2. Xebatên ku ji Aliyê Kurdan ve Hatine Kirin

Mirov dikare bibêje ku sedsala nozdehan di dîroka Kurdan de sedsala Kurdnasiyê ye. Di vê sedsalê de Kurdnasî an jî Kurdology gihiştibû asta xwe ya herî bilind. Ji aliyê Kurdan ve cara pêşîn xebatên li ser folklorê Kurdan ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî bi rêberiya Aleksandre Jaba di 1860an de dest pê dike. Jaba bi alîkariya Mele Mehmûd û çend kesên din derbareyê Kurdan de gelek xebatan dike ev xebatene wek Koleksiyona Jaba jî tê naskirin. Bi xîreta Jaba û xebatê Mela du berhemên gewre jî bi destê Mela Mehmûd tên nivîsîn yek ji van xebatan: “Camîyê Rîsale û Hikayetê Ekradiyê” ye Di vê xebatê de mesneviya Mem û Zînê heye û bi sexmereta vê mesneviyê bexsê Destana Memê Alan jî tê kirin. Li ser jiyana Bazîdî zêde agahî li destê me de nînin. Bi her halî gelek lêkolîner dibêjin navbera salên 1797 - 1799an de jiyaye

Kurdên Qafqasyayê di warê folklorê Kurdî, nemaze destanê Kurdî de gelek xebatên hêja kirine û di vî warî de gelek berhem nivîsîne. Heciyê Cindî û Emînê Evdal di sala 1936an de beşek ji meteryalên berhevkirî bi navê: “Foklorê Kurmanca” pirtûkeke berfireh amade kirin û di heman salê de li Erîvanê çap kirin. Di vê xebatê de çavkaniyên gelek varyantên Memê Alan.

Di sala 1956an de Cindî careke din bi navê “Folklor Kurmanciyê” pirtûkeke din çap dike ku ev berdevama xebata 1936an ne. Di vê berhemê de jî destanên mîna Mem û Zîn, Dimdim hene. (Cindî,1936: 10).

Qanatê Kurdo di 1966an de 12 waryantên Memê Alan bi navê “Mem û Zîn 12 Varyant” di nav weşanên Roja Nû de weşand.

Cindî li Moskovayê di sala 1962an de berehevoka “Beyt- Serhatiyên Kurdî yên Êpîkî” çap dike. Di vê berhemê de destanên gelêrî yên navdar wekî Xecê û Siyabend, Ker û Kulik, Memê Alan hene. (Cindî,1936)

Di Sala 1978an de Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl xebata xwe “Zargotina Kurdî” li Moskovayê çap dikan. Di vê xebatê de gelek destanên Kurdî jî hene. Di berga yekemîn de bi sernavê “Poeziya Epîkî” destanên wekî Memê Alan, Zembilfiroş, Siyabend û Xecê, Sêva Heco, Binevşa Narîn, Stî û Ferxî û hwd. digel waryantên xwe cih digire

Omer Marûf Berzencî di sala 1978an de bi sernavê “Lêkolînewe û Bîbliografyay Çîrokî Kurdî” xebateke berfireh amade kir û li Bexdayê çap kir. Ev xebat yekem ji xebatên tematîkî yên di vî warî de ye. Vê xebatê de derbarê destana Memê Alan de agahiyan dide.

Nûredîn Zaza di sala 1957an de berhevoka Lescot û Celadet Bedirxan ji aliyê ziman ve di ber çavan re derbas kir û li Şamê çap kir. Destana Memê Alan li Tirkîyeyê cara pêşî di sala 1978an de ji aliyê weşanên “Özgürlük Yolu” ve li gorî xebata Nûredîn Zaza ve ji nû ve hatiye çapkirin.

Celadet Alî Bedirxan û Kamuran Bedirxan di “Hawar” (1932-1943), “Ronahî” (1942-1945), “Roja Nû” (1943-1946) û pêveka wê “Stêr” ê de gelek caran bexsê Destana Memê Alan kirine.

Rohat Alakom di pirtûka xwe ya bi navê “Kurdoloji Biliminin 200 Yillik Geçmişi” (1787-1987) de dibêje ku destana Memê Alan cara pêşî li Tirkîyeyê bi zimanê tirkî ji aliyê Kemal Burkay hatiye nivîsandin.

Ramazan Perteve di pirtûka xwe ya bi navê “Zarok û Çîrok-Destpêka Pedagojiya Kurdî” de bi awayekî pedagojîk li ser destana Memê Alan sekiniye. (Perteve, 2008: 21).

Reşo Zîlan û Serdar Roşan bi navê “Destanên Kurdî” heft destanên navdar ên Kurdî li Stockholmê di 1996an de dane çapkirin. Li nav van heft destanan de Destana Memê Alan jî heye.

Prof. Qedrî Yıldırım di xebata xwe ya bi navê “Mem û Zîn” de hin agahiyên girîng ên derbareyê destana Memê Alan dide. Di vê xebatê de Yıldırım 12 waryantên destana Memê Alan û Mem û Zîna Ehmedê Xanî li gorî çend hêmanan dide ber hev. (Yıldırım, 2010: 40).

Rıza Çolpan di xebata xwe ya bi navê “Destana Dîroka Kurd û Kurdistan” de cih dide çar destanên Kurdî. Ev destan Ristemê Zal, Memê Alan, Kela Dimdim û Kawayê Hesinkar in. Ev pirtûk di 1995an de li Sidneyê tê weşandin.

3.BEŞA SÊYEM

LÎ GORÎ ÎNDEKSA THOMPSON TASNÎFKIRINA MOTÎFÊN DI DESTANA MEMÊ ALAN DE

3.1. Îndeksa Motîfên Edebiyata Gelêrî ya ku Stith Thompson

Di vê beşê de em ê li ser tasnîfkirina motîfên Destana Memê Alan dê bisekinin. Bêjeya motîfê ji bêjeya motîvuma Latîni tê. Stith Thompson di bin 23 serenavan de motîf berhev kirîne. Temenê xwe di vî warî de derbas kiriye û di vê qadê de 6 berg pirtûkên wî hene. Thomsen dibêje: “Motîf ew tişte ku parçeyên çîrokê yên ku ji demên kevnare ve ye derfetê jiyane dîtine.” (Sakaoğlu 2002:159). Em gelek caran destanên Kurdan de rastî motîfan tên lê Destana Memê Alan de zêdetir motîfên mîtolojîk hene.

Di destana folklorîk a Memê Alan de hatina dinyayê ya Mem motîfek e. Ew li nav şertên derasayî de hatiye dinyayê. Di xewnê de rasthatina wî û Zînê motîfeke. Dest li her tiştî berdan û bi dû Zînê ketin, motîfek e. Ketina wî ya zindanê motîfek e. Di zindanê de mirina wî motîfek e. Bi vî rengî em dikarin bi dehan motîfên ku destanê de derbas dibin rêz bikin. Eger em destanê ji van motîfan safî bikin ji bilî hin qalibên vegotinê de li meydana tiştêk namîne. Hingê em dikarin bi rehetî bibêjin ku wekî ku lêkolîner Veselovsky jî gotiye: “Çîrok bi xwe ji hatina cem hev a watedar a motîfan pêk tê.” (Pertev, 2014).

Stith THOMPSON Motîfên Edebiyata Gelêrî di bin 23 serenavan de tesbît kiriye îndexa Thompson vusa ye:

3.1.1. Motîfên Mîtolojîk

3.1.2. Motîfên Ajalan

3.1.3. Qedexe

3.1.4. Sehr

3.1.5. Mirin

3.1.6. Derasayî

3.1.7. Motîfên Dêwan

3.1.8. Ezmûn

- 3.1.9. Biaqil û bêaqil
- 3.1.10. Xapandin
- 3.1.11. Berovajîbûna Çarenûsê
- 3.1.12. Tayinkirina Dahatûyê
- 3.1.13. Siûd û Bext
- 3.1.14. Civak
- 3.1.15. Ceza
- 3.1.16. Esaret û Firarîbûn
- 3.1.17. Zordariyên Neasayî
- 3.1.18. Zayend
- 3.1.19. Sirûştta Jiyanê
- 3.1.20. Dîn
- 3.1.21. Taybentmendiyên Karakterî
- 3.1.22. Pêkenî/Mîzah
- 3.1.23. Komên Curbicur

3.2. Motîfên ku Destana Memê Alan de Derbaz Dibin

3.2.1. Di Destana Memê Alan de Motîfa Kesayetên Derasayî

Derasayî wateya wê tê tiştên awarte ango balkêş. Em bûyerên derasayî (awarte), kesayetên derasayî û rojên derasayî an jî balkêş dikarin di bin serenava “derasayî” de binirxînin.

Mem di destanê de şexsekî, kesekî derasayî ye. Tiştên awarte, bûyerên awarte tîr serê wî. Wexta ku em li destanê dînerin em mînakên vê motîfê dibînin.

Mînak: Wexta ku agir bi xaniyê her sê birayan (Hesen Çeko, Qeretacîn) dikeve kes nikare xwe nêzî malê bike. Kurê Hesen, Celal jî di nav agir de ye. Kesî ku wî xilas bike tûne ye. Lê belê Mem li agir nanêrê xwe dixê nav agir de û diçe kurê Hesen: Celal li nav agir de derdixê û xilas dike. (Lescot, 2010),

Mînak: Wexta ku Mem û Mîr kişikê (Setranc) dileyîzin, Mem di vê lîstikê de tîk diçe. Di destpêka lîstikê de Mîr ev gotî bûn:

“Şertê min ev e, yek e, sivik e:

“heçi şikest xwe bispêre lêvak û belengazê min

“Ewê pê re bi kêfa xwe, henek û yarîkê bike.”

Memî ji got:

“Li ser sera, ezbenî hêr çî emr û fermana Mîrê Botan e.” (Lescot, 2010: 137).

Ji ber ve şert û mercê jorê ji Mem, dikeve nav destên Bekoyê Awan û Beko ji gîhişt armanca xwe. Beko jî rabû bi werîsan Mem girêda hema Mem xwe tev da werîs pîç û parî bû. Bekoyê Awan rabû zîncîrek anî Mem girêda dîsa ji feyde nekir. Beko rabû pihêt anî dîsa nebû. Talî Mem got: “Kuro here stewlê çend mû ji dêl û bijîya Boz bîne.” (Lescot, 2010: 137).

Wexta ku Beko çu anî û Mem bi van dêl û mûya girêda hema wê kêlikê Mem li wir de hişk bû. Di ber vê yekê ji ev bûyer bûyereke derasayî ye. Ji bilî van agahiyên jî destanên Kurdan de hin kesên ku ji bilî Mem derasayî bin jî hene ew jî ev in:

- a) Dewrêşê Evdî
- b) Rustemê Zal
- c) Mîr Mihê (Mîrza Mihemed)
- d) Siyabendê Silivî

3.2.2. Di Destana Memê Alan de Motîfa Ajalên Derasayî-Alîkar

Di Destana Memê Alan de ajalekî derasayî heye. Ew ji hespê Memê Alan Bozê Rewan e. Bozê Rewan di hin taybetmendiyên xwe de eşkere dike ku, ajalekî derasayî ye.

Mînak: Wexta ku torvan diçin behrê tiştê giran dikeve torên wan û kes nikarê vê torê û heywanê giran bikişîne. Heya ku xeber diçe Mem. Memê Alan jî

hezar û pênc sed xortên xwe dişîne û hespê Bozê Rewan ji behrê derdixin. (Lescot, 2010).

Ji bilî vê mînakê jî hin teybetmendiyên Bozê Rewan hene ku, riya şeş meha panzdeh rojan de diqedîne. Bê nan û bê av bi rojan dikare îdare bike.

Motîfên ajalên derasayî tenê ne taybetmendiyeke Destana Memê Alan e. Ji bilî vê destanê di hin Çîrokên din de, di hin destanên din de jî ajalên derasayî hene. Wek mînak: Destana Siyabend û Xecê de Siyaben xwedî hespeke bêhempa ye. Navê hespê Siyabend “Daybilqîran”e. Destana Dewrêşê Evdî de jî motîfa hespê derdikeve pêşiya me. Vê destanê de hesp wek motîfeke sereke derdikeve pêşiya me Dewrêş gelek caran bi navê hespê xwe tê gazîkirin. Navê hespê Dewrêş “Hedban” e û Dewrêşê Evdî di destanê de wek “Siwarê Hedbanê” tê taswîr kirin “Siwarê Hedbanê” gelek cîhên destana Dewrêşê Evdî tê dubare kirin. Destana Dewrêşê Evdî de hesp ew kas derdikeve pêş ku di qada şer de dijmin dema ku Hedbanê dibîne acêbmayî dimîne û fêma dike ku heya Hedban nekeve Dewrêş jî nakeve dawiya dawiyê dijmin berê hespê Dewrêş hedban bi hîlebazyê dixin erdî û piştê Dewrêş dikujin. Ne tenê destan û çîrokên kurdan de gelek destan, gotin û çîrokên cîhanê de jî ajalên derasayî cîheke girîng digirin wek mînak:

- a) Teyrê Sîmurg
- b) Anka
- c) Hûma
- d) Deybilkiran (Siyabend û Xecê)
- e) Duldul (Hz. Alî)
- f) Şahmaran (Şahê Maran)
- g) Rexşê Belek (Rustemê Zal)
- h) Hedban (Dewrêşê Evdî)

3.2.3.Di Destana Memê Alan de Motîfên Mîtolojîk

Mît efrîneriya cîhanê destpêka mirovahiyê bi şeweyeke çîrokî vedibêje. Di demên antîk de ji bo ku mirov jiyana xwe watedar bike û wateyekê bide cîhanê serî li çend gotin û tekstan dikir ev tekst tekstên mîtî bûn. Mît destpêka tiştên xwezayî û nexwezayî ji xwe re dike mijar. Bi kurtasî em dikarin bibêjin ku mît çîroka afirîneriyê ye. Li gor van gotinan em dikarin bibêjin ku Dastana Memê Alan de motîfên mitolojîk cîheke mezin digirin.

Sterbano, Heyvbano, Tavbano ev her sê pêriyen ku nava destanê de navên wan derbas dibin motîfên mîtolojîk in û di heman demê de motîfên derasayî ne. Heman demê de Bozê Revan jî ajaleke mîtolojîk e ji ber ku tu ferqa Pegasus mîtên Yunanan û Bozê Revan nîne.

Mînak : Ên ku Zîna Zêden ji bajarê Cîzîrê tînin bajarê Mixribiyane ev her sê. Perî ne. Bi saya wan Memê Alan û Zîna Zêden hevdu nas dikin û evîntiya wa destpê dike. (Lescot, 2010: 41-44). Ji bilî van mînanan ji ev her sê perî dikarin bikevin şeklên cûda ji. Wek şeklên kewa. Ev jî nîşa dide ku ev bûyer bûyerên awarte û derasayî ne. Heman demê de Bozê Revan jî ajaleke mîtolojîk e ji ber ku tu ferqa Pegasus mîtên Yunanan û Bozê Revan nîne.

3.2.4.Di Destana Memê Alan de Motîfofa Hevaltiyê û Xoce Xizir

Em dikarin bibêjin ku destana Memê Alan li nav destnên kurdan de ji bo vê motîfe destana herî ber bi çav e. Mem dibe mêvanê Celaliyan û bi wan re hevaltiyê datîne. Piştî havalitiya Mem û Celaliyan, Celalî li cem Mem li ber hemû zordestan û zoriyan disekin. Her wiha Mem ne tevgereke baş jî be hej destgirîya Çekoyê Celalî dike lê Celalî cardî jî dest havalitiya Mem bernadin. Li ber Mîr Ezîn û temamiya bajarê Cîzîrê radibin lê dîsa jî dest hevaltîya Mem bernadin. Hetta ev havalitiye derdikeve astek wîsa ku Hesên dest ji jina xwe Stî jî berdide û dibêje: “Heke evîndara te Stî be ew jî ji bila ji te re helal bibe.” Hesên hevlekî ewqas dilsoz e ku da ku Mem nekeve destê Mîr Ezîn qonxa xwe dişewitîne û kurê xwe davêje li nav agir.

Bilî hevalên li jor me bexs jê kirîne Xoce Xizir jî di destana Memê Alan de wek hevaleke alîkar derdikeve pêşiya me. Xoce Xizir di gelek destanan de, çîrokan de cîh digire. Dî destanan de, çîrokan de, kî bikeve astengiyê de digihije hewarên wan. Çî astengî û zor û zehmetfîyên wan hebe çareser dike. Birastî jî di nava gel de jî bîr û baweriyeke bî vî rengî heye. Ji ber ku Xoce Xizir di gihije hawara Mem û çend lehengên din ê destanê em dikari Xoce Xizir wek lehengeke alîkar bibînin.

a) Xoce Xizir nesîhetan Elî Beg, Emer Beg û Elmas Beg re dike. Dibêje: “Qencyê bi gelê xwe re bikin. Xîzanan, feqîran têr bikin wana bi libas bikin.” Dawiyê dibêje Elî Beg: “Here Qîza Mîr Qureyşiyana bizwaze û dê Mîr jî qîza xwe bidê te. Wexta ku hûn zewicîn û zarokêkî we çêbu nav lê nekin heya ku ez werim. Li benda min bi sekinin.” (Lescot, 2010)

b) Wexta ku Mem ji bajarê Mixribê diçe bajarê Cizîrê rê de rasta Xoce Xizir tê ango ev motîf disa xwe nîşan dide. Xoce Xizir ji nesîhetan, şîretan li Mem dike û di hîn mijaran de Mem hişyar dike.

3.2.5. Di Destana Memê Alan de Motîfa Hileyê, Xapandinê

Ev motîf, motîfeke pir aktîf e. Di destanan de, çîrokan de gelek caran derbas dibe. Bi teybetî jî Destana Memê Alan de. Ji ber ku di vê destanê de lehengekî wekî Bekoyê Awan heyê, gelek cîhan ev motîfe derdikeve pêşiya me.

Mem ji ber ku neçê şer şûr li lingê xwe dide û birîneke mezin di lingê xwe de vedike. Piştî vê bûyerê ji Hesên diçe ba Mîr hal û rewşa Mem ji Mîr re dibêje. Wexta ku Mîr jî ji birîna Mem agahder dibe mûsade dide Mem ku neyê şer. Birastî jî şer bi xwe ji nîne ji ber ku ev jî xapandina Bekoyê Awan e. (Lescot, 2010).

Memê Alan wexta ku xwe şer xilas dike berê xwe dide bajarê Cizîrê. Çawa digihîje Cizîre berê xwe dide Zîna Zedan. Evîn û hesreta dilê xwe, ev her du evîndar ji hev re parve dikin. Bekoyê Awan haya wî ji her tiştî heye û dizane ku Mem çû ba Zîn. Diçe ji Mîr re her tiştî dibêje. Mîr jî tê Cizîrê û Mem di mala xwe de dibîne. Hema wê kêlîkê jî Mem ji ber ku derewa wî dernekevê holê dibêje, Mîrê min birîna min pir giran bû ez ê biçim Birca Belek birîna xwe derman bikim. Lê belê ez şaşitî hatim vêderê. Wexta ku wîsa dibêjê xwe xilas dike. (Lescot, 2010).

Keça Beko diçe ba Zîna Zedan dibêje: “Ez hal û rewşa Mem hesiya me. Birastî jî dilê min pir xemgîn bû ye ji ber vê yekê jî min ji Mem re ev hinar aniye. Wexta ku Mem ev hinar xwar ê baş bibe.” (Lescot, 2010). Zîna Zedan jî bawer dike. Helbu kî ew hinarî hinare ke bi jehr ê, nava wê tijî jehr e. Piştî jî Mem vê hinarê dixwe û dimire.

Wexta ku Memê Alan û Mîrê Cizîra Botan santranc dileyizin Bekoyê Awan dîsa xapa li Memê Alan dike. Di destpêka lîstikê de Memê Alan têk dibe. Beko wexta dibîne Mîr hêdî hêdî acîz dibe Beko jî dikeve nava hevildaneke qirêj. Ferq dike ku Zîna Zedan jî lîstikê temaşe dike. Wê çaxê xapek tê bîra Bekoyê Awan. Piştî Memê Alan li Zînê ye. Bekoyê Awan difikire dibêje eger Mem cihê xwe bigûherîne û Zîna Zedan di pacê de bibîne wî çaxî ji hişê Mem ê serî wî here û Mîr jî dê ve lîstikê ji Mem bibe. Bi vî awayî plana xwe bi cîh tîne û Mem û Mîr cihê xwe diguherînin. Wexta ku çavê Mem li Zîna Zêden ket hema wê kêlikê ji Mem hişê wî serê wî diçe, lîstikê de jî tek diçe.

Jî bili van gotinên jorî jî gelek motîfên xapandinê di vê destanê de hene.

3.2.6. Di Destana Memê Alan de Motîfa Jahrê

Di destana Memê Alan de ev motîf derbas dibe. Wexta ku keça Bekoyê Awan diçe ba Zîna Zeden hinarekî didê Zînê. Di bejê: “Zîna Zeden hayamin ji her tiştî re heye Mem nexweş e. Ez dê hinarekî bidim te tu jî bide Mem. Eger Mem vê hinarê bixwe ê baş bibe.” Zîna Zeden jî bawer dike û hinarê dide Mem û Mem jî dimirê. Ji ber ku keça Beko jahr xistî bû li nava hinarê Mem mir. Hinara bi jahr mirina Mem anî. (Lescot, 2010).

3.2.7. Di Destana Memê Alan de Motîfa Gustîlkê

Ev motîfên ku me tesbit kirine bi giştî di hemû destan û çîrokên Kurdî de derbas dibin. Yek ji van motîfan jî “Gustîlk” e. Di Destana Memê Alan de ev motîf bi wî awayî derbas dibe:

Wexta ku her sê perî (Stêrbano, Heyvbano, Tavbano) Zîna Zedan di şevêkî de li Bajarê Cizîrê tînin bajarê Mixribê ba padîşahê Kurd Memê Alan her du ji dil dikevîn hev du de. Hev du nas dikin û evîn dilên van de şîn dibe. Wexta ku radizin û dikevîn xewa şevê de ev her sê perî Zîne tînin bajarê Cizîr e. Piştî ji wexta Zîna Zedan sibehê şiyar dibe xwe bi xwe dibeje ev tiştê şevê xevnek bû, ne rast bû lê belê tê bîra wê ku wê û Mem gustîlken xwe pev gûharandibûn. Li têlîya xwe dinêre ku gustîlka Memê Alan heye û muhra wî jî heye. Bi vî awayî jî tê serê Memê Alan jî. (Lescot, 2010). Di wir de jî giringiya motîfen gustîlkê disa derdikeve holê.

3.2.8. Di Destana Memê Alan de Motîfa Dûndetîyê

Ev motîf motîfeke girîng e. Ji ber ku gelek destan û çîrokên Kurdî de derbas dibin. Bi giştî jî axa, beg, mîr, padîşah taybetmendiya dundetiye di xwe de dihevin. Di destana Memê Alan de jî bi vî rengî ye.

Di Destana Memê Alan de qala vê motîfê tê kirin. Zarokên bavê Mem(Elî Beg) tûne ne. Wexta ku Xoce Xizir dibêje here qîza Mîrê Qureyşîya ji xwe re bixwaze ê zarokên te çêbibin. Piştî vê bûyere. Mem tê dinê. Mem tenê ye ne birayên wî ne jî xwişkên wî hene.

3.2.9. Di Destana Memê Alan de Motîfa Evînê

. Destana Memê Alan de motîfa evînê bi hemû şiklan derbaz dibe lê vê destanê de evîna lehengan evîneke trajîk e. Em dikarin bibêjin ku Destana Memê alan de motîfa sereke evîn e. Di Destana Mem Alan de evîntî bi saya periyên çê dibe. Di şevêke tarî de bi riya dîtinê evîna wan destpê dike. Hin destanên din hene ku evîntî bi çî awayî destpê kiriye em ê ji were binivîsin.

- a) Bi riya dîtinê: Dewrêşê Evdî, Zembîlfiroş, Siyabend û Xecê
- b) Bi riya resm û neqşan: Vamik û Azra
- c) Ji zarokatiyê de: Leyla û Mecnûn

Çobanoğlu dibêje: “Di çîrokên gelêrî de zarokên ku tene dinê bi awayakî xweşik perwerdehî dibînin. Dema ku digihîjin çaxa mêraniyê dest bi nêçîrwaniyê û

perwerdehiyê dîkin piştî van serpehatiyên evînê dest pê dike. Di çîrokên gelêrî de evîn bi awayên cur be cur çêdibe. Di hin çîrokan de lehengên sereke bi evîn dara xwe re di nav qesrekî, konekê an jî malekî de mezin dibin. (Çobanoğlu, 1998:172). Destana Memê Alan de lehengên destanê heman malê ,qesrê mezin nabin lê leheng qesrekê hewdu dibînin û gustîlên xwe diguherin

Motîfa evînê gelek destanên, çîrokên Kurdan de motîfa sereke ye “Xanoyê Çengzêrîn” evîndarê ax û welatê xwe ye. “Cembelî” evîndarê keçîkeke pak û bedew e. “Zembîlfiroş” evîndarê cemala xwedê ye. “Dewrêş” evîndarê Edûla bedew e.

3.2.10. Di Destana Memê Alan de Motîfa Qedexê û Ceza yê

Di destanan de pir caran leheng tîne ceza kirin. Di Destana Memê Alan de wexta ku Mem di listika santrancê de li hemberî Mîr tîk diçe Mîr jî wî dixwe yarî û henekên Beko. Beko jî Mem bi mûyê Bozê Rewan girê dide û dixwe şikeftê de. Dawiyê de Mem li şikeftê de dimire. (Lescot, 2010).

Di destanên Kurdî de lehengên sereke bi piranî rastî zext û zordariyan tîne. Leheng piranî an mişextekirin an kuştin an jî zindanê ve tîne ceza kirin. Destana Memê Alan de Mem berê dikeve zindanê paşê jî dimire. Di destana Cembelîyê Kurê Mîrê Hekariyan de jî piştî ku Binefş ji hêla Dewrêş Axa ve bi darê zorê tê revandin Cembelî diçe çend sala şivanetiya Dewrêş Axa dike. Heman motîf di Destana Dewrêşê Evdî de jî heye. Dema ku Zor Temir Paşa dibihîze ku Dewrêş keça wî dixwaze di bêje ku ez ê Dewrêş bikujim. Dewrêş vê yekê dibihîse û diçe çiyayê Şengalê. Dewrêş û Şerqî çend salan li wir mişeqteyî dimînin

3.2.11. Di Destana Memê Alan de Motîfa Ezmûnê

. Di Destana Memê Alan de ev motîf heye. Mem û Mîr santrancê dileyizin. Destpêka listikê de dibêjin kî tîk herê ew dê bibe yarî û henekên xulamên me. Piştî pejiwandina vî şertî dest bi listikê dîkin û Mîr, Mem tîk dibe. Mem jî dibe yarî û henekên Bekoyê Awan. (Lescot, 2010).

Di Destana Memê alan de Mîr Ezîn şertê setrencê davêje li ber Memê Alan, di Destana Cembeliyê Kurê Mîrê Hekariyan de bavê Binefşê da ku keça xwe nede biraziyê xwe Ehmed, şertek davêje li ber Ehmed û dibêje: “Heke tu hespê şêxê ezdiyan Şêx Xelef Qulê bînî ez ê keça xwe Binefşê bidim te.” Destana Kerr û Kulîk de Emer axa keça xwe Perîxanê davêje mazatê û dibêje: “Kî biçê hespê axayê Ereban Bilîcanê ji min re bîne, ez ê keça xwe bidim wî.” Piştî Kulîkê Silêman vê şertê qebûl dike. Di destana Dewrêşê Evdî de ji Zor Temir Paşa di bêje: “Kî serdariya eşîra Mîlan bike ezê keça xwe Edûlê bidime wî.”

Wek me li jor jî nîşanda destanên Kurdan de ezmûn wek motîfeke serekeye. Hemû destanan de bûyer bi ezmûnan tên hunandin. Ezmûn destanên Kurdan de wek kronotopekê ye.

3.2.12. Di Destana Memê Alan de Motîfa Qasîdî / Peyamgûhezî

Di destan û çîrokan de qasîdî wek yê ku xeberekî cihekî xeberê bibê cihekî dinê. Mebest ji qasîdê carîna mirov in, carîna kevok in û carîna jî destmal in. Ev motîf, motîfeke dewlemend e. Destan û çîrokan de pir derbas dibe.

a) Destana Memê Alan de ev motîf derbas dibe. Wexta ku Mem davêjin zîndanê Sitî jî vê bûyerê hayîdar dibe. Ji ber ku heya Hesên jî ji vê bûyerê de hebe Mîr Şem wezîfedar dike û ji Mîr Şem re dibêje li Bozê Rewan siwar bibe û xebra Mem bigihîjîne Hesên û bila werê Mem ji vê rewşê rizgar bike. (Lescot, 2010).

b) Mem dimire û ji ber ku xeberê bidin malbata Memê Alan Hesên jî Mîr Şem peywîrdar dike û jê re dibêje: “Here bajarê Mixribiyan xeber bide malbata Mem.” (Lescot, 2010). Mîr Şem jî dibe qasîd û li Bozê Rewan siwar dibe û diçe bajarê Mixribê xeberê dide malbata Mem.

3.2.13. Di Destana Memê Alan de Motîfa Astenger.

Wek motîfên din, ev motîf jî motîfeke dewlemend e. Destana Memê Alan de em di karin bi bêjin pêşî Bekoyê Awan astenger e. Belkî sed xapan dike ku Mem û Zîn negihîjin hev. Her tim li pey xapa ye ji ber ku Mem û Zîn negihîjin mirade xwe.

Destanê de keça Beko jî em di karin wek astenger bi pejîrênin lewra keça Beko jî wek bavê xwe xapa yan li Mem yan jî li Zînê dike. Diçe hinara bi jahr dide Zînê ku Mem vê hinara bi jahr bîxwe û bimire. Ji xwe Mem bi vê hinarê dimire.

Ji bilî van her du astengeran em di karin bi bêjin Mîr jî lehengekî astenger e ew jî pir caran niheqiyê Mem yan jî li Zînê dike. Her çiqas bi aqlê Beko tevger bikê jî em dîsa dikarin wek astengerekî kebul bikin.

3.2.14. Di Destana Memê Alan de Motîfa Xewnê

Xewn di bin sernavê zayend û sehrê de alikariya çîrokê dike. Di xewnanda şîret tên kirin. Agahi bi rêya xewnan tên sitandin.

Destana Memê Alan de Mem di xewnên xwe de dibîne ku dê bimire. Di vê xewnê de şîret li Mem tên kirin. (Lescot, 2010).

3.2.15. Di Destana Memê Alan de Motîfa Tayînkîrîna Dahatûyê

Ev motîf ji Destana Memê Alan de derbas dibe. Şexê Qûreyşîya tê xewna Mem û şîreta li Mem dike. Her tiştî ji Mem re dibêje: “Tu dê bi hinara jahr bê kuştin. Vê hinarê bixwe. Eger tu bimirî tu ê bihişî jî merteba şêx û ewliya.” (Lescot, 2010).

Disa şêxê Qureyşîya şîret û nasiheta li Mem dike dibêje: “Qet meraq neke piştî mirina te heftekî de dê Zîna Zedan ji bi mire. Hûn dê bigihîjin miradê xwe. Daweta we li cennetê werê kirin.” (Lescot, 2010). Mem piştî ji van gotinan Zînê re dibêje li Zîn ji her tiştî haydar dibe.

3.2.16. Di Destana Memê Alan de Motîfa Civakê

Ev motîf jî di hin çîrok û destanan de heye û alîkariya çîrokê dike. Di destana Memê Alan de wexta ku her sê bira (Hesen, Çeko, Qaratacîn) li ser Mem nîqaşê dikîn, Mem deng wan her sê biraya dike û ji wan re dibêje: “Qet nîqaşê nekin. Şer nekin. Eger hun çî bikin civak ê henekên xwe li we bike.” (Lescot, 2010).

Destana Memê Alan yek ji wan destanane ku milletê Kurd vê destanê wek destaneke netewî dibîne. Me vê beşê de hevlda ku bi rêya Destana Memê Alan ispat bikin ku Kurd jî bi hêla destanbêjiyê ve xwedî devlemendiyek bêhempa ne. Ev destane hem aliyê naverokê hem jî aliyê vegotinê ve hemkifê destanên cîhanê ye. Heman demê de ji bo serpehatiyên kurdan jî wek çavkaniyek serekeye. Gava mirov destana Memê Alan dixwîne rastî çand, huner, dîrok û jiyana kurdan tê. Em destana Memê Alan de dibînin ku çi ferq û cudahiya destanên Kurdan û destanên cîhanê nîne. Armanca me ya vê beşê jî ew bû ku em nîşan bidin destanên kurdan jî xwedîyê teybetmendiyên destanên cîhanê ne.



4.BEŞA ÇAREM
LI GORÎ QANÛNÊN EPÎK YÊN AXEL OLRÎC DESTANA MEMÊ
ALAN

4.1. Qanûnên Epîkî Yên Axel Olrîc

Di vê beşê de Destana Memê Alan dê li gorî qanûnên epîk yên Axel Olrîcê Danmarkî dê were xwendin û qanûnên wî dê Destana Memê Alan de were nîşandan. Nivîsara bi navê: “Qanunên Epîkî yên Vegotinên Gel” ya Axel Olrîc cara pêşin di sala 1909an de di kovara “Zeit Shrift für Deutsches Altertum” ê de hatiye çapkirin. Navê orjînal ê vê nivîsê “Epische Gesetze der Volkesdichtung” e. Axel Olrîc gava behsa van qanûnan dike, armanca wî ev e ku di vegotinên gel de hinek qanûnên bingehîn û hevpar derxîne holê û wan bide naskirin. Ew di vî warî de wiha dibêje: “Tiştê ku ji me re pêwîst e rêbazeke lêgerînê ya zanyarî û biyolojiya sageyê ye.” (Olrîc, 1994: 2-8). Axel Olrîc di xebata xwe de dixwaze ne tenê ji bo mîtan û xeberoşkan, ji bo vegotinên gelerî jî bi giştî li ser kategoriyeke hêj firehtir; ku ew vê wek “sage” bi nav dike xebatekê bike. Ev kategorî; mît, stran, destanên lehengî, efsaneyên heremî û tevahîya xebatên bi teşeyek hatine honandin jî dihewîne.

Li gorî tespîtên Axel Olrîc qanûnên epîk ku di nav vegotinên gelêrî de wusa ne:

- 4.1.1. Qanûna Destpêkê û Dawîlêanînê**
- 4.1.2. Di vegotinê de beşên herikbar**
- 4.1.3. Qanûna Dûbarekirinê**
- 4.1.4. Qanuna Sisêyan**
- 4.1.5. Qanûna di Yek Sehneyê de Dido**
- 4.1.6. Qanûna Dijberiyê**
- 4.1.7. Qanûna Cêwîyan**
- 4.1.8. Qanûna Girîngiya Rewşa Pêşîn û Dawîn**
- 4.1.9. Qanûna Vegotinê de Yekxetî**
- 4.1.10. Qanûna Qalipgirtinê**
- 4.1.11. Qanûna Sehneyên Wêneya Mezin**
- 4.1.12. Qanûna Mantiqa Vegotin (Sage) yê**

4.1.13. Qanûna Yek Entrîqayê

4.1.14. Qanûna Rêzika Yekîtiya Epîkî

4.1.15. Qanûna Yekitiya Epîkî ya Îdeal

4.1.16. Qanûna Civandina Balê ya li Ser Lehengê Sereke. (Olrîc, 1994: 2-5; Olric, 1994: 4-9).

Wegera bi zimanê Tirkî ya nivîsara Axel Olric, di sala 1975an de di kovara “Millî Folklor” ê de hatiye wergerandin û çapkirin. Li gorî tesbîta me qanûnên epîk, du jimareyên vê kovarê de çap bûne û li ser du destanên Tirkî hatine tetbîqkirin. Me di xebata xwe de, ev werger ji xwe re kiriye bingeh. Axel Olric, di xebata xwe de behsa şibandinên di navbera vebêjên gelerî de dike. Kesê ku bi vebêjên gelêrî re tekildar e, gava edebiyata gelekî li dûri xwe bixwîne, ew gel û vegotina wî ya kevneşopî ji wî/ê kesî/ê re heta niha bi giştî çiqas biyanî be jî wek ku ji berê de rastî wan vegotinên hatibe hestek bi wî/ê digre. Ji bo ku ev hevnasîn were ravekirin, du faktor tên peşxistin:

1. Taybetiya bireweriya hevpar a mirovê seretayî

2. Têgiha xwezayî û mîtolojiya seretayî ya ku bi vê taybetmendiyê ve giredayi ye

Axel Olric dibêje ku: “Qanûnên hevpar dikarin li tevahî edebiyata gelerî ya Ewrûpa û heta li cihên hin dût jî werin tetbîqkirin.” (Olrîc, 1994: 23). Ji vê hevokê tê fêmkirin ku, wî xebatên xwe bi piranî li ser vegotinên Ewrûpayê kirîne. Behsa vegotinên cihênên dût nehatiye kirin. Ev dikare wek kêmasiyek were dîtin, lê ev çende ne kêmasiyeke bilakîs derfetekê dide lêkolîner ku gencîniyekê li nav wêjeya xwe de peyda bike û devlemendiya wêjeya xwe bibîne.

4.2. Li Gorî Qanûna Epîkî Yên Axel Olric Destana Memê Alan

4.2.1. Qanûna Destpekê û Dawîlêanînê

Sage (vegotin) ji nişka ve dest pê nake û ji nişka ve naqede. Em ji vê rêgezê re dikarin bibêjin “Qanûna Destpekê” ê. Sage (vegotin) ji sekaniyê ber bi coşdariyê ve dest pê dike û pirî caran piştî bûyerek ku encamê vê bi bobeleta serê kesên sereke de hatine, ji coşdariyê ber bi sekaniyê ve diqedin. (Olrîc, 1994: 2).

“Di vegotinên dirêj de gelek rawestgehên wiha pewistin. Ji bo vegotinên kurt tenê rawestgehek bes e. Dawîleanîn, pirî caran wekî berdewamiya mijarê ya li gorî taybetmendiya wê deverê, teşeya xwe digre.” (Olrík, 1994). Destana Memê Alan jî bi şikleke sekan destpê dike, ber bi coşdariyê ve diçe û piştra ber bi sekaniyêve tê û diqede. Destana Memê Alan bi teswîra bajarê Mixribiyan bi awayekî sekan dest pê dike.

“Bajarê Mixribê bajarekî ezîm û pir giran e
Li ser heft çîyan e
Li ser sê sed û şêst û şeş qapiyan e
Her qapiyek li ser sê sed û şêst û şeş walîlixan e
Her walîlixê li ser sê sed û şêst û şeş midirlixan e
Timam di destê Elî Begê, Emer Begê, Elmaz Begê de ye, sê biran e
Xwediye tewlê nijda, boşê dewa, xarê miyan e
Miftê devê sindoqê zêra barê çil û pênc begîlan e
Xwediye xezîne û defînê giran e
Xwediye sûk û çarşîyan e”

Ev beşe bi hatina dinyayê ya Mem dewam dike. Behsa derketina holê ya hespê Mem, Bozê Rewan û hevdiîna wî û Zînê tê kirin. Mem ji bo ku dîsa Zînê bibîne derdikeve rê, ji welatê xwe dûr dikeve. Di dawiya destanê de Mem û Zîn nagihîjin mirazên xwe. Her du jî dimirin. Mem bi jehra xêrnexwazan, Zîn jî ji kerba mirina Mem dimire. Lê piştî mirina her duyan ji destan di carekê de naqede. Tola Mem tê standin bi wî awayî destan diqede.

“Hinga Beglî da îzna Mîr Ezîn, Mîr Şem û her sê Celaliyan e.
Bajarê xan û xerabe teslîmê wan kir, hate ser tirba Memê Alan e,
Got: ‘Memo, bila di dilê te va eyan be, min heyfa te hilanî ji bêbextan e.’
Hinga, bi xwe siwar bû li Bozê Rewan e
Leşkerê wî çadir bar kirin meşîyan e
Berê xwe dane welatê Mixribiyan e
Çîroka me çûye çeke û berestanan e

Rehmet li ser dê û bavê guhdaran e”

Wek me li jor jî nîşan da Destana Memê Alan bi şikleke sekan dest pê dike û bi şikleke sekan di qede. Ji ber ku Destana Memê Alan dirêj e, di destanê de gelek rawestgeh hene. Ji bo ku destan bi awayekî berfireh were fêmkirin, em ê di vegotinê de cihen ku diherikin(coşdar) û cihên ku disekinin (sekan) wiha rêz bikin.

4.2.1.1.Di Vegotinê de Beşên Sekan

a) Bajarê Mixribiyan Tê Teswîrkirin

“Bajare Mixribê bajarekî ezîm û pir giran e
Li ser heft çiyar e
Li ser sê sed û şêst û şeş qapiyan e
Her qapîyeke li ser sê sed û şêst û şeş walîlixan e
Her walîlikê li ser sê sed û şêst û şeş midirlixan e
Timam di deste Elî Begê, Emer Begê, Elmaz Begê de ye, sê biran e
Xwediye tewlê nijda, boşe dewa, xarê miyan e
Mifte devê sindoqê zêra barê çil û pênc begîlan e
Xwediye xezîne û defînê giran e
Xwediye sûk û çarşiyar e”

b) Elî, Emer û Elmaz Begê, di Nav Cilê Derweşan de ji Nav Bajêr Dertên

“Elî Begê, Emer Begê û Elmaz Begê, sibehê eydê
Qurbanê rahiştin darê erebana û xelîlan e
Û li xwe kirin cilê derwêşan e
Ji bajarê Mixribê derketin, berê xwe dan çola û Kerbelan e”

c) Xoce Xidir û Sê Beg Hevûdu Dibînin

“Rebbê alemê Xoce Xidir li wan kir beyan e
Carekê nêrî ku Eli Begê û Emer Begê û Elmaz Begê
Ji xwe re runîştine û giriyan e
Dilê wî li wan şewitî sêvekêji paşila xwe derdixe,
Dide destê Eli Begê mezinê biran e”

c) Xoce Xidir Nav li Mem Dike

Rojekê ji rojên Xwedê, miçlîsa Elî Begê geriya, go: “Em ê navekî li kurê te bikin” Go: “Bavo, ez ne bi destê xwe me ixtiyarekî kalikê wî heye, heyânî go ez wî nebînim, ez nikarim tu nava li kurê xwe bikim.” Meclisa wî geriya. Hinek dibêjin: “Em ê navê wî bikin Arif.” Hinek dibêjin: “Na, welah, em ê bikin Emer.” Hinek dibêjin: “Na, welah, em ê bikin Felemez.” Hinek dibêjin: “Na welah, em ê bikin Wîsif.” Hinek dibêjin: “Na welah, em ê bikin Brahîm.” Carekê nêrîn ixtiyarek hat, got: “Eselamû eleykum, ya cimaeta mezin.” Gotin: “Eleykûm selam, ya ixtiyarê delal.” Go: “Hûn çi ji vî kurikî dixwazin. Navê wî deynin Memê Alan, xwerziyê Şêxê Qureyşan, braziyê Emer Begê û Elmaz Begê, siltanê Kurda!” Carekê nêrîn go ixtiyar winda bû. Navê wî ma Memê Alan.

d) Sê Qîzên Padîşahê Periyên Dertên Holê.

“Hebûn sê qîzên Padîşahê Periyên e
Navê xwîşka mezin Tavbano ye
Navê xwîşka navîn, Heyvbano ye
Stêrbano navê biçûka xweyîngan e
Rojekê derketin çûn ser kaniya Gulan e

Ji xwe danîn postên kewan e

Ketine nava hewza gidan e”

f) Zînê di Qonaxa Xwe de Şiyar Dibe

“Sibe bu roj helat xwe da serê çiyar e

Zînê çavê xwe rakir ji xewa şevan e

Nihêrî ko tune ew mevanê xwe ye

Şeva çûnî, xwediye mihebbeta sadiqan e.

Kire qirîn bi deverûyan xwe avête ser nivînan e

Got: “Va çi ecêb û elameta giran e?”

Min digot qey rast e, tu nabê ko xewneke şevan e.”

Paşê da eqlê xwe kefa şevan e.

Got: “Bi min ku me bi hev ra guhartine gustîrên peçiyane.”

Destê xwe avête gustîrê, û lê nihêrî ko li ser qaşê wê hatiye nivîsîn:

“Memê Alan, Padîşahê Kurdan e.”

g) Mem di Qonaxa Xwe de Şiyar Dibe.

“Em ê herin dora Memê Alan e

Sibê çavên xwe vekirin ji xewa şevan e.

Nihêrî ku tune mevana xwe ya şeva çûnî xwediya şor û henekan e.

Bi xwe re digot: ‘Ecêb, va ne îşê cin û periyan e’

Paşê, hate bîrê, got: ‘Law, ne me şeva çûnî guhartin gustîrên tiliyan e?’

Li destê xwe nihêrî ku rast e, ne bi derewan e.”

i) Mem li Bajarê Cizra Botan, ji Gelê Bajêr Qonaxa Hesên, Çeko û Qeretacîn Dipirse.

“Nihêrî li ber qehwekê gelê bozebeliyan sekiniyan e

Berê hespê bada û dageriya ser wan e

Go ‘Belkî ez derbas bim ji qesra Hesên, Çeko, Qeretacîn û nizanim kîjan e’

Gava wan dît bi ser wan da hat siwarekî mîna padîşan e

Gişkî rabûne ser lîngan e, bi hev ra dîkin gotin û şoran e

Digotin: Em ê jî vî ra bigrin qedreke giran e.”

j) Memê Alan li Mazata Hespan Dixwaze Bozê Rewan Bifroşe

“Ew esîra kete pêşiya Memê Alan e

Bire mezada hespan e

Li ber qehwekê, Mem nigê xwe bi der xist ji zenguyên Bozê Rewan e

Peya bû li cem gelê qehweciyan e

Ji Memî ra kursî danîn, bu şîngîna fincanan e

Zehranan banê delalekî kirin û dane dest Bozê Rewan e.

Kuriyê behrê avetine mezada hespan e

Heywan serî hilda û terî da qolincan e”

4.2.1.2. Di Vegotinê de Beşên Herikbar (Coşdar)

a) Hespê Bozê Rewan ji Behrê Dertê

“Wê rojê, Begî dibîne ku di nav bajarê Mixribiyan, galegêrteke giran e.

Her kes dîrevîne ber vê behrê, dengê qîrê qîr û gotinên wan e.

Beglî yek şande ber behrê, got: ‘Law, here binhêre çi dehwa van xelkan e.’

Ew xort li Beglî vegeerî piştî çend deqîqan, jê ra dike şoran e.

Beglî bi ser Memî da direve û dibêje:

Bira, dibêne bêtarek hate serê torvanan e.

Memî got: ‘Çiye? Çi bêtar e?’

Beglî got: ‘Îro torvanan tora xwe avetine behrê bi çend ciyan e.

Ketiye nava torekî tişteki giran e.

Xelkê bajêr gişkî xwe didine werîsan e.

Ne derdikeve û ne jî dilive bi kişandina xortan û peyan e.’

Hema Mem rabû, lingê xwe avête cotê solan e.

Daket hewşê û çû ber kendalê behrê, tevî gelek xortan e.

Dît ko tevî torvanan pir mêriyan destê xwe avetine binê toran e.

Xwe didinê wiha ku destên wan gişkan xwîn bûneji zoran e.”

b) Mem û Zîn di Menzela Mem de Hevûdu Dibîn

“Zînê qenc bala xwe da nav ciyan e.

Nihêrî ko va ne îşê cin û periyan e.

Yê ku di nav textî da, insan e.

Hinga, bi dengekî bilind da ber qîran e.

Got: ‘Dilê min li yan e, sê cara li yan e.

Emrê min, nêzîkê, sêzde ye, dikeve çardan e.

Ji roja ku ez ji diya xwe re bûme, û heyânî roja îro,

Min ne diye ruyê zilama û xortan e.

Şeva îşevê tiştê di serê min de hatiye, bila neyê serê kesekî misilman e!

Derdê min derdekî çetin, xirab û giran e.

Ez nizanim ev îş ne îşê sêhrê ye û ne îşê Mîrê Cinan e.

Carî û xulamên min ji mixrib heyani sibehê li ber derî dikişînin nobetan e.

Tu mêrekê xerîb ez nizanim ne tu Cizerî yî û adeta wê xortan e.

Şeva nîvê şevê, hûn digerin li kexana û meyxanan e.

Ez nizanim şeva î şev te ereq vexwariye û tu jî sikran e.

Hevalê te sikran bûne. Ji teniştê te rabûne, di hundire meyxanan e.

Tu jî rabûyî, ketiyî hundirê zikak û ewcan e

Te winda kiriye riya malan e.’

Memo dengê ban dikirê, digo: Dilê min li yan e.

Tu xiyala xwe bide daîra min a renginî û qonaxa min a giran e

Ji gava di vir de, ez di îşê Rebbê Alemê de fekirim,

Nizanim ne bi ilmê serê ye.

Ne bi ilmê Mîrê Cinan e.

Bajarê ku tu dibêjî bajarê Cizîra Botan e.

Min di emrê xwe da ne ew diye bi çavan e.

Ne jî bihîstiye bi guhan e.

Qey koranî bi çavê te de hatiye.

Tu serê xwe derxe, ji xwe re binerê li behra û dengizan e.

Binerê li orinê qeptana û tîkîna gemiyan e

Ji min re dibêjin çeleng Memê Alan e.

Xwerziye şêxê Qureyşiyî e.

Braziye Emer Begî û Elmas Begî, Siltane Kurdan e.”

c) Mem Ji Bo Dîtina Zînê bi Rê Dikeve û Li Vir Tiştên Tên Serê Wî

“Xebera çûyîna Mem belav bû di nav bajarê Mixribiyan e
Destên xelkê diketin paşila wan e
Mîna berxên dangiyê bi ser Memê Alan da reviyane.
Hinek dihatin destan, û hinek derçine rikêb û lingane
Mîna ko meyîtek bi derkeve, dibû bavo bavoya van xortane
Mem dît ku îş dirêj e, şîn û girî xwe da ezmanane
Zenguyek dido avêtine kêlekên Bozê Rewan, hevalê roja tengiyan e
Berda ser sito dizgîna Bozê Rewan e
Heywan diçû mîna birîska ko datê ji ezmanane
Bi şûn wî da nedixewînê bê talaz û toz û duman e
Kesî nizanî hikmê vî heywanî çiqas pir e di riyane
Li wî bayî diçûn, heya şev gihite wexta nimêja yasiyan e
Mem dît ku di kêlekê de tê dengê gûşe gûşa avê û destê meriyan e
Berê hesp guharte ser, ku kalek e, emrê wî gihaye heftê û pêncane.
Ser û çavê nûranî ne, mîna gulane
Hespekî boz, wekî yê Mem girêdaye bi qeyd û merbendan e.
Bi xwe jî dike destmêja yasiyan e
Memî lê silav kir, kalo silav vegerand û rabû ser lingane
Got: Were peya be li ser serê min û her du cavan e
Were, ez û tu da bikin nimêja yasiyan e
Belkî jî bi te ra siwar bim qonaxeke, dibe didiyan e.
Ev kalo Xizir, mêrê Kerbelan e.”

“Memo dengê banê Zînê, qîza Beko Awan kir, go:
‘Lê lê xûşkê, dilê min liyan e, sê cara liyan e
Ez î xerîb im, nizanim riyane û derbane
Xwedê hebina, bihûre felatê Cizirê kîjan e?
Ro hilatiye ji mala Xwedê ji aliyê jêrê
Şewqê xwe daye dinyayê û hawerdore
Ez nizanim, ne sibe ye û ne êvar e
Çaxê te bi xêr e.’

Zînê qîza Beko Awan dengekî ban dikirê digo:
‘Xerîbo, ez bi qurbano, ro helatiye; ji mala Xwedê jî dûr e
Şewqê xwe daye dinyayê û hawêrdor e
Xiyala xwe bidiyê kuriyê behrê Bozê Rewan di bin te de dikûre kûre
Stoyê te xwar kiriye kostekê saetê û qeytanê lahûr e
Tu eşqî bûye li bajarê Cizîre
Qedehê çavê min reş îbelek û guliyê min ê hûr e
Tu li wê derê bisekine, mîna kevirê dêrê Ermeniyana e
Ez ê derbas bim felatê Cizîra xopan e
Bila Cizîrê ji xweyê bihêre, bixwe serê xwediyana e!’
Memo digo: Erê xûşkê, dilê min liyan e
Haye min tune ji van pirsane,
Ji min re dibêjin ticarê hespane
Ez hatime li pêşiye û hespên min bi şûn da mane”

d)Mem ûZîn Cara Duyem li Ber Qonaxa Hesên Hevûdu Dibînin.

“Dema Zîn hate tala qonaxana e,
Nihêrî ku kesek tune li wan deran e
Çîkî çarîka hîzarê li ser çavan hilda, û berê xwe da pencerana e
Çi dinhêre ku di pencerê da rûniştîye yarê sevan, Memê Alan e
Şeş meh tamam bû bûn ko dinalîne bi vê hesreta dilana e
Tu cara ne dihate bîrê ko Memî bibîne li bajarê Cizîra Botan e
Erê, ko çiqas carîye goti bû ji bawer ne dikir bi gotin û şoran e
Gava Mem li pêş xwe dît, di pencerana e
Êdî xwe jî bîr kir li ber jin û kerçana e
Gûçên hîzarê di dest da filîtn di cihe xwe da sekinî berî li Memê Alan e
Nema dikarî bû lingê xwe bavêje, mîna nexweşa çend salana e
Mem jî dinihêrî li refê jin û qîzana e
Di dawîya hemîyan ra, yêk hate, sekinî li tala pencerana e
Çarîkrakir li ser çavan e
Serê xwe rakir, berê xwe da şibakana e

Mem çi dinihêre ko li hember wî sekiniye
Zîn, xwediya xewna şevan e
Bi carê eqil di serî da ne ma, wekî bodelan e”

e) Çeko Şûr li Birayê Xwe Hesên Dikşîne û Poşmaniya Wî

“Çeko mîna merê ker û lal kete fikran e
Difikirî, mîna kuriya derziyê bidî ber darê maxan û stûnan e
Tafî razî ne bû bi dayîna Zînê çavê xwe berda fen û losan e
Got: ‘ Ya qenc ew e ku ez li Hesên bikişînim şûran e
Eger wî ez kuştim, bila Zînê bide Memê Alan, Mîrê Mixribiyan e
Qene çavê min nabîne tu tiştan e
Na, ku min Hesên kuşt, êdî Mem nema dikare bimîne li hêviya sondan e
Wê rabe siwar be, here welatê xwe, bajarê Mixribiyan e’
Gotinên Hesên li Çeko pir tesîr kirin, û li kirên xwe bû poşman e
Serî kete ber mîna serê zarokan e
Şûr di dest da kete erdê, bi çavan da bû gurina hêstiran e
Go: Hesên, bira, tu qusirê min bidî bin ligan e
Tu caran lê me nihêrî bi çavan e
Birayê meriyan e mezin li şûna dê û bavan e
Min li pêş te kêmiyek mezin kir bi van şor û gotinan e
Insan e, aqilê min ne li serê min bû, ez bû bûm wekî bodelan e.
Min him jî xwe xeyidand mêvanê mezin Memê Alan, Padîşahê Kurdan e
Tek vê carê min ef bikin, êdî ne ma tu caran dikim van tiştên han e.”

f) Li Ser Kaniya Qestelê Mem û Zîn bi Hev re Diaxivin û Wext Derbasdikin

“Zînê got: ‘Memo, di ber ra, di ber ra!
Tu vê sibê mîna teyrê şahin, xumanîyê girtî, ser bask û pera
Tuji welatê xwe bajarê Mixribiyan bi der ketî
Heya bajarê Cizîre hatî li ser çavê eşqî û xatûna xwe ra.’
Hînga Memî lingê xwe bi der xistji rikêban e
Peya bû li ser Kaniya Qestelê Mîna teyrê ko xwe berde ser koma kewan e

Kew ku bifirin, yeke bi tenê bimîne li şûna wan e
Memî ji Zîn girt û rûnişt li ser Kaniya Qestele ava gulan e”

g) Mem Diçe Şerê Ecem Xwe Birîndar Dike.

“Beko got ‘Îro şerjê ke gelek pezan e
Xeberê bide xelkê bajarê Cizîra Botan e’
Bêje: Li mala min heye daweteke giran e.
Banê Hesen ke, tevî çeko û Qeretacîn, her sê biran e
Bila bi xwe ra bînin dawetê mevanê xwe Memê Alan e
Em ê xeberê bidin zabitan û leşkeran e
Gava hatin, rûniştin li ser nan e
Ez ê fermanekê bi navê Mîr binivîsînim,
Ku Ecem serî rakir, û tene li ser bajarê me Cizîra Botan e
Memî dît ko gotina Hesen di cîh da ye, bi der ket di nav siwaran e.
Di kalên bi der xist lahûrê giran e
Di ser zenguyê ra avetê lingan e
Lingê xwe birî û xwîna sor bi ser da dirijyan e
Li Hesen vegeerî gotê: Bira vê carê gotina te çawan e?
Hesen dît ko hêlekê ling birîn bûye, birîneke giran e
Hema berê xwe da cem Mîr Ezîn, serleşkerê wan, Mîrê Botan e”

h) Beko û Mîr Ezîn bi Ser Mem û Zînê de Tê

“Ji gava Mem giha bû cem Zînê, rûniştî bû, çong da bu ser çongan e
Devê xwe da bû ber guhiyan e
Û bi hev ra ketibûn sihbeteke pir giran e
Eger bajar bi ser hev da bihata, dengê tu tiştî ne dihate wan e
Memî hew dît ko dengê lingê pêyan e
Li ber derê Zînê hat, û sihna pêyan jê re bû xewan e
Hema Zîn xiste bin dawê kurkê bi çî û hewran e

Memî dît ko Mîr Ezîn bi Beko va ji der da hatin oda wan e
Di dilê xwe da got: Ku ez rabim, her hal Zînê bike xewan e
Ko ez ranebim li pêş Mîr Ezîn, va yeka bê edebiyeye giran e
Mem jî bê izna Mîr hatibû hêla malê, daîra jinan e
Zînê xwe civandibû hev di bin kurkê Memî da, mîna kewan e”

j) Mîr Ezîn Şûr li Memê Alan Dikşîne

“Mîr Ezîn, berê xwe da Memê Alan e
Got: “Memo, dilê min liyan e
Bira di dinê da kes neke çêyiyan e
Bawer nebê bi nezan û xerîban e!
Te bi min ra got: Li min bûye birîneke şûran e.
Minjî ji te ra got: Here mala Hesên û ji birîna xwe ra bibîne derman e
Tu hatî bajarê Cizîrê, ne sekinî li tu cih û deran e
Ne ji birîna xwe ra dît derman e
Te rast berê xwe da Birca Belek, hêla herêmê, koşkê jinane
Ev yeka ne karê camêr ê mêran e”
(...)
“Mem
(...)
Nihêrî ko Mîr Ezîn û Beko ji di wê fikrê da ne
Destên xwe birine ser qevdên şûran e
Memî ji bi destê çepê rahiştê porê Zînê di bin hewrani da, qeterê guliyan e
Bi destê rastê rahiştê qevdê şûr û rabû ser her du çongan e”

k) Mem bi Fenan Digrin û Davêjin Zindanê

“Civat belav bû, hewşa qesrê li wan ma xirt û xalî
Zîn ji li banî ji pencerê xwe da alî
Beko rabû, nêzînkî li Mem kir, gotê:
‘Sahzade li gora şertê te û Mîr keremke dest û lingên xwe berde.’

Memî go: ‘Bila be; ez bibînim ka çiyê yariya te.’
 Beko çû werîsek anî, dest û lingên Mem pê giredan
 Mem rabû, xwe ji cih hinek tev da
 Werîs bû piç û parî ji hev de ket qetî
 Vêga Beko kete binaniya bircê, zencîrek anî
 Memê Alan dîsa dey ne kir; dest û pê sist kirin, berdan
 Beko mêvanê xwe pihêt gireda, xelek û girek li hev badan
 Mem bêhnekê damayi ma, qey pêtek ji devî derket, pe pif kire zencîr
 Hesin sor bû, helî, herikî, ket erdê. Bû marek fêris
 Beko ji ber mar revî, xwe da alî, xwe kire pis
 Mem kenî fikand, nehvirî, mar tevizî berê xwe da banî.
 Mar kete qulekê bircê, Beko bêhna xwe da, li ber Mem gerî
 Beko dikir lavelav, digote Mem:
 ‘Ezbenî, ma kengî ez bi te karim, divê tu rê bidî min’
 Mem di eqlê xwe de digot qey tev henek û yarîye.
 Memî gote Awan: ‘Kura here stewlê çend mu ji del ji bijiya Boz bîne;
 Çend muyên serê min ji min pê girêde,
 Ez ê ji bîr ve biçim, saetkê ez dimînim bêhiş.’
 Beko, mulyên Boz anîn, çendek jî ji serê Mem rakirin
 Mu li hev badan, kirin benekî zirav û tenik
 Tilî û pêçiyên Mem pê giredan
 Mem xwe tev ne da, cemidî bêhiş, bû barekî sivik
 Beko bi tirs li vî halî ma ecêbmayî
 Xeyala mêr hate bîrê, cendeke Mem rakir, revî
 Bere xwe da binaniya bircê, dakir zindaneke kûr û tarî.”

1) Mem Dimire

“Ez dê bavême devê xwe çendek ji hebên hinaran e
 Bila dinya teres bimîne ji ho bêbextan e
 Memî destê xwe rakir, bire ber devê xwe, hebên hinaran e
 Derbas kirin ji nava lêvan û diranan e

Çavên xwe girtin, bi carê da xwarin axu giheşte zik û roviyan e
Çav xirab bûn çû bû rehetan e.”

m) Beglî Tolê Hildide.

“Piştî sê rojan şîn sar bû, Beglî emir da xortên Kurdan e
Anîn di nêva bajêr da ar dadan e
Li kêleka bajêr singê çadîran kutan e
Herçî destî wi digire şûr û silehan e
Ne man, gişkî hatine cem Beglî gotin:
‘Bêje te çi emr e çi ferman e?’
Hema Beglî berê wan dide çadîran e
Roja sisiyan, Beglî emir da, singê çadîran hilkêşan e,
Topê havan bar kirin li ser piştî bargîran, tevî sendûqê cebelxanan e
(...)
Beglî bi der kete pêşiyê anî çadîran e
Emir da eskerên xwe got: ‘Herin bi xar bikin qesr û qonaxan e.’
Sê roj û sê şevan di nav bajarê Cizîrê da bû axir dewran e
Ku kî di ber diketin dikûştin, di ber heyfa Memê Alan, Padîşahê Kurdane.
Roja sisiyan di nav Bajarê Cizîrê da xaniyê bilind qet ne man e.
Giştik bi erdê ra dûz bûn bi destê xortên Kurdan e
Beglî emir da leşkeran e
Tev da bi der ketin ji bajarê Cizîra Botan e”

4.2.2.Qanûna Dubarekirinê

Yek ji rêgeza girîng a avahiya sage (vegotinê) jî qanûna dubarekirinê ye. Vegotinên gelêrî ji ev teknika ku bi her awayî dadikeve teferrûatên bêpar e. Ji xwe, teswîrên ku pir kêmtên dîtin ji ber ku kurt in, di tekstê de nabin navgînên girîng ku bandor li mijarê bikin. (Olrîc, 1994: 3).

Di vebêjên me yên devkî yên kevneşopî de tenê hîlbijêrek heye ew jî dubarebûn e. Di vegotinê de kengî ku sehneyeke bi bandor derkev meydanê, eger ku

ev rewş li pêş herikbariya bûyerê nebe asteng, hingê ev sehne tê dubarekirin. Ev ne tenê ji bo pêkanîna tansiyonê ye, di heman demê de ji bo ku valahiyên vegotinê bêne tijekirin jî tê kirin. Dubarekirin, carîna tansiyonê bilind dike û carîna jî hêsan dike. Lê ya girîng ew e ku beyî rêgeza dubarekirinê vegotin bi temamî nagihije dirûva xwe.

Di destana Memê Alan de dubarekirin wekî ku Axel Orlîc dibêje, di mijarên qewimî de nayan dîtin. Di destanê de bûyer carekê diqewimin. Dubarekirin bi piranî di şayesandina cihekî an kesekî de û bi piranî di axiftinên ku leheng behsa xwe dikin de dertên holê. Her wiha ji bo mijarên ku berê hatine gotin, werin bibîranîn jî dubarekirin tê kirin. Carna jî, ji bo valahiyên nav vegotinê werin tejkirin, qanûna dubarekirinê tê bikaranîn.

Şayesindina bajarê Cizîra Botan hem di serî de, hem piştê de dubarekirin. Çar car qîzên periyar pif dikin ser Mem û Zînê ji bo Zînê razê û şiyar bibe, her wiha Mem şiyar dibe û dîsa diraze.

“Pifkirine ser Zînê xatuna piştê perdan e,
Kirine vehmê miriyar e
Pifkirin ser Zîna Zedan û Memê Alan e,
Mem hişyar bû ji xewa şevan e
Pifkirin nav textê Zîna Zedan e
Vê derbê Zînê çavên xwe vekirin ji xewa şevan e
Pif kirin nav her du text û nivînan e”

Di gelek cihan de gava ku behsa Beglî tê kirin, behsa serdarbûna wî ya hezar û pênc sed xortên kurdan jî tê dubarekirin. Behsa gustîlkê û guhertina gustîlkan di pênc cihan de tê dubarekirin. Di destpêkê de di hevdiîna Mem û Zînê ya cara pêşî de Piştî Mem şiyar dibe ji bo zanibe tiştên hatine serê wî rastin an na, li gustîlka xwe dinêre. Piştî ku Zînê şiyar dibe ew jî li gustîlka xwe dinêre ku zanibe tiştên ku di serê wê de derbas bûne xewn e an rast e. Piştê di lihevraştatîna qîza Beko Awan û Mem de herî dawî jî li ser Kaniya Qestelê gava ku Mem bi Zînê re diaxive behsa gustîlkan dike. Bûyera girtin û hepskirina Mem, ji devê qîza Beko Awan tê dubarekirin Mem

di xewna xwe de Emer Begê dibîne, Emer Beg behsa mirina wî dike, piştire Mem xewnê ji bo Zînê dubare dike.

4.2.3.Qanûna Sisêyan

Dubarekirin hema bibêje her dem bi jimareya sisêyan ve giredayî ye. Di heman demê de jimareya sisêyan bi serê xwe qanûnek e. Lê belê di hemû vebêjên gelerî de em li qanûna sisêyan rast nayên. (Olrıc, 1994: 3-4).

Di destanê de jimareya sisêyan gelek car dertê pêşiya me. Sê bira; bavê Mem û her du apên wî. Elî Begê bavê Mem, Emer Begê û Elmaz Beg. Sê qîzên periyên: Tavbano, Heyvbano û Stêrbano.

“Bajarê Cizîrê li ser sê mihelane
Miheleke li ser milê şêxê ticarane
Miheleke li ser bozebeliyan e
Miheleke li ser milê Hesên, Çeko û Qeretacîn e
Bajarê Mixribê bajarekî ezîm û pir giran e
Li ser heft çiyên e
Li ser sê sed û şêst û şeş qapiyan e
Her qapiyek li ser sê sed û şêst û şeş walîlixan e
Her walîlixê li ser sê sed û şêst û şeş midirlixan e
Timam di destê Elî Begê, Emer Begê, Elmaz Begê de ye, sê biran e”

Bilî mînakên li jor gelek mînakên qanûna sisêyan di vê destanê de derbaz dibin. Sê bira: Hesên, Çeko û Qeretacîn. Heqe mevaniyê sê roj e. Zînê qalandiya Çeko ya sê salan e. Mem wekî teyrekî sê roj û sê şev qet goştê seydê nexwaribe, dixwaze xwe berde ser Zînê. Mem dibê ez sê roj xebitîme ji bo ku tapiya Kaniya Qestelê derxînim. Şîna Mem sê roj dajo. Xerakirina bajarê Cizîra Botan sê roj û sê şevan dewam dike. Xeyni jimara sisêyan; jimara heft, çil û yek, hezar û pênsed, şeş, sê sed û şêst, çil û pênc, diwanzde, panzde jî hatine bikaranîn.

4.2.4.Qanûna di Yek Sehneyê de Dido

Vegotinên gelêrî de jimareya herî zêde ku di heman demê de peyda dibin

dido ye. Eger ku, di heman demê de sê kes bi rola kesayeta xwe derkevin, ev tê wê wateyê ku ev qanûn xera dibe. Di tevahiya prosesa vegotinê de du kes di heman sehneyê de dertên holê. Qanûna di yek sehneyê de dido û qanûna dijberiyê ku ew jî qanûneka girîng û e hevdu tamam dikin (Olrîc, 1994: 4).

Di destanê de hemû diyalogên ku tên dîtîn di nava du kesan de pêk tên. Xoce Xidir û sê bira Mem û Beglî Mem û Emer Beg, Stêrbano û xwişkên wê, Mem û Zîn, Zîn û carîye, Beglî û bav û dayîka Mem, Mem û bavê wî Elî Beg, Mem û kesekî gundî, Mem û Xoce Xidir, qîza Bekoyê şeytan û Mem, şivan û Mem, Bekoyê Awan û Mem, Mem û êsîr, ticarê mezin û tellal, ticarê mezin û Mem, Mem û Bozebelan, Ebebozan û Mem, Zînê û Rihan, Rihan û xulam, Hesên û her du birayên wî, Hesên û Sîfî, Hesên û Mem, Hesên û Çeko, Hesên û Qeretacîn, Mem û Çeko, Beko û Mîr Ezîn, Hesên û Mîr Ezîn, Çeko û Qeretacîn, Mîr Ezîn û Mem, Sîfî û Hesên, Sîfî û Mîr Ezîn, Mem û xulam, Mem û Beko, Sîfî û Mîr Şem, Zîn û qîza Bekoyê Awan, Mîr Şem û Hesên, baxçevan û Mîr Ezîn

Buyer bi pirani di nav du kesan de pêktên. Pêşî kesê/a yekemîn diaxive, tiştê ku dê bibêje dibêje, pişt re kesê/a duyemîn bersiv dide wî/wê. Di hinek sehneyan de her çiqas carna sê kes werin dîtîn jî kesê sêyemîn tevî xebirdanê nabe. Bi piranî tenê hebûna wî tê dîtîn. Diyalog ji aliyên du kesan pêk tên. Qîzên padîşahê periyên gava bi hev re diaxivin Stêrbano wek kesek û her du xwişkên din Heyvbano û Tavbano wek kesek diaxivin. Dîsa sê bira gava li cem hev tên dîtîn, bi piranî ji wan Hesên û Çeko an Hesên û Qeretacîn diaxivin. Gava komek li ber kesekî/ê hebe kom wek kesekî/ê diaxive.

4.2.5.Qanûna Dijberiyê

Di sage (vegotinê) de her dem qutb hene. Ev dijberiya bingehîn, qanûnek girîng a binyada epîkê ye. Pîr û ciwan, mezin û biçuk, mirov û cenawir, baş û xerab. Qanûna dijberiyê bandora xwe hem li ser lehengên sereke hem li ser wan lehengên ku taybetmendiya wan li gorî dijberiya li hember lehengê sereke tên diyarkirin pêk tîne. (Olrîc, 1994: 4-5).

Di Destana Memê Alan de dijberiya herî berbiçav ev e ku li aliyekî kesen ku alîkariya Mem û Zînê dikin hene, li aliyê din jî kesên ku astengî ji bo wan derdixin holê hene. Em di serî de wekî kesên alîkar, Xoce Xidir dibînin. Xoce Xidir rêya bajarê Cizîra Botan nîşanî Mem dide. Li dijî Xoce Xidir, em qîza Bekoyê Awan û bavê wê dibînin. Qîza Bekoyê Awan ji ber ku nikare Mem bixapîne, rêya çewt nîşanî wî dide. Bekoyê Awan jî dixwaze Mem ji rêya wî derxe û wî bikuje. Dîsa wekî karakterên xwedî taybetmendiyên derasayiyê Xoce Xidir, Bekoyê Awan du karakterên li dijî hev in. Em dikarin karakterên Beko û Mîr Hesên jî wek du karakterên dijberî hev binirxînin. Em dikarin kesên alîkar û yên astengiyê wiha rêz bikin:

- a) **Kesên Alîkar:** Xoce Xidir, şivanê li ser rê, ticarê mezin ê extiyar, êsîr, Ebebozê biaqil û sergiran, Hesên, Çeko, Qeretacîn, Sîfî
- b) **Kesên Astengiyê Derdixin:** Beko Awan, qîza Beko Awan, Mîr Ezîn, hinek kesen ji Cizîra Botan ên çavbirçî.

Em dikarin ji aliyê extiyarî û ciwanîyê yan jî ji aliyê temen de, bibêjin ku Mem, Beglî, Zîn, Qîza Beko Awan, Çeko, Qeretacîn karakterên ciwan in. Xoce Xidir, Emer Beg, Elmaz Beg, Elî Beg, Beko Awan jî karakterên ixtiyar in.

Ji aliyên başî û nebaşîyê ve kesên li dijî hev ev in: Sîfî û Zîna qîza Bekoyê Awan. Mîr Hesên û Bekoyê Awan. Ji aliyên dijberiyê ve em dikarin sehneyan wiha dabeş bikin: Sehneyên ku Mem û Zînê bi hev re ne û sehneyên ku Mem û Zîn ji hev dûr in. Di kesayetiya Mîr Hesên, Çeko û Qeretacîn de jî em heman dijberiyê dibînin. Ew di destpekê de wekî talanker, dizker û mêrkuj tene nîşandan lê dûre em merxasî, sozdarî û cameriya wan şahid dibin. Em dikarin bûyerên derasayî û yên rasteqîn ji wekî bûyerên dijî hevûdu nîşan bidin. Her wiha di serê destanê de ji dayikbûna Mem û di dawîya destanê de mirina Mem jî heman mînak in

4.2.6.Qanûna Cêwiyan

Gava ku du kes di heman rolê de dertên holê, em dibînin ku ev her du jî bi awayekî biçuk û qels tî teswîrkirin. Ev du tîpên ku ji nêz de bi hev re tekildar in ji qanûna dijberiyê dûr dikevin û dikevin li bin bandora qanûna cêwiyan. Li vê derê divê têgeha “cêwî” yan bi wateya fireh were fêmkirin. Ev hem tê wateya cêwiyan rast, hem jî wek du kesên di heman rolê de bin. Lehengên di pîleya duyem de tîpên, bi piranî wekî cot derdikevin holê. Ger ji cêwiyan yek jê derbasî roleke girîng bibe, hingê ew bi qanûna dijberiyê re ru bi ru dimîne û bi vî awayî bi yê/a din re dikeve nav dijberiyê. (Olrîc, 1994:5).

Wekî du karakterên cêwî em dikarin Mem û Beglî nîşan bidin. Di serî de her du jî ciwanên mîrxas in. Her du jî xort in. Yek padişahê Mixribiyan e, ê din jî serokê hezar û pênc sed xortan e. Piştî ku Mem, Zînê dibîne, Mem dertê pêş û Beglî li paş dimîne. Piştî Mem, ji bo ku Zînê bibîne û wê bîne welatê Mixribiyan dertê rê, behsa Beglî êdî nayê kirin. Tenê di dawîya destanê de, em dîsa dibînin ku Beglî ji bo tola Mem dertê meydanê. Ev qanûn di Memê Alan de rasterast ne di çerçoveya raveyên Olrîc de be jî, mirov ji kesayetên Mem û Beglî, Zîn û Sitî dikare nîşaneyên vê qanûne bibîne. Wekî din mînakên qanûna cêwîbûnê di destanê de nayê dîtin.

4.2.7.Qanûna Girîngiya Rewşa Pêşîn û Dawîn

Gava ku gelek kes yan jî tişt li pey hev derdikevin holê kesê/a herî girîng dertê pêş. Digel vê yekê kesê dawîn ew kes e ku di vegotinê de hemhesitîyê diafrîne. Ev qanûn taybetmendîya herî girîng a vegotinên gelerî ye ku qanûna sisêyane ve giredayî ye. Girîngiya vegotinê her tim li ser kesê ku herî dewîyê tê ye. (Olrîc, 1994: 4).

Di serî de jidayikbûna Mem, bi rengek derasayî bi alikariya Xoce Xidir pêk tê. Memê Alan di çîrokê de kesê dawîn e ku derketiye holê. Xala girîng a destpêkê hevdîtina Mem û Zînê ye. Destan bi evîna wan dikeve rêya xwe. Memê Alan ji bo dîtin û anîna Zînê dertê rê. Di dawîya destanê de jî dîsa hevdîtina Mem û

Zînê xala girîng e. Mirina Memê Alan û buyerên piştî wî dibin, dide nişandan ku kesê ku hemhestî pê re tê kirin Memê Alan e. Gava em li destanê binêrin lehengê sereke Memê Alan e. Di bûyerên serî û yên dawî de kesê ku li navenda bûyerane Mem e. Ji ber vê em dikarin bibêjin ku, destan li gorî vê qanûnê, hatiye honandin û riayet lê hatiye kirin.

4.2.8.Qanûna di Vegotinê de Biyekxetîbûnê

Di wateya herî fireh de edebiyata nûjen, ji tevlihevkirin û lihevgerandina xetên cûr bi cûr ên entîkayê hez dike. Beravajî vê vegotina gelêrî xêzeke bûyerê bi yeka din re tevlihev nake. Vegotinên gelêrî her dem yek xêzîkî ye. Ji bo ku beşên kêrî tamam bike, bi paş de venagere. Ger derheqê bûyerên hin peşî de agahî pêwîst be; ew di nav diyalog û xeberdanê de tê dayîn. Têgihîna perspektîf ya hunera wêneyê, di vebêja gelerî ya bûyera bixêz de tune ye. Avayiya wê, wekî avayiya peykertraşî û avahîsaziyê ye ji ber wê, bi jimar û pêdiviyên sîmetriyên din re bi pihê giredayî ye. (Olrîc, 1994: 4).

Bûyerên pêk tên bi awayekî kronolojî k û di nav tekiliya sedem û encam de pêk tên. Di destanê de bûyer bi hevdiştina Mem û Zîn dest pê dike pişt re jî ji bo hevdiştina her du evîndaran, tiştên tên serê wan û bi piranî jî tiştên tê serê Mem berdewam dike. Bi mirina her du lehengan destan diqede. Bûyer bi tevahî li ser xêzeka zeman pêk tên. Di vegotina bûyeran de paşvegera bûyeran tune ye. Ji bo paşvegerê, di nav axaftinê de dubarebûn tê kirin. Mem sebebê derketina xwe ya rê û ji bo Zînê dev ji çî berdaye dubare dike. Zînê sebebê girêdana xwe di axaftina xwe de dubare dike. Mijara gustîlan dîsa di axaftina Mem de tê dubare kirin. Fena ku li Mem hatiye kirin, qîza Bekoyê Awan dubare dike. Xewna Mem ku wî di zindanê de dîtiye di axaftina Mem de tê dubarekirin. Ew dubarekirin, ji bo bûyerên berê werin bibîranî n û ji ber ku bi paş de vegeer di çîrokê de tune ye pêk tên.

4.2.9. Qanûna Qalipgirtinê

Ji heman cureyê du mirov an rewş, heta ji dest tîn ji hev ne cuda ne. Heta ji dest tîn dişibin hev. (Olrıc, 1994: 4).

Şewazkirina wiha hişk a jiyânê li gorî xwe xwedî bihaya estetîkê ye. Herçi tiştên ku ne pêwîst in, hatine avêtin û tenê tiştên ku pêwîstî bi wan heye, bi rewşeka berbiçav hatine nişandan.

Xweşikî, delalî, çelengî û lihevhatina Mem û Zînê, di hevdîtî na yekemîn a Mem û Zînê de tê teswîrkirin. Teswîrkirina lehengên li ba hev, qalibeka destanê ye. Ji aliyê xerabî xwestinê, fen û dolaba qîza Bekoyê Awan û Bekoyê Awan xwedî heman qaliban e. Em teswîrkirina wan, wekî qalibên xeraban dikarin nişanî bidin. Tekoşîna Mem, ku bi kesên dixwazin wî ji rêya wî derxin re wekî qîza Beko Awan, Beko Awan û xelkê Cizîra Botan re, wekî hev nînin. Lê ew ji wan astengiya bi heman rêyê xelas dibe. Em vê qalibê jî, wekî qaliba ji destên nexêrxwaza xelasbûnê, dikarin qebûl bikin. Axaftina Mem bi heman awayî di qalibekî de tê dîtîn. Dîsa axaftina Hesên, axaftina Zînê bi awayekî qalibî, gelek caran dertê pêşiya me

4.2.10. Qanûna Sehneyên Wêneya Mezin

Sage (vegotin) her dem bi sehneyên “wêneya mezin” digihijin asta herî bilind. Di van sehneyan de, lehengên sage yê (vegotinê) tîn cem hev; leheng û hespê wî; leheng û cinawir. (Olrıc 1994:5).

Ev rewş pirî caran ne ji rastiye, ji xeyalan bingeha xwe digrin. Diyar dibe ku, sehneyên mezin ne hêsteke derbasokî, di nav cureyekê demê de wesfeke domdariyê hildigire. Di Destana Memê Alan de hevdîtina Mem û Zînê sehneyên herî balkêş in. Ew sehne sehneyên ku aksiyona wan herî girîng in. Di hevdîtina yekemîn û ya dawîn de aksiyon zêde ye. Gava hevdîtin diqede meraq ji bi wê sehnê diqede, lê piştî meraqeke nû dest pê dike. Dîsa hevdîtina Mem û qîza Bekoyê Awan hevdîtina Mem û Beko Awan, sentranc leyîstina Mem û Mîr jî dikarin wekî sehneyên girîng werin qebûlkirin. Em di wan

sehneyan de, ji hêsteke derbasokî pirtir, hêsteke xwedî berdewamiyê û meraqeke nû dibînin.

4.2.11. Qanûna Mantiqa Vegotinê

Tenê mantiqeke sageyê (vegotinê) heye. Dive temayên behsa wan hatiye kirin li ser xetên esasî yê mîjarê xwedî bandor bin û divê ji xwe ev bandor jî di giraniya temayên vegotinê de seranser bin. Ev mantiqa vegotinê (sage), her dem bi mantiqa dinyaya siruştî re nikare were pîvandîn. (Olrîc, 1994: 5).

Qanûna wê ya esasî mêyla wê ya anîmîzmê, mûcîze û hetta ya efsûnê ye. Berî her tiştî bi piranî qebûlkirina wê, bi hev girtina navî ya honandina bûyerê re gîredayî ye. Ketina serê mirov pir kêmbi rastiya derve re tê pîvandîn.

Ji bo careke din dîtina Zîna Zedan û anîna wê ya welatê Mixribîyan mijara Destana Memê Alan e. Birêketina Memê Alan û tiştên tînan serê wî jî mijareka din a destanê ye. Entrîqaya esasî, hev dîtî û gihiştina Mem û Zînê ye. Di destanê de mantiqa vegotinê, carna mantiqa dinyaya xwezayî carna jî derveyê vê mantiqê ye. Mîjarên derveyê mantiqa dinyaya xwezayiyê, em di hinek kesan de, di hinek bûyeran de, carna jî di hinek rewşan de dikarin bibînin. Ew derasayîya di destanê de, ji aliyekî jî çirçirokiya destanê nîşanî me dide.

Derasayî cara yekem di rasthatina her sê birayan û Xoce Xidir de tê dîtîn. Xoce Xidir bi xwe jî mirovekî derasayî ye. Xoce Xidir xwedî taybetendiyên derasayiyê ye. Bi her tiştî dizane. Her sê biray gava cilên derwêşan li xwe dikin, dertên çolê û li halê xwe digirîn, bi emrê Xwede, Xoce Xidir li wan beyan dibe. Xoce Xidir sêvek dide mezinê bira Elî Begê, ji wan re dermanê derdê wan vedibêje.

Derasayiyeka dinê derketina ji behrê ya kure behrê, Bozê Rewan e. Padîşahê Perîyan wekî ji navê wî jî diyare, kesayetek derasayî ye. Dîsa her sê qîzên wî jî derasayî ne. Dikarin postê kewan li xwe bikin û têkevin şiklê kewan. Bi pîfa xwe ya bi sihr, textê Zîna Zedan radikin dibin menzela Memê Alan. Dîsa bi sihr, textê Zînê tînin cihê wê ye berê, menzela wê ya di qonaxa birê wê Mîr Ezîn. Destana Memê Alan de beşên derasayî wusa ne:

a) Rakirina Textê Zîna Zedan û Birina Menzela Memê Alan

“Her sê qîzan xwe avetine bajarê Cizîra Botan e
Di daîra Zînê da ketine deve pencere û kulekan e
Nihêrîn ku Zîn raketiye di nava nivînan e
Li bin lingan û ber serî pire pira mesele û çiran e
Her sê xwişkan xwendin ismê periyan e
Pif kirine ser Zînê, xatûna piştî perdan e
Kirine wexmê miriyan e
Textê Zînê rakirin, dane ser piyê cin û periyan e,
Tevî wan çiran û meselan e
Anîne bajarê Mixribiyan e
Danîne di daîra Memê Alan e
Xwendin îsmekî periyan e,
Pif kirin nav her du text nivînan e,
Mem û Zîn keline wehm û dereceyê cendek û miriyan e.
Her se xwişkan gazî kirin cîn û periyan e
Textê Zînê rakirin tevî her du çiran e
Bilind kirin heya gihane taqê ezmanê heftan e
Xwe berdane ser bajarê Cizîra Botan e.
Textê Zînê danîne cihê berê, meqamê dê û bavan e”

b) Rasthatina Xoce Xidir û Memê Alan ya li Ser Rê

“Memî dinhêrî ku kal zengûyan li hespê xwe nade dîsa
Li pêş wî diçe sedek didiyê cotan e.
Memî di dilê xwe da digot:
Hespê min kurê behrê, Bozê Rewan e,
Bi wî ra çûyîna li dinê, ne karê tu hespan e.
Nizam ko evarî eceba giran e.
Hespê kalo weke îşê cîn û periyan e.”

c) Beko Awan Sebeba Rêketina Memê Alan bi Sîhrê Dizane.

Kalogot: “Gava dari her setê Cizîra Botan e
Set, pahn û mezin e, li ser nînin kêlek û darê gemiyan e
Ji alî din radibe dûman e
Kelîso daniye qîza Bekoyê şeytan e
Dixwaze ko te bixapîne bi navê Zîna Zedan e
Lê tu bawer meke; ew qîza Beko Awan e
Bavê we zaniye ku tu ê herî bajarê Cizîrê, bi kitêba remlan e.
Qîza xwe şande pêş te, dike lê biqelibîne li gola xwîniyan e.”

d) Girêdan û Avêtina Zindanê ya Mem

Di leystîka setrencê de Memê Alan winda dike. Li ser qewlê hatiye danîn Beko Awan yariyê xwe bi Mem dike. Em dibînin ku di dema yariyan de Mem, ji ben û zincîra bi awayekî derasayî xelas dibe. Herî dawîyê bi awayekî derasayî tê giredan. Bi kurtasî ev beşe wusa ye:

Beko rabû, nîzingî li Mem kir, gotê: “Şahzade li gora şertê te û Mîr, kerem ke dest û lingên xwe berde.” Memî go: “Bila be ez bibînim çi ye yariya te.” Beko çu werîsek anî, dest û lingên Mem pê girêdan. Mem rabû xwe ji cih hinek tev da. Werîs bû piç û parî ji hev de ket, qetî. Vega Beko kete binaniya bircê, zencîrek anî Memê Alan dîsa deng nekir dest û pê sist kirin, berdan Beko mevanê xwe pihêt girêda, xelek û girek li hev badan. Mem bihnekê damayî ma, qey pêtek ji devî derket, pê pif kirê zencîr hesin sor bû, helî, herikî, ket erdê. Bu marekî fêris Beko ji ber marî revî, xwe da alî, xwe kire pis. Mem kenî, fikand, newêrî, marî tevizî, berê xwe da banî Mar kete qulekê bircê, Beko bihna xwe da, li ber Mem gerî. Beko fikir lavelav, di gote Mem: “Ezbenî, ez ê çawa bikarime te divê tu rê bidî min.” Mem di eqlê xwe de digot qey tev henek û yarî ye. Memî gote Awan: “Kura here stewlê, çend mu ji dêl û bijiya Boz bîne. Çend mûyên serê min ji min pê grêde ez ê ber ve biçim saetekê ez dimînim bêhiş.”

e) **Mem di Xewnê de Tiştên ji Dahatûyê Dibîne**

“Em herin diyarê xewna Memê Alan e
Demaji qehr û meraqa di kûçkê zindanê
Da kete xewa şevan e
Di xewna xwe da dît ko dîsa rûniştiye
Li ser textê xwe yê çarling, li bajarê Mixribiyan e
Li dorhêlê runiştîne birayê wî Beglî, tevî kurên giregir û began e
Diya pîr û kalê bavan, tevî her du kokimên apan e
Hate vê miçlîsê Emer Beg, kalê Memî, şêxê Qureyşiyân e
Got: Memê min, bila xobarî nekeve dilê te, dinê nabe milkê tu kesan e
Eger merî bimîne deh salan e,
Na merî bimîne hezar salan e
Ji merî baqîl ra mîna hev e, qet tê da nabîne tu ferqan e
Dinya bi xwe mîna xewan e
Ji mirina te ra maye işê du saetan sê saetan e
Tu ê li vê dinê bar ki, herî axiretê hizûra padîşahê padîşan e
Em vana jî wê rojekê werin û li te bibin mêvan e
Niha, piştî demekê, wê were cem te Zîna Zedan e
Bi destê xwe tîniye hediyeke, daye wê qîza Bekoyê şeytan e
Hediye hinarek e, hundirê wê tijî kirine axûya marê kaşan e
Ilm û xebera Zînê tune di van fend û tiştan e
Zîn bi xwe bi te ra rast e ji dil û can e
Gava ji te ra hinar anî, bigire û bixwe çend heban e
Eger tu nexwî tu ê bimirî û qet lê nabe çare û derman e
Gotineke pir mesbût heye, dibêjin li cem me Kurdan e
Ko serê hate birîn, nayê kirîn bi peran e
Qedera Xwedê hatiye, sekiniye ko tu bimirî bi destê zaliman e
Bigihe merteba şehîd û ewliyan e
Zîn jî dê di pê te ra bimire bi heft rojan e
Xwedê wê li wê dinê miraze we bike di nav govenda horiyan e
Di nav Cenetê da wê bibe daweta we her duyan e”

Em di Destana Meme Alan de qanûna ku tiştên di vegotinên gel de tîn dîtin, li gorî teybatmendiya xwe di vegotinê de jî cih digrin dikarin bibînin. Eger ew tiştên behsa wan tîn kirin, li ser berdevamiya bûyerê xwedî bandorek mezinbin dirêj, ger ne xwedî bandorek mezin bin bi kurtasî behsa wan tîn kirin. Bozê Rewan di destanê de gelek car hatiye dubarekirin. Bi awayekî dirêj behsa teybetmendiya Bozê Rewan hatiye kirin. Di serî de behsa derketina wî ya ji behrê, pişt re jî behsa bazdana wî hatiye kirin. Dîsa qala teybetmendiya Bozê Rewan û derasayîbûna wî hatiye kirin. Berdevamiya vegotinê de em Bozê Rewan ji bo berdevamiya bûyerê xwedî bandorek mezinbin dibînin.

4.2.12.Qanûna Yek Entrîqayê

Entrîka; çîrokan, stranan û efsaneyan de gelek xurt e. Mît û destanan de jî ev xurtbûna entrîkayê kêmtir e lê bibandortir e. Ev çende jî ji bo sage'yê (vegotin) pîvanek e. (Olrîc,1994: 5).

Ev gava sageya rasteqîn û berhema edebî tîn berawirdkirin bi awayekî herî baş tîn dîtin. Di Destana Memê Alan de rêzebûyer an honandina bûyeran, tev li ser tekoşîna Memê Alan û gihîştina hev a her du lehenga ye. Entrîqa esas bi rêketina Mem, ji bo dîtina Zînê û anîna wê ya welatê Mixribiyan e. Bûyerên diqewimin, tev li ser vê esasa bingehîn tîn honandin. Tevahî bûyer bi entrîqa esasî tîn girêdan. Bûyerên ku behsa wan tîn kirin, bi awayekê xwe digihînin entrîqaya esasî.

4.2.13.Rêzika Yekîtiya Epîkî

Hemû hêmanên vegotinê bi awayekî ihtimal heye ku, ew ê derkevin holê û ew ê ji bûyeran bikaribin bi afirin. Ango bûyer ji bo afirandina mijarê çêdibin. Mijar li ser astengiyan tîn avakirin û ji xwe rêzik jî bi çareserkirina van astengiyan tîn avakirin. Bala xwîner wusa tîn kişan.(Olrîc, 1994: 6).

Destana Memê Alan destaneke evîndariyê ye. Di destanê de bal her li ser gihîştina Mem û Zînê ye. Ji bo gihîştina her duyan, tiştên girîng, astengên mezînan dertên holê. Astenga pêşî li ser rê derdikeve peşiya Mem. Wekî li ser rêya wî qîza Beko Awan û Beko Awan dertên. Dîsa welatîyên Cizîra Botan jî astengî ji Mem re derdixin. Astengiyeka din jî, Beko Awan û Mîr Ezîn e. Em dikarin wek astengiyeka bicûk jî behsa Çeko bikin. Hemû astengi du pirsan tînin li bîra me, meraqek ji me re çê dikin. Ew ê her du evîndar dê bigihîjin mirazên xwe an na. Ew ê Mem serbikeve an na. Tiştên tînin serê Mem du ihtimalan tîne bîra mirov. Mem ew ê ji astengiyan xelas be an na. Mem ji destê qîza Beko Awan xelas dibe. Dawiyê, ji destê Beko Awan jî xelas dibe. Piştî ji destên welatîyên Cizîra Botan jî xelas dibe. Lê herî dawiyê, Mem dîsa bi xapandinên Beko Awan tê girtin û zindan kirin. Mem di zindanê de dimire. Piştî Zînê jî dimire. Ji ihtimalan yek pêk tê. Her du evîndar nagihîjin mirazê xwe.

4.2.14. Qanûna Yekitiya Epîkî ya Îdeal

Gelek hêmanên vebêje, ji bo ku tekiliyên di navbera kesan de bi awayekî baş bê ronî kirin, tînin ba hev. Bûyerên di destpêka destanê de pêktînin, ji bo armançê hatine amedekirin. Derketina Xoce Xidir û sêv dayina wî ku ji bo zarokê Elî Begê çêbibe. Derketina Bozê Rewan ji behrê, behsa sê qîzên padîşah, rasthatina Mem û Xoce Xidir, astengiyan li ser rêya Mem tînin dîtin, rê nedayîna qîza Beko Awan û bavê wê, kesên ku astengiyê ji her du evîndaran re derdixin, wekî Beko Awan, Mîr Ezîn, kesên dertên holê, cihên behsa wan tînin kirin, bûyerên diqewimin, rewşên tînin teswîrkirin... Hemû bi tevahî ji bo tiştê ku bê rave kirin hatine gotin. Kaniya Qestelê weki cihê dema xweş lê tê derbaskirin tê teswîrkirin. Her du evîndar li wir bi hev re rudînin. Her cih, her kes an her bûyer ji bu ku karekî bigre li ser xwe dertên pêş me. Tevahiya wan, di honandina bûyerê de, bi peyvîrên xwe cih digrin.

4.2.15. Qanûna Civandina Balê li ser Lehengê Sereke

Qanûna herî mezin a kevneşopiya gelerî civandina balê ya li ser lehengê sereke ye. Ger bûyerên dîrokî di sage (vegotinê) de hatibe vegotin, bal li ser leheng tê civandin. (Olrîc, 1994:5).

Gava du leheng di sage (vegotin) de xuyadibin, dîtina vegotina gelêrî çawa pêşdikeve, gelek balkêş e. Yek ji wan, her dem lehengê sereke yê rastiyê ye. Sage bi çîroka wî/ê destpêdike û bi tevahî xûyaniya xwe, ew dibe karakterê herî taybet. Ger zilamek û jinek bihev derên holê, zilam kesê herî girîng e. Lê pirî caran payeya mezin a balê, diçe li ser jinê.

Wekî ji navê destanê jî diyar e di destanê de lehengê sereke Memê Alan e. Rojbûna wî û mirina wî bi awayekî derasayî ye. Lehenga din Zîna Zedan e. Her dû jî bi xweşikî û wesfên xwe ve mirovên ne ji rêzêne. Destan li ser gihiştina wan li ser mirazê wan e. Ji bo gihiştina wan, barê mezin li ser piştê Mem e. Tengasiyên û astengên dertên jî ji ber ku Mem mêr e dertên pêşiya wî. Peşî herçiqas behsa her du lehengan bê kirin jî piştê em dibî nin ku bûyer, bi piranî tîr li serê Mem. Piştî Mem digihije welatê Zînê, car caran behsa Zînê û rewşa wê tê kirin. Lê dîsa bûyer bi piranî tîr serê Mem. Em ji vê yekê derdixin ku lehengê sereke Memê Alan e. Mem her dem dertê pêş. Em dikarin vê yekê wek girîngiya mêr a di ciwakê de jî bihesibînin. Ciwak xwedî erka mêrantiyê ye. Bal car caran dice li ser Zînê lê her dem bala girîng li ser Mem e. Dîsa çîrok bi piranî, bi behsa , tekoşîna wî û bi bûyerên tîr serê wî berdewam dike.

Tê dîtî ku Destana Memê Alan, panzdeh Qanûnên Epîkî yê Axcel Olric, ku wek bingehe xebatên folklorê tîr qebulkirin, dihewîne. Her qanûn(zagon) li gorî behsa wan tê kirin di destanê de tîr dîtî. Her çiqas Axcel Olric, bi awayekî vekirî behsa destanên derweyê Ewropa nekiribe jî em dikarin bibêjin ku ew qanûnên ku wî diyar kirîne, bi tevahî li Destana Memê Alan tîr. Ji ber ku Destana Memê Alan jî vegotina gel e, ev lihevhatin ne tişekî ecêb e.

5.BEŞA PÊNCEM

LI GORÎ QNÛNÊN LORD RAGLAN DI DESTANA MEMÊ ALAN DE QALIBÊN LEHENGÊ KEVNEŞOPÎ

Di vê beşê de Destana Memê Alan li gorî qanûnên epîk yên Lord Raglan dê bê xwandin û ew qanûnên di Destana Memê Alan de cih girtine wê were nîşandan. Nivîsa bi navê “Qalibên Lehengê Kevneşopî” ya Lord Raglan li gorî wergera Metin Ekici wê li ser were sekinandin. Metin Ekici di wergera xwe de “Qalibê Lehengê Kevneşopî” ya Lord Raglan di 22 xalan kom kiriye. Lord Raglan lehengê neteweya rojava û Anadola navîn de pûanên xwe li ser 22 xalan dide. “Lord Raglan her çiqas bêje ku mirov dikara vê hejmarê bikaribe zêde bike jî ev 22 xalan de formîlîze kiriye.”(Ekici, 2005: 100-102).

5. 1. Qanûnên Epîk yên Lord Raglan

5.1.1. Diya leheng bakire ye, yek ji malbateke başnîjad e.

5.1.2. Bavê lehengî qral e.

5.1.3. Bi piranî bavê leheng xizmekî nêzîk diya wî ye.

5.1.4. Mercên ku leheng tê dinyayê derasayîne.

5.1.5. Leheng di heman demê de lawê xwedayekî navdar tê pejirandin.

5.1.6. Bi piranî jî aliyê bavê wî ve hewldana kuştina wî tê kirin.

5.1.7. Leheng dişînine cîheke veşartî.

5.1.8. Li welatekî dûr ji aliyê malbateke parêzger ve tê xwedî kirin.

5.1.9. Leheng xortaniya xwe de diçe cihê keyatiya xwe ya dahatûyê dibe qral.

5.1.10. Di derheqê zarokatiya leheng de tu tişt nayê vegotin.

5.1.11. Leheng piştî ku di şerê li hemberê qral, hût, ejderhayan ji sewalekî wehşi serdikeve.

5.1.12. Ew bi şahbanoyekê re dizewice ku bi piranî prenses keça selefî(pêşewarê) wî ye.

5.1.13. Leheng dibe qral.

5.1.14. Ji bo demekê ew bê piskirêk hûkûm dike.

5.1.15. Zagonan destnîşan dike.

5.1.16. Piştî ew dilxweşiya xwedeyan yan jî ya tebaya xwe wenda dike.

5.1.17. Ji text û bajarê xwe tê dûrxistin.

5.1.18. Ew rastî mirineke rêzdar tê.

5.1.19. Bi piranî li ser girekî dimire.

5.1.20. Zarokên wî -eger hebin- di şopa wî de qet naçin.

5.1.21. Bedena wî nayê gor kirin(veşartin).

5.1.22. Yêk yan jî zêdetir gorên wî hene.

Ev xalên li jor hatine rêzkirin li gorî wergera Metin Ekici (Ekici,2005) hatine rêzkirin. Em dê vê beşê de biceribînin kanê qanûnên Lord Raglan di Destana Memê Alan de dê çawa bêne tetbîq kirin û ev destane kîjan hemanên epik di xwe de dihewîne. Qanûnên Raglan li gorî destanên rojava û Anadoluya navîn bûn gelo ev qanûnên epîk derweyê Ewropa bi taybetî jî destanên Kurdan re hev tînin an nayên dê were nîşandan.

Dema mirov lêkolînên li ser folklorê cîhanê dinêre motîfên hevpar dibîne Lord Raglan jî li nav vegotinên cîhanê motîfên hevpar digere û motîfên navneteweyî dibîne. Ö. Çobanoğlu dibêje ku: “Berhemên nivîskî û devkî de ji bo profileke hevpar a lehengê vegotîne bê peydakirin xebata Lord Raglan xwedî qiymet e.” (Çobanoğlu, 2002: 192).

5.2.Di Destana Memê Alan de Qalibên Lehengê Kevneşopî

5.2.1. Diya Wî Bakire ye, Yek ji Malbateke Başnîjad e

Em li gor ve teybetmendiye dinêrin ku destana Memê Alan de ev teybetmendiye heye ye lewre li gor varyanta ku Roger Lescot berhevkiyê diya Memê Alan qîza Mîrê Qureşîyan e. Ango diya Mem bakîre nebe jî; yek ji malbateke başnîjad e.

5.2.2.Bavê Lehengî, Qral e

Li gorî vê xalê Destana Memê Alan de ev teybetmendiye heye lewra Memê Alan kurê Elî Begê ye û Elî Begê jî mîrê bajarê Mexrîbiyanê ye û destanê de wiha derbas dibe: Mem bangî Zînê dike û dibêje: “Lê lê! Bi çavê min ez Mem im tu Zîn. Ez kurê Mexribiyanim tu jî qîza Mîr Zengîn î.” Heman demê de beşeke destanê de Beko qala Memê Alan ji Mîr Zengîn re wiha dike: “Jê re dibêjin Memê Alan padîşahê Kurdan e. Dibêjnê yanî kurê Mîrê Mexribiyan e.”

5.2.3.Bi Piranî Bavê Leheng Xizmekî Nêzîk a Diya Wî ye

Li gorî vê teybetmendiye em dinêrin ku ev teybetmendiye Destana Memê Alan de tune ye. Bevê Mem Elî Begê mîrê bajarê Mexrîbiyanê, li gel qîza Mîrê Qureşîyan dizewice. Destanê de nêzîkiya wan nayê vegotin. Bavê Mem Mexrîbî, diya Mem, Qureşîye.

5.2.4.Mercên ku Leheng Tê Dinyayê Derasayîne

Ev teybetmendî di destana Memê Alan de heye. Ji ber ku şertên ku Mem tê dinyayê derasayî ye. Bavê Mem û her du apên wî gelek dewlemend bûne lê aramî

nebûne û rehetiya wan tune ye lewra jî her sê bira jî bê zuriyet bûne zarokên wan çênebûne. Rojekê cejna purbanê radibin û dikevin çola û vî halê xwe re digîrîn. Xwedê Xoce Xidir li wan peyda dike. Xoce Xidir ji wan ra dibêje: “Ka herin bajarê xwe û feqîr û fiqaran têr bikin. Li wan qenciyan bikin paşê jî herin qîza Mîrê Qureyşiyana birayê xwe yê mezin Elî Begê re bixwazin. Piştî neh mehan Xweda dê zarokekê bide Elî Begê”

Di destanê de wiha derbas dibe: Xoce Xidir: “Berê xwe bidin Mihela Qureyşiyane, ji Elî Begê re bixwazin qîza Mîrê Qureyşiyane, bi qewlê eshabane, qelenê wê bidin diwazdeh qirûş û nîvane, îşellah neh meh û neh saet û neh deqîqa wextê qediyane, Xwedê teala wê şîn bike warê wêrane.”

5.2.5. Leheng di Heman Demê de Lawê Xwedayekî Navdar Tê Pejirandin

Li gorî vê xalê em dinêrin ev teybetmendiye Destana Memê Alan de tune ye. Lê vê destanê de leheng bi hîmmeta Xoce Xidir tê cîhanê. Her çend Memê Alan lawê xwedayekî navdar ne hatibe pejirandin jî alîkariya lehengeke li gorî dîne Îslamê pîroz hatiye pejirandin.

5.2.6. Bi Piranî ji Aliyê Bavê Wî ve Hewldana Kuştina Wî Tê Kirin

Li gorî vê xalê em dinêrin ev teybetmendiye Destana Memê Alan de tune ye. Memê Alan bi hewldana Beko û qîza Beko tê kuştin. Mem hinara ku qîza Beko dayê digire û behsa xewa xwe dike. Zîn ji jê re lava dike ku hinarê nexwe lê Mem wê guhdar nake, dibêje: “Qedera me wîsa ye.” û ji hinarê sê çar liban dixwe. Mem piştî xwarina hinarê dimire.

5.2.7. Leheng Dişînin Cîheke Veşartî

Li gorî vê xalê em dinêrin ev teybetmendiye Destana Memê Alan de tune ye. Lê çûyîna Mem a li ser Qaniya Qestelê an jî xwe veşartina Mem û Zînê a baxçeya Mîr Ezîn kêm jî bibe wek cîheke veşartî tê nîşandan.

5.2.8. Li Welatekî Dûr ji Aliyê Malbateke Parêzger ve Tê Xwedîkirin

Li gorî vê xalê em dinêrin ev teybetmendiye Destana Memê Alan de heye. Mem ji bajarê Mexrîbê tê Cizîra Botan ango leheng tê welatekî dûr. Dema ku tê Cizîrê ehlê Cizîrê lê xwedî derdikevin û ji bo çareserkirina piskêrêka Mem alîkariya Mem dikin ango leheng bi malbateke perêzger ve tê xwedî kirin.

5.2.9. Di Derheqê Zarokatiya Leheng de Tu Tişt Nayê Vegotin

Li gorî vê xalê em dinêrin ev teybetmendiye Destana Memê Alan de cih digire. Derheqê rojbûna Memê Alan de agahî hene lê belê derheqê zarokatiya wî de tu tişt nehatiye gotin lewra temenê Mem digihe panzdeh salî vê çaxê ew derdikeve holê û qala wî tê kirin.

Derbarê zarokatiya Mem de vegotin wusa ye: “Piştî neh mehan, wê kurekî ji Elî Begê re çêbibe. Nav lê nekin heta ez werim. Her sê bira gotinên Xoce Xidir dikin. Piştî neh mehan kurek ji Elî Begê re çêdibe. Rojekê di meclîsa Eli Begê de dixwazin nav bidin kurê Elî Begê, lê ew li benda Xoce Xidir dimîne. Ew dibêje, kalekî wî heye em li benda wî ne. Xoce Xidir tê, navê kurîk Memê Alan datîne.”

5.2.10. Leheng Xortaniya Xwe de Diçe Cihê Keyatiya Xwe ya Dahatûyê Dibe Qral

Li gorî vê xalê em dinêrin ev teybetmendiye Destana Memê Alan de tune ye.

5.2.11. Leheng Piştî ku di Şerê li Hemberê Qral, Hût, Ejderhayan jî Sewalekî Weşî Serdikeve

Li gorî vê xalê em dinêrin ev teybetmendiye Destana Memê Alan de tune ye.

5.2.12. Ew bi Şahbanoyekê re Dizewice, ku Piranî Prensê Keça Selefî (pêşewarê) Wî Ye

Li gorî vê xalê em dinêrin ev teybetmendiye destana Memê Alan de tune ye. Varyantên vê destanê de Zîn bi destê dengbêjan wek şahbanûyekê hatiye nekş kirin her çend Zîn qasî şahbanûyekê delal be jî ne şahbanûyeke û hemen demê de Mem ne selefê bawê Zînê ye.

5.2.13. Leheng Dibe Qral

Li gorî vê xalê em Destana Memê Alan dinêrin ev teybetmendiye destanê de cih nagire lê Mem kurê Elî Begê ye ji xwe selefê bavê xwe ye lê dimire.

5.2.14. Ji Bo Demekê Ew Bê Pisgirêk Hukim Dike

Li gorî vê xalê em dinêrin ev teybetmendiye Destana Memê Alan de tune ye. Mem kurê Elî Begê ye ji xwe velîahtê babê xwe ye lê hukim nekiriye.

5.2.15.Zagonan Destnîşan Dike

Li gorî vê xalê em dinêrin ev teybetmendiye Destana Memê Alan de tune ye.

5.2.16. Leheng, Dilxweşiya Xwedeyan an jî ya Tebaya Xwe Wenda Dike

Li gorî vê xalê em dinêrin ev teybetmendiye Destana Memê Alan de tune ye.

5.2.17. Ji Text û Bajarê Xwe tê Dûrxistin

Li gorî vê xalê em dinêrin ev teybetmendiye Destana Memê Alan de tune ye. Erê Mem ji bajarê xwe dûrdikeve lê Raglan bexsa dûrxistineke ne li xwastina leheng dike. Li gor Raglan hewceye ku leheng bi zorî bê dûrxistin wek mişextebûnekê. Destana Memê Alan de Mem bi dilê xwe bajarê xwe dûrdikeve ango mişextebûn tune ye.

5.2.18.Leheng Rastî Mirineke Derasayî Tê

Li gor vê xalê em Destana Memê alan dinêrin ev teybetmandiye destanê de cih digire. Lewra Memê Alan di zindanê de bi hinareke jarhkirî dixwe û zindanê de dimire. Xaleke din jî Mem hinarê bi zana dixwe û berê mirina xwe xewna xwe de dahatûya xwe dibîne. Mirina mem ne mirineke ji rêzê ye.

5.2.19. Bi Piranî li Ser Girekî Dimire

Li gorî vê xalê em dinêrin ev teybetmendiye destana Memê Alan de tune ye. Mem li zindanê de dimire.

5.2.20. Zarokên Wî -Ger Hebin- Naçin Cîhê Wî

Li gorî vê xalê em dinêrin ev teybetmendiye Destana Memê Alan de tune ye.

5.2.21. Bedena Wî Nayê Gor Kirin (Veşartin)

Li gorî vê xalê em dinêrin ev teybetmendiye Destana Memê Alan de tune ye.

5.2.22. Yêk yan jî Zêdetir Gorên Wî Hene.

Li gorî vê xalê em dinêrin ev teybetmendiye, Destana Memê Alan de tune ye.

Piştî van gotinan ku em li gorî Qalibê Lehengê Kevneşopî ya Lord Raglan li ser Destana Memê Alan sekinîn û encamek wiha derket holê: Destana Memê Alan de lehengê sereke Memê Alan e; Memê Alan jî li gorî “Qanûnên Qaliba Lehengê Kevneşopî” wek vegotinên gelên din di nav xwe de van teybetmandiya dihewîne.

ENCAM

Destan gencîneya dewlemendiya netewekêne ku ji hemû keleşor, kul, xem, şahî û coşî bi kurtasî ji hemû hêst û ramanên wî neteweyî pêk tên. Destan weke ûnsûreke folklorê di nava tevahiya cihanê de tê vegotin. Destan berhemên neteweyî ne ku bûyerên lehengî, evînî, dîrokî û derasayî bi awayekî dirêj û menzûm vedibêje. Ew şopên hewldana pêvajoya netewebûna neteweyekê di nava xwe de dihewînin û bi serboriyên van hewldanan navbera rabirdû û dahatûyê de zîndî û teze dihêlin. Neteweyên qedîm xwedî destanên qedîm in. Lewma dewlemendiya destanên neteweyekî dewlemendiya çanda wê nîşan dide Destan nêrîna dinyayê, dîrok, bîr, bawerî û dewlemendiya çanda neteweyan di nav xwe de dihewîne. Ji ber ku di destanan de mirov rastî hemû taybetmendiyan civakê û hêmanên çandî tê, destan, ew metn e ku nêrîna dinyayê ya neteweyan, şêwaza wan a şîrovekirina bûyerên li gerdûnê, dîroka jiyana wan û bandora wan ya li ser bûyerên civakî, ji bo domandina heyîna xwe, tekoşîna wan ya li hundir û derve, çalakiyên der bareyê jiyana civakî, bi kurtasî hemû nirxên neteweyekê dike

Her netewe ne xwedî destan in neteweyên xwedî destan heman demê de xwediyê bingeheke qedîm in. Ev berhem ji bo neteweyekî yek ji wan hêmana ne ku nîşana netewebûnê ye. Ji ber vê, neteweyên ku destanên wan tune ne serî li destanên çêkirî xistine. Gelek caran ji bo cemeata xwe ya xeyalî ava bikin destanên xeyalî afirandine. Di sedsala XIX. de gava ku di nav gelên Ewropî de hişmendiya neteweyî dest pê dikê piştî lêgerîna ziman û dîrokeke hevpar, ew dest bi berhevkirina kertseyên folklorê jî dikin. Di sed sala XIX. de zanyarên welatên cur be cur li welatên xwe û yên din dest bi lêgerîn, lêkolîn û berhevkirina folklorê kirin. Sed sala XIX. de aliyê zanyarê fînî, Dr. Ellias Lönnrot bi berhevkirina destana Kalavelayê berhevkirina keresteyên folklorê dest pê dike. Ev xebat ji bo gelên din dibe îlhameke mezin. Lewra neteweya Fîniyan bi saya wê destanê ji nû ve hatiye vejandin.

Xebat û lêkolînên li ser destanên Kurdî jî piranî ji aliyê biyaniyan ve hatine kirin. Ev xebatên akademîk ên di der bareyê destanên kurdî de bêtir li Almanya, Sovyeta Berê û Fransayê ji aliyên rojhilatnasan ve hatine kirin. Albert Socin, Eugen Prym, Hugo Makas, Albert von Le Coq, Oscar Mann, Roger Lescot, J.S. Musaelyan,

A. Christensen, hin ji wan kesan in ku ji welatên cur be cur hatine û li ser destanên kurdî xebat û lêkolînên girîng kirine. Wekî di gelek çavkaniyan de jî derbas dibe dewlemendiya berhemên folklorê kurdan bala gelek rojhilatnasan dikişîne ser xwe. Bi van xebatan, keresteyên folklorê Kurdî ji ber wendabûnê xelas dibin. Prof. Albert Socin û Eugen Prym, di 1887an de li ser destanên Kurdî xebat û lêkolînên girîng kirine. Ev xebat yek ji wan xebatên pêşîn in. Bi awayekî birêkûpêk heta 1983an xebatên li ser destanên kurdî dewam dikin. Helbet piştî jî xebatên kirin lê ne bi awayekî birêkûpêk in.

Kurd jî wekî biyaniyan di dawiya sed sala XIX. de bi saya Mele Mehmûdê Bazîdî dest bi xebatên destanan dibe. Lê piştî vê xebatê heta sala 1936an bêdengiyê dirêj çêdibe. Bi xêra xebatên kurdên qafqasyayê ev bêdengî xera dibe. Heciyê Cindî û Emînê Evdal pêşengiya van xebatan dikin. Ordixan û Celîlê Celîl, Semend Siyabendov û Çerkezê Reş jî ji kesên di vî warî de xwedî berhem in. Van kesan derfetên Sovyeta berê heta ji wan hatiye bikar anîne. Tecrûbeyê Kurdên Qafqasyayê ji bo fêmkirina girîngiya xwedî dewletbûnê nimûneyeke balkêş e. Ev xebat heta 1984an birêkûpêk dewam dikin. Helbet li derveyê Rusyayê jî ji aliyên kurdan ve xebatên hêja hatine kirin. Kesên wekî Alaadîn Secadî, Kerim Mistefa Salih û Yasîn Hesen Goran li Kurdistana Başûr, wekî Qadirî Fettahî Qazî li Rojhilat, Celadet û Kamuran Bedirxan û Nuretîn Zaza li Kurdistana Rojava, Ahmet Aras li Kurdistana Bakur, Rohat Ajakom, Reşo Zîlan û Serdar Roşan li Ewropayê pêşengiya van xebatan kirine.

Çawa ku destan bi şeweyekî nû derket peşberî civaka Kurd û xebatên derbarê destanên Kurd bi gelemperî bi destê biyaniyan hatiye kirin me jî xwast ku bi awayekî zanistî li ser dastanên Kurdî bisekinin û bixebitin. Ji ber vê yekê jî ji nav ewqas destanên dewlemend de me ji xwe re destana herî qedim; Destana Memê Alan hilbijart. Ango mijara vê xebatê ya sereke destana Memê Alan bû

Destana Memê Alan di nav kurdan de em dikarin bibêjin ku destana herî navdar e. Dîsa em dikarin bibêjin ku destanên wek Sîyabend û Xecê (Sîyabendê Silîvî), Binevş û Narîn û Zembîlfiroş jî di nav gelê kurd de cihekî girîng digire lê destana Memê Alan li gorî van destanên din zûtir derbasî nivîsê bûye. Sedema vê jî wek me li jor jî got destana herî navdar e û di nav gel de belav bûye. Heta niha

xebata herî girîng a derbarê vê destanê lêkolînan, nivîskar û kurdologê navdar Roger Lescot amade kiriye. Pişt re jî lêkolînanên wek A. Sorî (1890), A. Von Le Coq (1930), Oscar Mann (1906-1909) û Hugo Makas (1926) gelek gûhartoyên din ên Memê Alan derxistîne holê. (Lescot, 2010: 8)

Destana Memê Alan tevahiya erdnigariya kurdan de tê zanîn û vegotin. Bi destê dengbêjan ve heta îro hatiye pişkirin û parastin. Destana Memê Alan her çend di hin heremên kurdan de rastî hîn guhertinan hatibe jî metna eslî hatiye parastin. Ev destane di naw çanda Kurd de ji aliyê hêmanên folklorîk ve gelek dewlemend e û ji aliyê gel ve jî xwediyê pejirandineke hevpar e. Dema ku me li ser Destana Memê Alan lêkolîn kirin me dît ku gelek ertnigariyên cuda yên Kurdan de ev destane hêj tê vegotin lewma jî ev xebate li ser Destana Memê Alan bû û pênc beşan hate avakirin. Beşa yekem de em li ser teybetmandiyên destanan sekinîn. Beşa duyem Ji ber ku di destanên neteweyan de gelek motîfên hevpar hene û ev motîfên hevpar di gelek destanan de xwe dide nîşan me qala destanên Kurdî yên din jî kir. Di beşa sêyem de em li ser tasnîfa û sinifandina motîfên Destana Memê Alan sekinîn. Di tasnîfkirina motîfan de îndexa Thompson “The Index of the Folk Literature” me esas girt. Di beşa çaremîn de me Destana Memê Alan li gor “Qanûnên Epîk” yên Axel Orlîcê Danmarkî xwendî û qanûnên wî di destanê nîşanda. Di beşa pêncemîn de jî me Destana Memê Alan, li gor “Qalibê Lehengê Kevneşopî” yên Lord Raglan xwand

Me di vê xebatê de hewl da ku bi rêya Destana Memê Alan îspat bikin ku Kurd bi aliyê destanbêjiyê ve xwedî çandêke mezin in. Ev destane hem ji aliyê vegotinê ve hem ji aliyê naverokê ve ne tenê li nav destanên Kurdan de li nav destanên hemû cîhanê xwedî teybetmendiyên hêja ye. Destanên cîhanê kîjan teybetmendiyan bi hewîne Destana Memê Alan jî wan teybetmendiyan dihewîne ango tu ferq û cudahiya destanên Kurdan û biyaniyan nîne, tu kêmasiya destanên Kurdan ji Destanên biyaniyan nîne. Heman demê de ev destane ji bo rojeva Kurdan jî kaniyeke mezin û sereke ye. Em dikarin bibêjin ku ev destane ji bo edebiyata modern û klasîk jî bûye ilhameke, çavkaniyek û feyzek. Ji ber ku Ehmedê Xani li ser bîngeha Destana Memê Alan mesewiya xwe ya gewre ya bi navê Mem û Zîn afirandiyê ku Mem û Zîn gewretirîn berhema wêjeya Kurdî ye. Em dikarin gelek mînakên din jî bidin. Destana Memê Alan hemû teybetmendiyên civaka Kurd û

civakên Mezopotamyayê di nav xwe de dihewîne. Dawiya dawiyê me dît ku Destana Memê Alan cewhereke, li nav destanên cîhanê. Hêwîya me ew e ku ev xebate bibe nîşaneyê devlemendiya folklorê Kurdî.



ÇAVKANÎ

Ramazan PERTEV: Nîşên Dersa Edebiyata Kurdî ya Gelêrî, Mêrdîn, 2013

Îbrahîm OSMAN: Evîna Mêrxasekî, Weşanên Lîs, Diyarbekir, 2008.

Hayrettîn Ekîncî: Li Çiyayê Qerejdax Şopa Gerîla, Weşanên Aram, Stenbol, 2012

Eyup KIRAN, Derwêşê Evdî-Kulîlka Bilbizêk û Rim, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2011

Bawer FERAT: Dermansiz Sevda-Dewrêş ile Edûlê, Weşanên Yurt, 2009

Îbrahîm BOZKURT: Aşîretlerde Toreler ve Aşk Savaşlari, Weşanên Tîla, 2007

Dr. Ömer ULUÇAY: Destana Dewrêşê Evdî, Weşanên Dîwan, 2012

Prof. Ordîxanê CELÎL û Celîlê CELÎL, Zargotina Kurda, Weşanên Nauka, Moscow, 1978

Lescot, Roger: Destana Memê Alan, Weşanên Avesta, Stenbol, 2010.

Ahmedzade, Haşîm: Ulus ve Roman, Weşanên Pêrî, Stenbol, 2004.

Alakom. Rohat: Türk Edebiyatında Kürtler, Weşanên Avesta, Stenbol, 2010

Alan, Remezan: Bendname, Weşanên Avesta, Stenbol, 2009.

Alan, Remezan: Foklor û Roman, Weşanên Peywend, Stenbol, 2013.

Bender, Cemşid: Kürt Mitolojisi, Berfin Yeyınları, 2007.

Vali, Abbas, Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri, Avesta Yayınları, İstanbul, 2013.

Baba, Mustafa Okan: Halk Edebiyatı ve Terimleri Sözlüğü, Heymola Yayınları, İstanbul, 2007.

Anderson, Benedict: Hayali Cemaaler, Metis Yayınları, İstanbul, 2011.

- Boratav, Pertev Naili: Halk Edebiyatı Dersleri, Tarih Vakfı Yayınları, Ankara, 2011.
- Aktulum, Kubilay: Foklot ve Metinlerarasılık, Ezgi Yayınları, Konya, 2013.
- Aytac, Pakize: Foklor ve Edebiyat, Berikan Yayınları, Ankara, 2010.
- Parıltı, Abidin: Dengbêjler Sözü Yazgısı, İthaki Yayınları, İstanbul, 2006.
- Colemergî, İhsan: Cembelî Kurê Mîrê Hekariyan, Weşanên Avesta, Stenbol, 2001.
- Celîl, Ordîxanê: Kürt Kahramanlık Destanı Dımdım, Weşanên Avesta, Stenbol, 2001.
- Olric, Axel: Halk Anlatıları Epik Kuralları, Milli Foklor, s.23,1994.
- Olric, Axel: Halk Anlatıları Epik Kuralları 2, Milli Foklor, s.24, 1994.
- Thompson, Stith: Motif Index of Folk Literature, Indiana University, 1655-1958.
- Lescot, Roger: Textes Kurdes 2. Memê Alan, Beyrut, 1942.
- Bozarıslan, Mehmet Emin: Ehmedê Xanî – Mem û Zîn, Hasat Yayınları, İstanbul, 1990.
- Köprülü, Mehmet Fuat: Edebiyat arařtırmaları, Akçağ yayınları, Ankara, 2004.
- Kurdo, Qanatê: Tarîxa Edebiyata Kurdî, Özge Yayınları, Ankara, 1992.
- Erşahin, İbrahim: Halk Kültürü ve Sözlüğü, Ötüken Yayınları, İstanbul, 2011.
- Tan, Sami: Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı, Tarih Vakfı Yayınları, İstanbul, 2010.
- Cindî, Heciyê-Evdal, Emînê: Foklora Kurmanca, Weşanên Avesta, Stenbol, 1998.
- Ong, Walter: Sözlü ve Yazılı Kültür, Metis Yayınları, İstanbul, 2012.
- Uzun, Mehmet: Dengbêjlerim, İthaki Yayınları, İstanbul, 2008.

OĞUZ, M. Öcal,. “Lord Raglan’ın Geleneksel Kahraman Kalıbı ve Boğaç Han”. Milli Folklor, 1998. 40. s: 2-6.

2012. “Axel Olrik’in Epik Yasaları ve Lord Raglan’ın Kahraman Kalıbı Açısından Ağrıdaki Efsanesi Romanı.” Turkish Studies, 7/4, 3337-3349.

Filiz, Mehmet Şirin: Destana Dewrêşê Evdî, Zaningaha Mardîn Artukluyê, 2013.

Sağrıç, Feqî Huseyn: Dîroka Wêjeya Kurdî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2002.

AKTAŞ, Erhan: “Lord Raglan’ın Kahraman Kalıbı ve Alp Han Orba”. Siberian Studies (SAD) C.2.; S. 4 (2014): 13-30, 2014.

ÇETİN, İsmet: “Türk Destan Kahramanları ve Köroğlu.” Milli Folklor. 39, ss: 46-52, 1998.

ÇOBANOĞLU, Özkul: “Lord Raglan’ın Batı Halk Kahramanı Kalıbı Açısından Oğuz Kağan ve Er Töştük Destan Kahramanlarına Bakış.” Umay Günay Armağanı, Ankara. ss: 202-209, 1996.

EKİCİ, Metin: Halkbilgisi (Folklor) Derleme ve İnceleme Yöntemleri. Genişletilmiş 2. Baskı. Geleneksel Yay: Ankara, 2007.

KÖSE, Nerin: “Lord Raglan’ın Geleneksel Kahraman Kalıbı ve KOCOCAŞ”. Milli Folklor. 43. ss: 19-23, 1999.

RAGLAN, Lord: “Geleneksel Kahraman” (Çeviren: Metin Ekici). Milli Folklor. 37. ss:126-138, 1998.

“Raglan’ın Geleneksel Kahraman Kalıbı ve Türk Halk Hikâyeleri”. Milli Folklor. 45. ss: 22-39, 2000.

BARS, Mehmet Emin:“Lord Raglan’ın Geleneksel Kahraman Kalıbı ve Kartıga Pergen Destanı” International Journal of Language Education and Teaching Volume 2 / 2014. ss: 113-114, 2014.

Farqînî, Zana, Ferhenga Kurdî/Tirkî, Çapa Yekem, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol, 2005

Yıldırım, Prof. Dr. Kadri, Temel Araştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kuranci Lehçesi), Berdan Matbacılık, İstanbul, 2012

Propp, Vladimir, *Folklor*, Teori ve Tarih, Birinci Baskı, Avesta, İstanbul, 1998

Beyazîdî, Mela Mahmûdê (lêkolîn: Jan Dost), Adat û Rusûmatnameê Ekradiye, Weşana Nûbihar, Stenbol, 2011

Çalıştiran, Ruken, Xebat û Çavkaniyên li Ser Destanên Kurdî, Mardin Artuklu Üniversitesi, Mardin, 2013

ÇAVKANIYÊN DEVKÎ

Nav û Paşnav: Mehmet Hafiz Sönmez

Cîh û Dîroka jî Dayîkbûnê: Colemêrg - 1962

Asta Perwerdehiyê: Lisans

Pîşe: Karmendê Teqawîd

Navnîşan: Taxa Pehlîvanê Navenda colemêrgê

Çîroka ku Vegotiye: Memê Alan/ Kela Dimdimê

Çavkaniya Wî/ê: Dayîka Wî

Herêm : Colemêrg

Mêjûya Berhevkinê: 3 Çile 2015

Nav û Paşnavê Berhevkar: Kadir Sönmez

Nav û Paşnav: Ahmet Dağgöl

Cîh û Dîroka jî Dayîkbûnê: Colemêrg - 1971

Asta Perwerdehiyê: Lise

Pîşe: Karmend

Navnîşan: Gundê Guzereşê

Çîroka ku Vegotiye: Memê Alan

Çavkaniya Wî/ê: Bapîrê Wî

Herêm : Colemêrg

Mêjûya Berhevkirinê: 21 Îlon 2012

Nav û Paşnavê Berhevkar: Kadir Sönmez

Nav û Paşnav: Zeroya Salih

Cîh û Dîroka jî Dayîkbûnê: Dihok - 1939

Asta Perwerdehiyê: Tune

Pîşe: ...

Navnîşan: Taxa Nêrweyîyan, Navenda Dihokê

Çîroka ku Vegotiye: Xecê Siyabend

Çavkaniya Wî/ê: Nizane (Nayê Bîra Wê)

Herêî : Dihok/ Iraq

Mêjûya Berhevkinê: 22 Adar 2006

Nav û Paşnavê Berhevkar: Kadir Sönmez



FERHENGOK

Abîr kirin: Hetîkbin

Bedew: Rind, xweşik, spehî

Bêlo me!: Ji Me dûrtir be! Tiştekan jî bûyereke nebaş ku mirov jê xwe diparêze, dûr dike.

Ber: Kevir.

Beraş: Kevirê aş.

Berban: Balkon, Şaneşîn

Cindî: Bedew, ciwan, tevnal, tîtal, çeleng, lewend, hoşeng

Çavzil: Nêrîneke baldar,

Çax: Dem.

Dest xwe de: Hanhanka, zûzûka

Dindik: Nikil, dimik

Esman: Asîman

Ezman: Ziman

Gulm: Qurt, qim

Gurî: Gir, girû,

Hafsar: Dezgîn, legap, lixav

Hûr: Ûr, ûrik, mîdeya ajalan

Ka: Kanê

Navteng: Navkêl, newq

Nûsandin: Telandin, xwe veşartin.

Qaş: Kevirê giranbuha yê gûstilka ve.

Qirşeters: Cihê ajalên bi bask pisiya xwe davejine ser.

Ratib: Xwarina şivanan, 12 nanên tendûrê dike ratibek nan

Rewar: Cinawîr

Şû bûn: Mêr kirin.

Şû kirin: Mêr kirin.

Şû: Mêr

Şure: Dîwar

Teba: Tîşt, mexlûq, dehbe, ajalên hov, tişteki wek cinawîr,

Telandin: Girê dan, bestandin, nûsikandin, girê kirin

Teland: Nûsandin, Tewandin, Weşartin

Tirane: Tinaz, Henek

Xwerek: Xwarina ku hatiye çêkirin, amadekirin, xwarin



VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLER ENSTİTÜSÜ

LİSANSÜSTÜ TEZ ORJİNALLİK RAPORU

Tez Başlığı / Konusu:

...../...../2019

Yukarıda başlığı/konusu belirlenen tez çalışmamın Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümlerinden oluşan toplam sayfalık kısmına ilişkin,/...../..... tarihinde şahsım/tez danışmanım tarafından Türatın...intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtreleme uygulanarak alınmış olan orijinalite raporuna göre, tezimin benzerlik oranı % 7..... (.....Yedi.....) dir.

Uygulanan Filtreler Aşağıda Verilmiştir:

- Kabul ve onay sayfası hariç,
- Teşekkür hariç,
- İçindekiler hariç,
- Simge ve kısaltmalar hariç,
- Gereç ve yöntemler hariç,
- Kaynakça hariç,
- Alıntılar hariç,
- Tezden çıkan yayınlar hariç,
- 7 kelimedenden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinalite Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi İnceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içemediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

08/06/2019
Kadir Sönmez
Adı Soyadı İmza

Adı Soyadı : Kadir Sönmez
Öğrenci No : 16950001008
Anabilim Dalı : Kürt Dili ve Kültürü
Programı : Yüksek Lisans
Statüsü : Y. Lisans Doktora

DANIŞMAN
Doç. Dr. Ömer Çiftçi
...../...../201.....

ENSTİTÜ ONAYI
UYGUNDUR
10/07/2019
U. Doç. Dr. İlham SÖNMEZ
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı Başkanı